

**Dr. Eskerê Boyîk**

---

# *Nûra Elegezê*

*Çend dîdem ji edebyeta  
Kurdên Ermenistanê*



**DENGÊ Ezidiyan • OLDENBURG**



**Dr. Eskerê Boyîk**

*Nûra Elegezê*

*Çend dîdem ji edebyeta  
Kurdên Ermenistanê*

**Lêkolîn**

# **Ji weşangeha Dengê Ezidiyan**

Erste Auflage / Çapa yekemîn

April 2004 / Nisan 2004

Herausgeber / Weşanvan

Yezidisches Forum e.V.

Mala Ezidiyan Oldenburg

Eidechsenstr. 19

26133 Oldenburg - Deutschland

Fon: +49 (0) 441-4850555

Fax: +49 (0) 441-4850557

E-mail: info@yeyziden.de

Internet: www.yeyziden.de

Autor / Nivîskar

Dr. Eskerê Boyîk

Layout & Produktionsleitung / Montaj & çapkırına kitêbê

Telim Tolan

Texteingabe & Scan / Nivîsin & wêne

Kemal Tolan

Verlag / Weşangeh

© Dengê Ezidiyan · Oldenburg

Veröffentlichung / Weşan

Nummer 3 / hejmara 3

Eine Abhandlung über bedeutende kurdische Schriftsteller. Sie haben in Armenien gelebt und sind Yeziden.

Nachdruck von Fotografien, Texten und Grafiken nur mit ausdrücklicher, schriftlicher Genehmigung des Verlages und der Urheber gestattet.

Kopîkirin û çapkırına wêneyan, gotaran û tiştên grafikî bê destûra berpirsiyariya çapkırin û weşandinê qedexe ye.

## **PEYVA WEŞANVAN**

Mala Ezdiyan ya bajarê Oldênbûrgê bi karê olî, civakî, perwerdeyî, çandî û dîsan jî bi weşangcha xwe ya Dengê Ezidiyan heta niha gelek daxwuyanî, salname, kovar û pirtûk weşandiye.

Meremê weşangcha me ew e, ku em bi weşanên xwe Ezidiyatîyê, ku ola Kurda ya kevnar e, bidinc nasandin. Her wisa jî jibo me girîng ê, emekê beşerên Ezidî di dîrokan gelê Kurd ya hezarsalan de di warê xwedîkîrn û pêşxistina ziman, çand, edeb, crf û edetên kurdîtiyê de bidine ronahîkirin.

Kurdên Ezidî yên Ermenistanê eva serê 170 salan ji ber zulm-zorê û fermanan ji welatê kal û bavêr xwc – Kurdistanê – revyan e xeribiyê. Ciye dilxweşiyê e ku çawa firset ji wan re çê bûn ew li nirkêñ xwe yên netewî û nasnama xwe xwedî derketin. Navê wan ciwamêran di dîroka gelê Kurd de bi herfîn mezin hate nivîsandin. Radiyoya Yêrêvanê seranseri Kurdistanê bûbû dengê Kurdiyi yê herî xweş. Iro her Kurdekî xwendevan bi navê Erebê Şemo, Hecîyê Cindî, Qanatê Kurdo, Şekroyê Xudo, Celîlê Celîl û gelek rewşenbîrên din serfiraz e.

Komîta Birêvebir û Rewşenbîriyê ya Mala Ezidiyan li Oldenbûrgê.

## **NAVEROK**

PÊŞGOTIN .....	7
Nêrîneke kurt li ser edebyeta kurdên Sovyêtê .....	9
EREBÊ ŞEMO .....	21
HECÎYÊ CINDÎ.....	45
ŞIKOYÊ HESEN .....	59
FÊRÎKÊ ÛSIV.....	69
TÊATROYA KURDA YA ELEGEZÊ.....	101

## PÊŞGOTIN

Xwendevanêن hêja, ji pey Şorişa Oktyabirê ra welatê Sovyêtê da, heremên Kurd lê dijîtin mecalê pêşdaçûyîna çand û kultûra mîlîtyê çê bûn. Sala 1920 – an girtî heta salêن 1990 - î li hinek komarêن welatê Sovyêtê yê berê, xazna li Ermenistanê di warê çand û kultûra Kurdi da karên mezin hatine kirin. Nivîskar û zanyarên berbiçev pêşda hatin. Cihana kurdan da Ermenistan bi heqî hate naskirin çawa merkezeke kurdeweryê û kurdzanyê. Efrandinêن giranbiha yê edebî, zimanzanî, dîrokî, perwerdeyî û wek din hatine weşandin.

Ji pey salêن heyştêyi ra êdî nivîsara kurdi / kurmancî / nêzîkî zimanekî standart, yê edebî dibû. Di warê nivîsara vekirî û helbestvanyê da gavne girîng hatine avîtin.

Ji pey hilweşîna Welatê Sovyêtê ra derbekê mezin li vê merkezê jî ket. Rewşembîr ji hev bela bûn, mecalênu ku ji alyê dewletê da dihatin dayîn hatine birîn, ocaxêñ kultûri, çandî, zanyarî pir zeyîf bûn.

Di vê pirtûka biçûk da bi kurtayî ez li ser hinek kar û barêñ çandî – edebî û jîyana çend nivîskaran rawestyame. Evan gotarêñ cuda ne ku min salêñ derbazbûyî nivîsîne û

weşandine. Min hewee dît wan bigihînim hev û biweşînim. Helbet karê kurdewarî ku welatê Sovyêtê da hatye kirin deryake, bereke. Emekê ku hatye dayîn hêjayî lêkolînên berfireye, kûr û bingehîn in. Ev pirtuk niqitkeke ji wê derya mezin.

Ciyê kêfxweşyê ye ku weşengcha Dengê Ezidiyan weşena vê pirtükê hildan ser xwe. Dema min ev xebata hazır dikir fıkira min ra tucar derbaz nedibû, ku koka kîjan nivîskarê me çiye. Ev pirs di nav rewşembîrên Kurdên Ermenistanê da tucar nehatye meydanê. Armancê teva bû nirxên xweye netewî xweyî derkevin, nehêlin ziman, edeb, folkilor, cyd -- erefat û dêmê wanî kurdewarî bê bîrkirin, girêdana xwe tev koka xwe û welatê xwe neqetnin.

Gotara „Nehêrîneke kurt li ser edebyeta kurdên Sovyêtê,, da emekê teva jî bi kurtî hatye dayîn.

Tıştek heye û tu kes nikare înakarke, ku welatê Sovyêtê da Kurdên Ezidî bêtir netewa xwe, nav û koka xwe xweyî derketin.

Nivîskarên, ku derheqa jîyan û efrandinên wan da lêkolîn hatye kirin, hevkarên min yên bi deha salane, em tev çûne hatine, gelek fireyî û dijwerî me bi hev ra dîtye, ez bingehê da haj wan û efrandinê wan heme. Ewan, rastî jî sitûnên rewşembirya Kurdên Ermenistanê bûn, û şexsiyetên wisanin, ku di nava pêşdabirina çanda Kurd û Kurdistanê da xweyê emekê mezinin.

Bira min biborînin nivîskarên meyc din. Mecalên min tune bûn, ku min derheqa wan da jî lêkolîn bikira.

Ezâk kêfxweş bim ku pirtük kêri xwendevanan bê.

Dr. Eskerê Boyîk

## **Nêrîneke kurt li ser edebyeta kurdên Sovyêtê**

Dem hene, ku têñ dikevin li nava dîroka gelan û xwe didine nivîsar. Cama salek dudêñ usa bêjayî keraya bi sedan salan e. Deimeke usa ew salêñ qeydê Sovyêtê bûn, ku bi serê kurdê Ermenîstanê ketine nava dîroka edebyet û medenyeta kurdan, bûn salne bi nav û nîşan.

Ji pey damezrandina qeydê Sovyêtê ra, çawa seva hemû gel û netewên wî welatî, usa jî ji bo kurdan mecal û îmkanê pêşdaçûyînê çêbûn. Hema salêñ ewlin da guhdariya mezin hate danîn li ser halê gelên şundamayî, ji nav wan hildana nexwendîtiyê, hazirkirina kadrêñ miletiyê, pêşvaçûyîna medenyet û rewşenbiriyê.

Împératorya Rûsyayê, ku ji vê desthilatdaryê ra mîrat mabû, warekî fêodalîyî şundamayî bû. Di serda jî ji pey Şorişa Oktobirê ra kete devê şerê bajarvaniyê, neyarêñ sinifiyê yên hundur û dorpêça dijminêñ sistêma nû, yê derva.

Li ser rîya desthilatdariya nû astengiyêñ aborî, civakî, eşîrî, olî jî kêm nîbûn. Bawer ke ji sedî heyştêpênc-nod evdêñ vî welatî newxwendî bûn. Lê li warêñ, ku diketin perê wclêt, dûr ji rîya, bajara û merkezêñ senayê: yên mîna deverêñ Asya Navîn,

Kavkaz dereca nexwendîtiyê bilindtir bû. Li nav kêmnetewên mîna me kurdan da, ku hê li nav jîyana koçerîyê û nîvkoçerîyê, feodalîyê da bûn, ji hezari dibe yekî duda xwendin-nivîsar bizanbiya, yan na, ew jî ne bi zimanê xweyî dê, lê bi rûsî. Elfeba, xwendin-nivîsara me jî mîna ya gelek netewa tune bû.

Lê gerekê bi heqî bê gotin, nenhîrî dema xwe da Împeratorya Rûsyayê jî siasiya dagirkirinê, kolonyalistiyê dimeşand, lê ji alyê kultûrî, aborî, usa jî di parastina hinek mafêن gelêن bindest da pêşda bû. Qirar û qanûnê wê ji yê dewleta Osmanyê û Îranê dêmokratîktir û qenctir bûn.

Him zulma dewleta Osmanyê, him jî dîn dijmintaya hinek axa, beg û oldarêن kurda yên kevnepereste nezan, jîyan li kurdêن Ezîdî kiribin doje. Ezîdî li welatê kal bavêن xwe: Kurdistanê da bê welat bûbûn, kî alî direvyan ji qatil û antagonistma olê xilaz nedibûn. Welatê Rûsyayê, kîderê seva bawerîyê û hebandinê kesî zordestî li kesî nedikir, fermanêن kuştin, talankirin û qelandinê tune bûn, ew yêr rastî jî Ezîdîyan ra xilazbûn bû. Ji boy wê jî Ezîdîyan berê dabûne wî wclatî.

Ji berê qeydê Sovyêtê, hela deshpêka sedsalfya bîstan (1900-1904) Împératorya Rûsyayê li warêن kurd lê dijîtin sê mekteb vekirin. Ew mekteb yên êlêmîntare çar sale bûn, bi zimanê rûsî. Ji büyerêن wan salan zû hatin dadan û bawer ke şopa xwe jîyana kurdêن wê heremê da nehiştin.

Halê êlên kurdaye aborî jî xirav bû. Şer û dewêن wan salanc xûnrêj, ku navbera tirka, rûsa û ermenya da dibûn, halê kurdê wê navçê jî pir xirav kiribûn. Halê Ezîdîya xiravtir bû. Kurdêن Ezîdî, yê Surmelye, Qersê, Wanê, mîna ermenya hatibûne qirê, revya bûn, koçber û malwêran bûbûn, hatibûn deşta Rewanê, bê cî û war ketibûn devê xelayê, nexweşî û tunebûnê. Leskerêن tirkan, Alayêن Hemîdiyan ra yekbûyî hatibûn derkctibûne hêla çîyayê Elegezê, gundêن kurdêن Ezîdî tev talan kiribûn,

şewitandibûn, bi sedan mîr kuştibûn, dîl biribûn, koka xalqê anîbûn. Talan, nexweşî, xelayê hal di xelqê da nehîstibûn.

Temamîya welatê Rûsyayê halê pir dijwar da bû.

Di vî halê xirab û tengasîyê da, hukumeta Sovyêtêye nû demeke kin da karne pir mezin kirin alyê perwerdekirin û pêşxistina gel û netewên wî welatî da. Heta gund û qiclên here dûr û biçûk da jî dibistan hatine vekirin, mamoste hatin hazirkirin, pirtûkên dersa çap bûn, sistêma xwendin-perwerdekirinê tamamîya welêt da hate damezirandin, ew jî ne bi zimanekî (bi zimanê gelê desthilatdar) lê bi zimanê her gel û netewî.

Wê demê kurd li wî welatî deverê Ermenistan, Gurcistan, Azerbêcan û usa jî Asiya Navîn-Turkmênistanê da dijîtin. Bi hesavê xwe kurd li Azerbêcanê pir bûn. Sala 1923'a li vê komarê "Uêzda Kurda", bi navê Kurdistana Sor hat damezirandin, lê li nava 9-10 salê heyîtiya xwe da, ji rûyê miletçîtiya azerîya, zoxtên dewleta Tirk li ser birayên xwecye hukumeta Azerî, wê damezrandinê di jîyana Kurdên Sovyetê yê çandî, kultûri, civakî da rola xwecye berbiçav nelîst û xêncî navê xwe, tiştekî girîng dîrokê ra nehîst.

Kar û barêن here girîng komara Ermenistanê da hatine kirin û bi salan ew war bû merkeza pêşdaçûyîna çand û kultûra kurdan, kurdzaniyê.

Jîyana kurdê Sovyêtî (Ermenistanê) ya kultûri-çandî, ku devedevî 65-70 sal berdewam kir, mirov karc parî ser sê dema bike.

Dema ewlin: Ji sala 1920'î dest pê dibe, dikşîne heta sala 1937'a. Vê demê mecal pir in, hukumeta komûnîsta / Bolşevîka/ ya nû guhdarîya pir mezin datînin li ser pêşvaxistina gelên şûndamayı, perwerdekirin, xwendin, kultûr û çanda wan.

Lê meydan vala ye. Kadrên milletiyê yê xwendî pir kêm bûn.

Kurdê miacirî wî warî bûbûn ji koka xweye ruhanî qetya bûn. Haj dîrok, edebyet û kultûra gelê xwe nîbûn. Xencî zargotinê tu tişt li holê tune bû, ku ji bo pêşdaçûyîna çand û kultûra civakê bibya hîm. Di wî warî da ewledên gelê ermenya yê bira alîkarîkê pir mezin dane wê heşa gelê me. Gelek xwendevanê ermenî, yê kurmancî zanibûn ketine li nav vî karê pîroz. Gelek çûnc Gundê kurdan, dibistanê nû vekirî da mamostaşî kirin.

Bi qirara hukumata Ermenistanê ya 23'ê Adarê sala 1921'c. dibistanê dereca ewlin û duda da xwendin-nivîsandin, perwerdekirin gerekê bi zimanê dê bihata kirin. Di dibistanê gundênd kurdan da, ji bo ders bi zimanê dê bêne dayîn, sala 1921'ê, meha Oktobirê, kitêba dersa: ŞEMS bi zimanê kurdî lê bi herfîn ermenî hate weşandin. Xudanê wê pirtûkê, ewledê gelê ermenî, pismamê gelê kurd Lazo (Ilakob Xazaryan) bû. Merkezênd dersdar hazirkirinê vebûn, dersdar hatin hazirkirin, ku bi vê pirtûkê zarokê kurd hîni xwendin-nivîsarê kin. Heta sala 1929'a him dibistanê gundênd kurdan da, him jî li nav kurdênd bajarê Tilbîsê. zarokênd kurdan bi vê kitêbê hîni xwendin-nivîsandina zimanê dê bûn.

Çawa hate gotin, qir û bira salênd 1918-1920'î ziyanek giran dabûn Kurdênd wê heremê. Sêwîxanê Ermenistanê û kûçen bajarênd Gürçistanê (Tilbîs, Têlavî, Batim) tije zarokênd Ezidiyan, yênd sêwî û bêxweyî bûn.

Sala 1922'an bi insiatîva Ahmedê Mirazi. Lazo û hinckênd din, li bajarê Tilbîsê ji bo wan zarakan dibistana 103'a vedibe. Li vê dibistanê da zarok him hîni kar dikirin, him xwendinê. Wurda ji zarok radizan. Xwendevanê vê dibistanê bûn zanyarê kurde usa ye bi nav û deng çawa Qanatê Kurdo, Çerkez Bakayêv, nivîskar, berpirsiyarê rojnama Rîya Teze yê ewlin Cerdoyê Gêncô, Mêrxasê Yekîtiya Sovyêtê Semend Siyabendov û gelekkê din.

Wan salan gelek hemcivîn û konfîransê kurdan hatin derbazkirin. Wanda pirsgirêkên jîyana vê civakêye yên here ferz dihatin giftogo kirin, çawa pirsa hildana nexwendîtiyê, şerkarî dijî erf-edetêni ziyankar, ji koçerîyê derbazî jîyana riatyê bin, pirsa jinan. Konfîransa da pirs pêjda hate kişandin, ku xweliyê bidne gundiyyê kurd. Wan civîna da bi doklatêni sereke pêşda dihatin Erebê Şemo, rewşenbîra kurd Nûrê Polatbêkova, serleskerê kurdî bi nav û deng Şemo Têmûrov û gelekê din.

Heta salê siyi di warê çand û edebê da bawer ke tişteki berbiçav çênebû. Tek hêja ye bê bîranînê, ku sala 1926'a bi kurteçîroka Lazo û tevbûna aktyorê ermena, yê wê demêye here bi nav û deng, ji emrê kurda sînema Zere hate kişandin.

Bi spartina hukumata komara Ermenistanê, di sala 1928'a Erebê Şemo û İsahak Mêrangûlov Elfeba Kurda ya bi tîpêni latîni demezirandin. Hema wê salê pirtûka wene Xwe Bi Xwe Hînbûna Kurmancî çap bû. Eva kitêba kurdî, ya pêşin e, ku bi tîpêni latîni çap dibc. Pey ra dest bi weşana pirtükên dersa, edebî, sîyasi, wergera û rojnama Rîya Teze bû. Beşa nivîskarêni kurd li rex Yekîtiya Nivîskarêni Ermenya vebû, di radyoya Yêrêvanê da axavtinê zimanê kurdî hatine dayîn, xwendinxana kurda ya dersdar hazirkirinê dest bi karê kir. Gavêni ewlin warê Kurdzanîyê da hatin avîtin.

Kadirêni kurdaye ewlin sêwiyê kurd bûn, ku ji qir û bira salêni 1918-1920'an da dê û bavê xwe unda kiribûn, sêwîxana da mezin bûbûn, xwendina xweye navîn li wur standibûn. Ji wan geleka zimanê dê jî bîra kiribûn, bi ermenî diaxivîn.

Zanyarê Kurdi bi nav û deng Heciyê Cindî timê ji bîr tanî, ku çawa ew û hogirê wî Emînê Evdal ji pey sêwîxanê ra diçine gundê kurda Qundesaz û Elegezê, ku zimanê dayka xwe carke din hînbin. Li wir çend sala dersdaryê dikin. "Me him zarok hîn dikirin, him jî ji wan hînî zimanê dê dibûn." Nivîskar bîr tanî.

Wan sala komek xwendevanê kurd dişinîn Lênîngiradê ji bo xwendina bilind. Paşê ji wan hinêk bûn zanyarne mezin û navê xwe bi harfên zêrîn di diroka çand û kultûra gelê xwe da nişîn.

Usa, kadrêñ ewlin pêşda hatin: Hecyê Cindî, Emînê Evdal, Qanatê kurdo, Cerdoyê Gêncô, Wezîrê Nadîrî, Casimê Celîl, Etarê Şero. Ew jî hatin gîhiştin Erebê Şemo û Ahmedê Mîrazî.

Ji bo weşandinâ pirtûkên kurdî, weşanxana dewletê ya Ermenîstanê da beşa Wesanîn Kurdî hate vekirin. Pirtûka edebî, ya pêşîn, ku sala 1931'ê li Ermenistanê da hate weşandin ya Lazo bû, bi sernivîsa: Serhatya Casim. Sala 1932'a berevoka efrandinê nivîskarêñ kurda ya ewlin: Efrandinê Ewlin neşir bû. Vê berevokê da bi helbest û kurteçirokan pêşda hatin Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Etarê Şero û hinekêñ din.

Berevoka efrandinê nivîskarêñ kurda ya duda, ku sala 1934'a neşir bû em rastî van nava têñ: C. Gêncô, H. Cindî, E. Evdal, A. Mîrazî, E. Şemo. Ya sisya sala 1935'a neşir bû. Têda efrandinê E. Şemo, E. Evdal, H. Cindî, A. Mîrazî, W. Nadîrî, E. Şero bûn. Berevoka da usa jî navêñ din hene. Kijana paşê dest ji nivîsarê berdane.

Sala 1932'a H. Cindî şanoya xweye Qutya Dû Dermana çap dike. Sala 1935'a bi pirtûkên cuda A. Mîrazî şanoya Zimanê Çiya, W. Nadîrî Reva Jinê, E. Şemo romana Şivanê kurmanca, E. Şero berevoka helbesta Biriqandina Ewlin, W. Nadîrî berevoka helbesta bi navê Nûbar diweşînin. Sala 1936'a romana E. Şemo Kurdê Elegezê û berevoka zargotina kurda ya bi nav û deng Folklora Kurmanca hatne weşandin. Ew berevoka zargotinê ye hêja hazır kiribûn H. Cindî û E. Evdal.

Xêncî van, gelek pirtûkên dersa, yê siyasî, civakî, gundîtîyê, usa jî Xebernâma Ermenî Kurmancî bi amadekirina V. Pêtoyan, E. Evdal, H. Cindî, C. Gêncô hatine weşandin.

Cudatîya dema ewlin ji demêñ peyra ew e, ku Sovyêtê

guhdarîya mezin dide li ser xwendin, perwerde kirina kêmnetewan, wê cêrgê da usa jî li ser kurdan. Mecal pir in, lê kadroyê zana kêm in. Yê heyî jî zimanê dê pak nizanin, haj ji bingeha kultûra xweye milciyê, dîroka gelê xwe nînin. Nivîsarê piranîya wan him ji alyê ziman, him jî di naverok û bedewtiyê da sade, qels û temsarkîn e. Dûrî xebera bedewiyê ya esl in. Lê çi ji hebe wê demê hîm hate avîtin, bingeh hazir bû ji bo paşerojê gavdanên xurt. Xelq tama xwendin, pêşketinê hisya.

Dema dudan: Ev dema ji sala 1937'a dest pê dike û berdewam e heta sala 1955. Sala 1937'a di temamîya Welatê Sovyêtê da dest bi neheqî, zulum û zordestîya diktatorîya stalînizmê dibe. Vê demê kar û barê çand û kultûra kurdeyatiyê jî tê rawestandin. Gelek rewşenbîrên kurd têngirtin, sirgûnkirin, ji kar têngavîtin. Erebê Şemo sirgûnî Sibîrê dîkin. H. Cindî, C. Gêncô, A. Mîrazi têngirtin, zêrandin. Dibistana da dersên bi zimanê kurdî têngavîtin. Dawî li elfeba latînî tê. Bi qirara Stalîn ji pey demeke dirêj ra, dewsa elfeba latînî, elfeba kirîlî digre. Sala 1941'ê, hukumata Ermenîstanê qirar dide, elfeba kurdî biguhezin ser hîmê kirîlî. Wî karî dispêrne Heçîyê Cindî. Ew di demekcîn da bi tipêñ kirîlî elfeba nû ji bo dibistanê gundê kurdî hazir dike. Sala 1946'an elfeba tê çapkirin. Ev elfeba heta sala 1990'î deh cara çap bûyc û deve-devî nîv sedsalî zarokêñ kurd bi wê hînî xwendin-nivîsarê zimanê dê bûne.

Civaka kurd jî ji rûyê wê zulmê derbne mezin stendin. Kurdêñ Naxîcêvanê yê komara Azerbêcanê (1937), Kurde Gurcistanê (1944), hinek jî yê Ermenistanê sirgûnî komarêñ Asya Navîn kirin. Ji sur, sarmê, birçîbûn û nexweşîyan gelek rêda qir bûn. Wan salan hebs tije girtî bûbûn. Gelek hatin gulekirin, bê ser berate unda bûn, mal xirav bûn.

Sala 1941'ê dest bi şerê dijî Almanya Hîtlêryê bû. Zor û zemetyê şer li ser kurdan jî giran rûniştin. Bi hezara mîr çûne

pêşenya şer. Ji sedî bawer ke hevtê-heystê venegeryan. Anegorî hesavê xwe, emekê kurda jî altindaryê da kêm nîbû. Gelek ewledên gelê me bi mîrxasî şer kirin û hêjayî ordên-mêdalên dewletê yên bilind bûn. Semend Siyabendov hêjayî navê Mérxasê Yêkîtiya Sovyêtê bû.

Rast e, wan sala karê çand û kultûryê hate rawestandin, lê hemâ sala 1937'a li gundê Elegezê (nehya Elegezê) tiatroya kurdaye dewletê hate demezirandin. Tiatro jî li ciyê vala çebû, ne şanoyê miletiyêye piri - hindiki hêja, ne jî şanoger û şanovan hebûn. Aktyorê tiatroyê yê ewlin ji nav xorî û keçen gündên kurdaye nehya Elegezê hatin bijartin. Kar û barê tiatroyê alyê dewletê da dihat finanskirin. Lîstikvana meş distandin. Alîkarya mezin şanoger û pêşekzanên ermenya, yê here bi nav-deng dane kolêktîva tiatroyê gênc. Wan salan nivîskar û şanonivîsên ermenî li ser hîmê zargotin û jîyana kurda gelek şano ji bo wê tiatroyê nivisin: Mem û Zîn (S. Taronsî), Ker û Kulik, Keça Mîrekê, Xecê û Siyabend, Gur Heso (S. Gênosyan) û yê din. Tiatroyê gelek şanoyên kilasîkên edebyeta ermenya, gurca, azerya, rûsa derxistin li ser dîka xwe. Bi melûmetiyê rojnamên wê demê da neşir bûne, demeke kin da civaka tiatroyê digihîje destanînê berbiçav.

Tiatro ketibû li nav jîyana xelqê kurd. Seraya Tiatroyê têra temâşçîya nedikir. Lê sala 1947'a nehya Elegezê hate betalkirin. Derê Tiatra Kurda, dema gulvedana wê da hate dadan. Di nava 10 salê jîyana xwe da civaka wê deve-devî 30 şano derxistin li ser dikê. Ji wan tek çar şano yê nivîskarên kurd bûn: Lur De Lur -xudanê wê serokê tiatroyê ewlin Celatê Koto-Mîraz ya Heciyê Cîndî, Xuşka Doxdiryê û Bira yên Cerdoyê Gêncô bûn. Salê şer C. Gêncô serokî tiatroyê dikir.

Gelek lîstikvan û karkirê tiatroyê paşê ketine li nava xebata çand, kultûr û perwerdekirina gelê xwe. Aktyorê tiatroyê Mîroyê

Esed ji pey karê siyasîyi bilind ra, salê dirêj bû berpirsiyarê rojnama Rîya Teze. Celatê Koto karê dadmendiyê da xebitî. gelek bûne dersdarê mekteba u hwd..

Bi gilîkî, rast e, li vê demê bêdengîke giran dikeve li navâ jîyana kurdên wê heremêye kultûri, çandî, lê kar û barêna dema ewlin û karkirina tiatroyê bade naçin, nahêlin agirê hatibû vexistin bitemire. Ji pey mirina "Bavê millet" Stalin ra, kurde Welatê Sovyêtê jî dawê masê xwe, yê binpêkirî kirin. Pirsa kurda li raya ortemiletiyê da jî hate meydanê, Hukumeta Sovyêtê dîsa kurd bîr anîn.

Dema sisyan: Ji nivê salên 50'î dîsa rojêna xweş seva pêşda çûyîna çand û kultûra kurdê Sovyêtê (Ermenistanê) hatin. Dîsa dest bi weşana rojnama Rîya Teze, axaftinêna radyoya Yerêvanê bi zimanê kurdî bûn, xwendinxana dersdar hazirkirinê vebû, Beşa Nivîskarêna Kurd karê xweyî efrandariyê gumrih kir, di Akadêmya Ermenistanê Zanyariyê, İnstîtûta Rohilatzanîyê da para kurdzanîyê vebû û hwd.

Vê carê meydana karkirinê vala nî bû. Ji piştî vegera nivîskar Erebê Şemo ji sîrgûniyê karêna efrandariyê xurttir bûn.

Salên xweye efrandaryeye here gulvedanê da bûn Hecîyê Cindi, Emînê Evdal, Ahmedê Mîrazi, Casimê Celîl. Her usa jî hatin gihiştine wan Qaçaxê Mirad, Usivê Beko, Eliyê Ebdilrehman, Nado Maxmûdov, Mîroyê Esed, Xalîl Mûradov û hinekên din, yê ku dema duda da karêna dewletê, siyasîyê cuda-cuda dikirin. Erebê Şemo nivîsarêna xweye salê siyî carke din li ber çavê xwe ra derbaz kir. Sala 1959'a romana wîye nû Berbang, sala 1959'a Jîyana Bextewar, 1965'a Dimdim Yêrêvanê da neşir bûn. Sala 1969'a bi pirtûkeke merdana berevako efrandinêna nivîskar çap bû. Di wê da cî bûbûn romanen Berbang, Jîyana bextewar, Hopo. Romanê E. Şemo bi gelek zimana hatine wergerandin, bi kurdî jî pir cara çap bûne, nav û

dengê gelê me ra anîne. Li nava edebyeta kurdî da romanên ewlin E. Şemo nivîsîne.

Heciyê Cindî, bilî xebatê wî yê zanyarî, dersa, zimanzanî, zargotinî gelek helbest, destan, kurteçîrok, tercime ji nivîskarên bîyanî weşandine. Lê bi fikra min sertacê efrandinê wiye bedewtiyê romana Hewarî ye. Hewarî bi gelek zimana hatiye wergerandin. Ev roman kul û jana gelê kurd c, êşa bi dewr û zeman e. Bi jîyana êleke Ezidîyan (êla Sîpka) nivîskar temamiya nakokî û pirsgirêkên li nava gel da, sebebên bêtifaqîyê, bindestîyê û hejarîya wî tîne ziman. Roman li ser bûyerên bûyî hatiye nivîsar.

Helbestvan Casimê Celîl xudanê gelek berevokêن helbest û destana ye. Salêna cuda-cuda bcrevokêن wiye Elegez, Beyt-Serhatîyên Kurdan Yê Evîntîyê, Kanya Dê, Ocaxa Min, Kilamên Çiya, Oda Kurdan, Kurdê Bengî çap bûnc.

Destanîneke edebyeta kurdaye di warê nivîsara vekirî da pirtûka Ahmedê Mîrazi ya Bîranîn e. Eva him bi alyê ziman, naverok û bedewnîvîsarê da kulîlkeke rengîn c, bînxwêş e li nava baxçê edebyeta gelê Kurd da.

Zanyar û rewşenbîrekî ber biçav bû Emînê Evdal. Li rex xebatên wiye kurdzanîyê, zargotinê, gelek helbest, destan û kurteçîrok weşandine. Hêjayî bîranînê ye destana wiye Gulizer. Ev destana radyoya Yêrêvanê kiribû kompozîsa û alyê guhdara va bi hîzkirin hate qebûlkirin.

Xudanê çend berevokêن helbestan in helbestvanên bi şuret Qaçaxê Mirad û Usîvê Beko. Di warê nivîsara vekirî da jî karne anegore hêja Elîyê Ebdîlrehman, Nado Maxmûdov, Mîroyê Esed, Xelîl Muradov kirin.

Li ser vê govekê û bingehê dengê edebyeta esîl ji pêy salê 60'ı ra hate bihîstin. Bi serê silsileta Şikoyê Hesen, Fêrikê Usîv, Mîkayîlê Reşit, Sihîdê İbo, Simoyê Şemo, Karlênen Çacañî,

Eğitê Şemsî, Rîzalyê Reşît, Ordixanê Celîl, Baryê Bala di warê helbestê da, Wezîrê Eşo, Emerîkê Serdar, Egîtê Xudo, Ahmedê Hepo, Sîma Semend, Ahmedê Gogê di warê nivîsara vekirî da, dinyake nû li nava edebyeta vê para gel da hate vekirin. Paşê ew cihan rengîntir û zengîntir kirin Tosnê Reşît, Çerkezê Reş, Elîxanê Memê, Babayê Kcleş.

Ji van hineka bi şureta nivîskaryêyi mezin, hineka bi xebathizî û zanebûnê pir rîya xwe vekirin û ji alyê xwendevana da hatine naskirin û qimetkirin.

Gerekê bê gotin ji navêni li jor gotî her yek şexsiyecik e, kar û barê girîng kirine û efrandinên wan hêjayî lêkolînên edebyatzanyêye esil in.

Sala 1961'ê berevokêñ helbestan, ya Şikoyê Hesen Qlüçêk û ya Fêrikê Usivê Çevkanî neşîr bûn. Weşandina herd berevokêñ wan şayiraye ewlin, qewmandin bûn li nava edebyeta kurdê Sovyêtî da. Herd şayîr jî xwedêdayî bûn, wextekî kin da bûn hizkirîyê xwendevana.

Ş. Hesen ji rûyê kesîbiyê, tengasîyêñ aborî û der dorêñ neqenc da nikaribû temamîya qewat û şureta xwe boy pêşxistina edebyeta gelê xwe bida kêranîn. Ji pêy weşandina du pirtûkêñ helbest ra: Tembara Kurda û Meremê Dilê Kurd, çîlûheyş saliya xwe da çû ber rema Xwedê. Lê ci jî hişt pir giranbiha ne.

Fêrikê Usiv mîrateke pir mezin û zengîn ji pey xwe hiştiye. Ev berevokêñ wîye helbesta hatine weşandin: Gula Elegezê (1954), Lîrika (1967), Usivê Nebya (1973), Narê (1977), Hisretdefter (1984, Bihara teze N 1), Dinya Delal (1987, Bahar N 6). F. Usiv hostê xebera bedewtiyê bû. Ewî bi helbest û destanêñ xweyc delal reng û naveroka nû, bi heqî gotî nûjenya esil anî nava poçzya kurdaye pirqurne. Ji cûrê kilasikê dûr neket, lê bi pê û şopa xweye dewlemend û rengîn kir, bi kurtî gotî quesra xweyc berew li rex qesrên şayîrê kurdaye nemir çêkir. Destanêñ

wîye Usivê Nebya, Xewna Mîrmîh, Rihana Reşo, Hisret û yên din ne ku tenê sertacê efrandine wî nc, lê usa jî mirov kare wana dayne li rex destanên kilasikên meyc here mezin.

Pir hewaskar û dewlemend e poêzya Mikayêlê Reşit. Ewî cûre û naverokeke nû anî li nav edebyeta kurdê Sovyêtê.

Helbestvanên hêja û xwecyê rîya xwexatyê ne Simoyê Simoyê Şemo, Sihîdê ïbo, Karlênen Çaćanî, Rizalyê Reşit, Egîtê Şemsi.

Tosinê Reşit, Çerkezê Reş, Elixanê Memê xwe ra ronayîke ges, kûrayîke anegor û bineke xweş anîn.

Di warê nivîsara vekirî da karne mezin kirin Wezirê Eşo, Emerîkê Serdar, Sîma Semend, Egîtê Xudo, Babayê Keleş. Wana tevî Ahmedê Gogê, Temûrê Xelîl, Hesenê Qeşeng, Mirazê Evdo, Baryê Mehmûd rojnamegerîya kurda jî gihadine destanînên hêja. Gavne xurt alyê şanogerîyê da jî hatine avîtin.

Li nava kurtenivîseke wa da îmkan tune wan hemû kar-barêni li nava wan 65-70 sala da hatiye kirin bê gotin, qimetkirin û analîzkirin.

Ew mijara ne ku miqaleke wa ye, lê bi dcha xebatê edebyetzanyeye mezin e.

Edebyeta kurdê Sovyêtê bi cûre, naverok û temamîya xwe şaxekî edebyeta kurdaye teybeti ye. Rast e li xerîbiyê hatiye efrandin, lê mîna xûn-goşt tim li welatê xwe va girêdayî bûyc.

Pêvajoya pêşdaçuyîna çand û kultûra kurdî li Ermenistanê gumrih berdewam kir heta salê 90'i. Rûyê pêşdahatina qewatîn miletçîye şovûnist, hilweşîna qeydê Sovyêtê, avayê çand û kultûra kurdaye li wur jî hilweşya.

**EREBÊ ŞEMO**  
**1897-1978**



Despêka salên şestî bû. Ez ji gund hatibûm û min bajarê Yêrêvanê di xwendina bilind da dixwend. Evarê, ez sehetekê – duda derdiketim nava bajêr, ji bo pcy xwendinê ra hêsa bim. Dewya havinê bû. Ji pey rojên germ ra hewa êvarêن Yêrêvanê pir xweşê. Hewake hênik dilize û dewsâ hulma germa rojê, hênkayîke xwşîk laşê mîriv dipêce. Rîya min li kûça ser navê X. Abovyan ra derbaz dibû. Wan sala êvarê ew kûçe timê tije meriv bû. Rewşembirêن Ermenya yê here bi nav û deng êvara wê kûçê da digeryan. Ew kûçe teyê bigota dilê bajêr bû, evdêñ rewşembire eyan himlî li wir dijîtin.

Li nav geleka da rîspîkî maqûl, bi bejna nîvçê bala min dikşand. Qaz qudra ta xwedê dema ez derdiketim gerê, ew jî wî wedeyî derdikete seyrangê. Porê sipî, dêmê bedewî rem, cil – rîhalê qibraxe bêqisûr, kewazê dêstî bedew hewasa mîriv tanîn.

Min tê derdixist, ku ew evdêñ wê kûçê da derdiketine seyranga êvarê, payê pirê hev nas dikirin, silav didane hev. Çevê min miqîm li kalê bû. Payê xelqê, yê pirê li ber kalê disekinîn, kumê xwe derdixistin, silav didanê, derbaz dibûn.

Kêfa min ji rîspî, maqûltiya wî, rêvaçûna wî ra dihat û her êvar min dixwest kalê xwe bivînim û bizanbim gelo ew kîye ?

Rojekê jî kûçê da min ji merivekî pîrsî:

-Biborîne, ew rîspî kî ye ?

-Çiye, tu ji Yêrêvanê nînî ?- camêrê ermenî ecêvmayî min nihêrî, - ew nivîskaê kurd Ereb Şamîlove.

Min nav û dengê Erebê Şemo di zarotyê da bihîstibû. hînek nivîsarêñ wî xwendibû. Lê ew bi xwe nû didît.

Wê êvarê ez pir kubar bûm, ku ew rîspîyê maqûl nivîskarê gelê min Erebê Şemo ye.

Paşê me nêzîk va hev nas kir û weke 15 – 16 sala, rîya edebyeta kurdî da, ez wî mirovê mezin ra meşyam.

\* \* \*

Hîmdarekî edebyeta kurdên welatê Sovyêtê yê ewlin, nivîskarê eyan, bavê pomana kurdî Erebê Şemo / Ereb Şamîlov/ sala 1897 an li gundê Sûsizê, qeza Qersê ji dayka xwe büye. Wê demê ew qeza di bin desthiletdarya împératorya Rûsa da bû. Sûsiz gundekî kurdên êzdi bû. Mala bavê wî şex bûn. Lê wek hinek malbetên dîndare din ne xweyî milk û mal bû. Kesîb bûn. “Şemo kurmancekî kesîb bû, ji êla Hesinyan, - gelek sal paşê nivîskar di derheqa bavê xwe da dinivîse, - . diçû ber dewarên xelqê”. Wî li wê qeza kurdan, gundên melekanan, adirbêcanan, huruman û ermenyan rîncberî dikir. Salekî şivan bû, sala din gavan û bi teherekî ebûra zarokên xwe dikir.

Ereb lawê Şemo yê sisyan bû, zaroke aqîlî çevvckirî. Di zarota xwe da Erebê çûk dijweryên jîyanê dîtin, di malên zengîna da xulamtî kir, bû berxvan, golikvan, dûajoyê bavê xwe.

Di emrê wî da bûyareke nebîrkî bû, dema ew di xwendexana Melekana ya Alêksandrovkiyê ya zimanê rûsî da bû berdestî. “Gerekê min heyat paqij kira ji kaxazan, tozê, lê zivistanê: ji berfê, otaxên dersxanan gêzî kira, toza li ser textê û pencestan hilda, av banya têkira boçkan, bona vexwerina şagirtan, sibê û êvarê simawira wê bikeland, biçûma nava gund û dukanê, ci jê ra lazimbûya, bistanda, carna biçûma bajêr temyê wê biqedînim. lê wextê berf diket, gerekê her sibe zû sobê li dersxanê û otaxê wê dada.”

Bi saya milûkî, çavvckirî, xebathizyê dersdar hiş ji Erebê biçûk dike. Keça dersdara mektebê : Marûsyâ çûk ELFEBA zimanê rûsî pêşkêşî Ereb dike û bi alikarya wê, Ereb, dema xweyî vala, dest pê dike bi xwe xwe hînî xwendina rûsî dibe. Wextê mamista re'm wê yekê divîne, Ereb bê heq hildide xwendexanê.

Usan ew dibe şagirtê wê mekteba dudersxanc, ya bi zimanê rûsî. Di demeke kin da dibe xwendevanekî herî pêş. Ji pey qedandina xwendinê ra Ereb dîsa xulamtya malên dewletîyan, yên tirk, ermenî, rûs, hurum dike. Xulamtiya wan salan, wî bêtir di nava dijweryên emir da qal dike. Ew li ber çevê xwe halê gelé xwe yê bindest û evdên kesîb - kûsîb dibîne. Xelqê kurd alyê axa, beg û dîndarên desthiladar da jî têr zêrandin, pelçiqandin. Ew malên dewletî cem kîjana xulamti dikir kurmancî nizanbûn. Erebê zîrek mecbûr dibe zimanê wan fîrbe, ku karibe bi wan ra bi zimanê wan biaxive.

Usan bû, ku hê 14 15 salî jî tune bû, êdî bi serbestî tev zimanê dê usa jî rûsî, ermenî, tirkî, hurumî diaxivî, rind haj erf - edet, rabûn - rûniştandin û xeysetê wanî miletyê hebû.

Ji bo wê karê jî cfrandinê nivîskar da ewqas kûr û rast, bi rîalistî deb, rabûn- rûniştandin û xeysetê wanî miletyê bi bedewetî hatye nişandan.

Zanebûna zimanân roleke mezin emrê wî da lîst.

Şerê Rûs – Tîrka dest pê dike. Taxbûrên leşkerên rûsan li kîlekka gundê wan çadirê xwe lê dixin. Pê dîhesin, ku wî gundi da xulamekî kurd heye yê rind zimanê kurdî, tirkî, rûsî, ermenî zane. Wê demê merivê usan pir kêm bûn. Dest xwe da gazî wî dikin û di ordiya leşlerên Rûs da kivş dikin çawa tercîmeçî (werger).

Tevî ordiya rûs ew du salan / 1914 – 1916 / dijî tîrkan

şer dike. Wan herd salan ew geleк evdêن rûsc xwendî, yên xweyê bir bawarî û fikirên şoreşger ra dibe nas, hevaltiyê tev wan dike, kitêba dixwîne, dinya zanebûn û fikirandina wî fire dibe.

Hê bîst salî jî tune bûye ew zilamê xweyî şuret, çawa gel dibêje, êdî digihîje gilyan, tê derdixe, ku ew nerastyêñ jîyanê, kul derdêن bêhesav evdêن bindest ra ji ku têن.

Sala 1916 – an Erebê Şemo diç Sarîqamîşê û di çêkirna rîya hesin da wak pale dikeve ser kar. Wê derê ew bolşevîka ra dibe nas, tevî karê wanî dizîva dibe. Sipartinêñ wan yê gelekî bi qezya û dizî bi serfînyazî diqedîne.

Bîr û bawaryên bolşevîkan nêzîkî ruhê wî bûn. Ew mîtingen karkir û leşkeran da bi xeberdan pêşda tê, wan dide serwextkirin, ku azaya wan tenê qewlê dêmokiratyê, komûnîstyê da kare bê mîyaserkirin. Gerekê hukumê axa, beg û milkedaran bêne hedimandin. Mirovê xebatçî gerçê bîc xweyê bextê xwe, welatê xwe, xebata xwe û bi xwe pirsgirêkên xwe çareserke. Gundî gerekê bivin xweyî milk, xweyî ax. Ji bo wan xebatê wî jî, wî digrin davêjine hebsê.

Ew pir hebsê da namîne. Çînovnîkêñ dewletê, dcma kare wî lêkolîn dikin, pê dihesin, ku Ereb kurdeki êzdî ye. Bi fikira wan kurd giva ewqas jî siyasyê fem nakin û nikarin bivne bolşevîk.

Berdidin.

Ji pey hebsê derketinê ra demeke kin gundê xwe: Sûsizê da dimîne, paşê dizîva derbazî Rûsyayê dibe, diçe bajarê Stavropolê. Wê demê Rûsyayê da şorişa Oktyabirê pêk hatibû. Hukum ketibû destê Bolşevîkan. Ereb dikeve nava ordyâ Sovyêtê ya nû avakirî, kîjanê ra digoton Givardiya sor. Sala 1918 – an ew êdî endemê Partiya Komûnîstê

Rûsyayê (Bolsyevîka) bû.

Xortê şoreşgerî serwext texmîn dike bêy xwendina bingehîn nikare kêrî gel û partîyayê bê, xwestin, bîr û bawaryên xwe bîne sérî. Sala 1920 - î diçe bajarcê Moskivayê û zanîngeha Lazaryan da dor çar sala, heta sala 1924 - an dixwîne.

Sala 1924 - an vedigere Ermenistanê. Wê demê Ermenistanê da jî êdî qeydê sovyêtê alt kiribû. Ew Kommerkezya Partya Komûnistyê / Bolşevîka / ya Ermenîstanê da dikevc xebtê.

Hukumata Ermenistanê ya nû, hema di salêن xwe yên ewlin da mecalêن anegor saz kir ji bo pêşdaçûyîna wê para gelê kurd, yên li Ermenistanê dijîtin. Ku wan jî halê şûndamayîna kultûryê û aboryê derxe her alya da alikarya wan kir. Gel halê koçeryê û nîvkoçeryê da bû. Merivêن kurde xwendî pir kêm bûn. Erf - edetêن kevne zîyandar qewlê nû ra nedimeşyan, li ser riya pêşketinê dibûn asteng û zîyana mezîn didan civakê.

Di wî wefî da ewledêن gelê ermenî pir alîkarî dan dostêن xwe yên kurd, ji wan geleka zimanê kurdî zanibûn û bi hizkirin diçûne gundêن kurdan, ku nav wan da nexwendîtyê bidinc hildan, kurda ra kadroyêن miletyê hazir dikirin. Mektebên gundêن kurdan yê nû vekirî da çawa mamosta dixebiñ.

Erbê Şemo kete nava kûrma wê xebatê. Ewî di nav gelê xwe da karê rewşembiryê, kultûryê, perwerdeyê, ronakbiryê dikir, pirsgirêkên wan digîhand hukumatê, dijî edetê bêkêr û peymayêن hukumdarya berêye fêodal şerr dikir. Derheqa jiyana kurda da di rojneme û kovarê komarê da dinivîsî.

Sala 1924 - an, 5 - ê heyva hcîranê li zozanê Elegezê

civîna kurdêñ nepartîvan hate derbazkirin. Civînê da axaftina himlî ya ûnstrûktorê Kommerkezya Partîya Komûnîstê Ermenistanê Erebê Şemo bû. Navê têma axaftina wî „V.I. LÊNİN û miletêñ biçûk „, bû.

Sala 1927 - an hukumata Ermenistanê (Komîsaryata ronkaye û perwerdê) ji bo hazirkirna elfeba kurdî ya nû qirar qebûl kir. Elfeba nû gotî li ser hîmê herfê latînî bihata demczirandin. Sala 1928 - an karê hazirkirna ELFEBÊ bi serfinyazî hate qedandin. Xudanê wê bûn mamosta Îsahak Maragûlov û Erebê Şemo. Îsahak Mêrangûlov ji gunde Vêrîn Divînê bû, Komara Ermenistanê. Bi eslê xwe Mexîn (Aşûrî) bû.

Xwendina bi zimanê rûsî, helaqetyên wî tevî rewşembîrên eyan û rîvabirên hukumatê, mecal didan, ku ew pirsgirêkên gelê xwe bigîhîne cîyêñ bilind. Bi însiyatîva wî sala 1928 - an komek xortêñ kurd ji Gurcistanê û Ermenistanê şandine Lênîngiradê xwendinê. Ji pey kutakirina xwendinê ra bawarkî teva jî karne berbiçev kirin ji bo gelê xwe. Ji wan Qanatê Kurdo paşwextyê bû zanyarekî kurdzanyê yê bi nav û deng, Semend Sîyabendov şerê dijî Almanya Hitlîryê da bi mîranî şer kir û navê Mêrxasê wclatê Sovyêtê stend.

Erebê Şemo xebata berbiçev kir ji bo sazbûna rojnema kurdiye RYA TEZE. Sala 1930 - i li bajarê yêrêvanê dest bi weşena rojnemê bû. Ew rîvabirckî berpirsarya rojnemeyî herî aktiv bû. Wê salê dîsa li Yêrêvanê xwendinxana dersdarhazirkirnê ya kurdî vebû. Berpirsyarê xwendinxanê yê cwlin ew bû.

Lê dirêj wê wezîfê nake. Zûtirekê wî dişînîne bajarê Lênîngiratê xwendinê. Ew aspirantûra însitûta Dîroka Kultûrayê da qebûl dibe. Wî çaxî ew usa jî di însitûta Felsefe, Edebyet û dîrokê da dersê ziimanê kurdî dide.

Dewya salê sîyî welatê Sovyêtê da dest bi dijweryên (réprésya) diktatorya stalînîzmê dibin. Bi mîlyonan evdêne wî welatî yên bê sûc, am – tam dibin qurbanê wan dijweryan.

Kurdên Sovyêtê jî zîyana mezin dîtin. Sala 1937 – a Erebê Şemo li Pêtrogiradê (Lénîngirade) girtin û sirgûnî Sîbirê kirin..

Dema jîyana xwe ya here aktîv û gulvedanê, dema efrandarya gurr da ew kete devê sue, serma û dijweryên sirgûnya zulm. Di bin giranya sîyasya neheq, ew jî werekî xwzevî mîna Sîbirê da, ku qewlê hewayê û jîyanê usanîn, ku degme evd, ew jî evdêne welatên germ, karin lê teyaxkin, mayîn pir çetin bû. Mecalên jîyanê, yên here sadc jî dewletê evdêne sirgûnkiri ra hazir nckiribû. Yanê usa, kê çû, kê ma. Ëdî derheqa nivîsar û efrandaryê da gilî nikaribû hebya, dima ber xwe bide ji sermê, birçîbûn û zordaryên sîyasî xwe xweyî kira, jîyana xwe biparasta.

Sîbir bi mîlyona evdêne wek Ereb ra bû goristan. Ereb zarotî û xortanya xwe da pir dijweryên usa dîtibû, qal bûbû.

Ji pey bîst salêne zemete dûr û dirêj ra, (pey mirina Sitalîn ) sala 1956 – an, wî wa gotî “e’fû” dikin, dibêjnê, ku tu sûcê wî tune bûye, neheqî lê hatye kirin.

Ji wur vedigere Ermenistanê, Yêrêvanê. Dîsa dest bi jîyana wî ya sîyasî, civakî û efrandaryê dibe. Ci, ku salê sirgûnyê unda kiribû, şev – roj dixebeitî ku wê valayê tije bike.

Mala wî nava bajarê Yêrêvanê, cîyê herî rind, li kûça ser navê roakbirê ermenya Xaçatûr Aboyan bû. Heta niha jî li ser dîwarê wî tamî, ji bo hurmet û bîranîna nivîskarê mezin kevirckî mermerî guloverî bedew lê xistine û li ser bi zimanê rûsî nivîsare: “ Vê malê da ji sala 1963 – a heta

1978 –an nivîskarê kurd û xebatçiyê civakî Erebê Şemo, Şamîlov jîtye.“

\* \* \*

Di salên qeydê Sovyêtê yên ewlin da, li Ermenistanê , ji bo kurdên wê deverê jî mecalên pêşdaçûyînê hatin sazkirin. Civaka kurda şûndamayî û nexwendî bû. Halê fêodalyê da jîyana koçeryê û nîvkoçeryê derbas dikirin. Dewletê her tişt dikir, ku miletên mîna kurdan ji halê şûndamayînê derxe.. Wan ra hîmê medenyeteke milatî dihate danîn. Kadroyêñ xwendî, zanc bawarkî tunc bûn. Wezîfêñ pir cawdar û giran diketin ser milê yên wek Erebê Şemo.

Wan sala jî dest bi emrê wî, yê efrandaryê dîbc. Sala 1929 – an ew tev Îsahak Maragûlov elfeba “Xwe Xwe hînkirina zimanê kurdi ” diweşîne. Ev kitêba ya kurdaye ewlin e, ku bi herfîn latînî çap bûye. Ev elfeba dîrokî bû hîm, ku wê demê, welatê Sovyêtê da nivîsara kurdi ji tîpn ermenî bêñ guhestin bi herfîn latînî.

Sala 1930 – ï pirtûkêñ wî yên bi navêñ “Emirê Lênîn”, “Terîqa rîvolûsyâ Oktyabirê”, “Kolxozi û kara wê gundya ra” têñ weşandin.

Wê demê ew rojnemên rûsî û ermenî da bi gotaraêñ bersîre pêşda tê, siasya dewleta nû xweyî dike, xelkê nexwendî, şûndamayî dide servextkirin ku dewleta nû ya xebatçî û belengazan, pale û gundyan e, dixweze çavê gel veke, ku ew zulmkar û kedxwcrêñ xwe, yên rastî, nas bikin, menya hejarî û feqîrya xwe bihesin û bisenin alye welatê sovyêtê. Dijî erf – edetêñ kevne seva pêşdaçûyîna gel ziynkar şer dike, efrandinêñ bedewetyê dînivîse.

Di sala 1936 –an nivîsara wî ya bi navê „Li ser

pêwendyên Fêodalî di nav kurdan da" tê weşandin .., Seva tiatroyên gundêñ kurdan şanoya nivîskarê ermenî Alêksandir Araratyan ya bi navê " Koçekê derewîn " werdigerîne bi zimanê kurdî û diweşîne (1930 ).

Sala 1935 – an efrandinêñ wî : ŞIVANÊ KURD, lê salekê pey ra jî KURDÊ ELEGEZÊ têñ weşendin. Bi weşendina van efrandina, îlahî ya "Şivanê Kurd " Erebê Şemo çawa nivîskarekî kurdî bi şuret hat naskirin û nav - dengê wî çawa li nava welêtê Sovyêtê ûsan jî li nava rewşembirêñ kurde yên wê demê da bela dibe.

Ev romana biçûk bi gelek zimanân / rûsi, ermenî, gurckî, azeyrbêcanî, firansî, almanî, tirkî, erebî û gelek zimanêñ din / hatye wergerandin û weşendin.

Ciyê gotinê ye, ku salêñ sîyî dema rewşembirêñ kurd li bajarê Bêyrûte berevoka pêşkêşî efrandinêñ nivîskarêñ kurdêñ Sovyêtê diweşînin herd efrandinêñ nivîskar, yê jorgotî jî ciyê xwe wur da dignin. Berevok jî bi navê romana ŞIVANÊ KURD tê navkirin.

Nivîskar êdi rind haj edebyeta rûsa û ermenîya hebû. Jîyan, deb, rabûn – rûniştandin, ziman, pirsgirêk û xeysctê çawa gelê xwe usan jî yê gelên wê heremê zanibû. Hemin li nav gelê xwe derketibû. Di nav bîr û bawaryêñ şoreşgeryê da pijya bû .Ev hemû bûbûn hîm ku nivîskar efrandinêñ berfire binivîse û jîyana gelê xwe / usa jî gelên cînar / bi zaravê kurmancîyi xwêş, bi rîalistî raxe ber çavêñ xwendevanan.

Ew bi gelek rewşembir û nivîskarêñ gewre yên dema xwe, yên welatê Sovyêtê ra nas bûye û dostanî kirye. Îlahî hukmê edebyeta rûsi ya wê demê ser wî pir tê xanê.

Nivîskar derheqa rasthatina xwe tev nivîskarê rûsi mezin Maksîm Gorkî timê bi kêfxweşî gilî dikir.

Gorkî hatibye Ermenistanê. Li bajarê Yêrêvanê, Erebê Şemo destnivîsara romana “Şivanê Kurd” dêst da rastî Gorkî té. Gorkî destnivîsarê hildide, bi dilxweşî lê dinhêrc û dibêje: “Gelê kurd bi zimanê nivîskarê xwe: Ereb Şamîlov qise dike.”

Romanoka “Şivanê Kurd” serhatya jîyana nivîskare, çîroka zarotî û xortanya wî ye. Li nav nerastî û dijweryê emir da, li nav kar û bar, neheqî û zordestyan milkedar, axa û began da zaroka kurd ya malbeta belengaz, mezin dibe, qal dibe, digihîje femdarya sosyalîstyê, dikeve nava refen şoreşvanan, şer dike ji bo azaya evdên bindeste zêrandî. Romanê da bi nîgarkirina dîdem, bûyar û xcyasetên şexsyetan, nivîskar bi şerezatî û hûrgilî jîyana xulam û karkirêñ li cem kedxweran tîne li ber çavan. Ew ne ku tenê derheqa jîyana kurda, lê usa jî derhrqa gelên wê herêmê yê din da gili dike. Dide kivşê ku hejarî û zordarî mîletyê nas nake. Zalimê her gela weke hevin, hejar jî weke hevin.

Dîdemekî pir barkêş e, dema gur dikeve nav keryê pêz, şerê şivanê zarok, seyê wî: Çevreş û gur. Bi zemetî ew gur ji pêz dûr dixin, nahêlin cw zîyana mezin bide kêrî. Lê gur bizina keşê molokan dikuje. Ew goşê bizinê dibe dide xweyî. Dewsa keşe êginayî û culetya şivanê biçük qîmetke: “Xezebeke dijwer ew girt, - nivîskar dinivîse, - ez birim axorê û li wê, ewqas li min xist, ku min ne dikarî xwe ji erdê rakim. Ez bê hiş li wê mam. Bavê min hat û ez li wê dîtim û bi zehmet ez kişandim mal.” “Adat wa ye, ku şivan ji xisara ra ji alyê guran nayêne berpirsyar kirin. Herwckî şivan bê çekin, ev tiştekî maqûl e. Lê kûlak Sêliverston, meznê Molokanan guh ne da adat û qanûnan. Ji bo bizina birandî, ji salya min çend rûblî û çend kopêk ji min birî.”

Eva rastya jîyana wê demê bû. Romanê da, cîkî din hatye nîşan dan çawa ji kêtî 3 pez unda dibin. Bi şâşî davêjin ser merivekî. Mûsa Beg bi zorê 3 peza ji wî distîne. Dema pezê undabûyi dibînin, beg pezê mîrik xwe ra hildide, paşda nadê.

Bûyarên wa pomanê da pirin. Hewaskarin parêñ romanokê yên derheqa “dizîna” çetela, xwendina wî dibistana rûsi ya dusale da, berodan û beranberdan da, derketina zozana, xezaya wê deverê ya delal da û hvd.

Nivîskar derheqa bûyarên wan sala yê wê heremê da qewimî gilî dike, şerkarya pale gundyan û tevgera agirê şoreşgerî ku li nav leşkerên rûs da gur bûbû nîşan dide.

Gelekî bi barkêşî têñ xwendin ew perêñ romanê, yên dema qeremanê wî bi zemetî derbazî Rûsyayê dibe, dikeve li nav kûrma şerkarya şorişvanyê û şerê bajarvanyê. Vira usa jî ew derheqa rasthatina xwe tev hîmdarekî dewleta Sovyêtê yê civakî i ewlin, serokekî şerê bajarvanyê, yê evseneyî S. M. Kîrov da dinivîse. (Ercbê Şemo usan jî rastî hîmdarê dewleta Sovyêtê Vladîmir Îlyîç LÊNÎN hatye û tev axivye).

Ji pey altindarya şorişê ra qehremanê romanê vedigere Ermenistanê, vira jî li nav kurdan da dest bi xebata siyasi, civakî, çandî dike.

Di romanokê da nivîskar gelekî delal jîyana kurda ya koçeryê, deba wan, erf – edetêñ wan dide kivşê. Gelek cî daye pismamti û hogirtya pale û gundyen bindeste gelên cînar.

Romanoka wî ya wan salaye din: “Kurdên Elegezê “peyhâtya romana jorgotî ye. Ew jî çîroka jîyana wî ye ji pey demezirandina qeydê Sovyêtê ra. Qehremanê romanokê

Ereb bi xwe ye, vira da bi navê Misto derdikeve li ber xwendevana. Vê derê êdî Misto xebata perwerdeyî, kultûrî, çandî li nav gundyên feqîr, belengaz da dike, derdikeve dijî wa gotî “dijminê sinifê” kurdên zengîn, kûlak, axa, beg û desthiletdarên berê, edetên kevne zîyandar rexne dike, xebata perwerdeyî, çandî, civakî dike.

Herd efrandin jî bi kurmancîya delal, xwoş û dewlemed hatine nivîsar. Zarav yê serhedê ye, bi cûrê şirovekirina gelêrî hatye pêkanîn, usan çawa çîrokbêjîn kurd çirokan dibêjin.

Gerekê usa jî bê gotin, ku peyvîn biyanî, hevokêna axaftina herêmî di nav nivîsara da pirin. Kîjan, bi texmîna min ewqas ne kêmasyê nivîskarin, çiqas dereca nivîsandina zimanê kurdî ya wê demê va girêdaye. Wura nivîsara kurdî nû gavên ewlin davit. Tercûbe tune bun. Ew para kurda bingeha xwe, welatê xwe qetyayî bû. Disa gerekê bi erêni bê nirxandin, ku nivîskar ziman û zargotina gelêrî rind zanibye, ku karibye alyê zimên da serkeve.

Qehremanên van esrandinan, navên mirovan, bûyar, cî û wer bawarkî hîmlî yê dîrokî û rastî ne. Nivîskar nakokyên navbera bi alîkî axa, bega, dewletya, alyê din gundyên kesîb da kirye hîm û li wê çarçovê da nivîsarên xwe ava kirye. Li cem wî axa, beg, serekeşir, dîdarêñ êlan tev zulmkar, talançî, neheq, merivkuj û bê vîjdanin, gundi, pale, şivan, gavan, kesîb û belengaz jî evdîne pozitîvin. Helbet li nav axa – bega da merivê neheqe xirab hebûne, lê derheqa teva da xirab nivîsar qelsîke van nivîsara ne. Ewî rind zanibû ku di nav navên ŞIVANÊ KURD da bi xiravî, nêgatîv daye xanê navne usan hene ku êlên xwe ji qirê xilaz kirine, anîne gîhandine Ermenistanê. Wan jî mîna her kesî, her kurdekî êla xwe zemetî, belengazî kişandine. Heta niha jî navê

hineka li nav êzîyêñ Ermenistanê da bûne efsenc, kilam avîtine ser wan. Bi keder gerekê bê nivîsar ku wan salên Sovyêtê, yêñ ewlin da komûnîstan û komssomolan, cîyê vala, bê sebeb gelek neheqî wan evdêñ bi rûmet kirin.

Dema meriv bûyarêñ dîrokî û halê wê heremê yê siyasi, civakî tîne ber çevan dibîne nivîskar yekalî nêzîkî qewmandina büyc, gelek tiştêñ girîng “bîra” kirye. Şerê navbera Dewleta Rûs û Osmanyê da / çîqas jî giran be/tenê şerê navhera du împératotya, yê dagerkiryê nîne. Ew bûyara mirin – jîyanê ye çawa seva binelyê wê heremê yê xiristyan, usan jî seva kurdan, xasma kuedên êzdi. Alyê hukumata Rûsyayê ya nû : Sovyêtê da betalkirina şér, çûyîna leşkerê Rûsyayê ji heremê, gelê wê deverê davê devê zulma Osmanyê û alayêñ hemîdyê. Dowa peymana Sêvîrê, ku Rûsyâ gotî xweyî lê derketa bêxayî ma. Rûyê Şoreşa Oktyabire da komûnîsta, hukumata Lênîn dewa kurda pêşkêşî Tirkyayê kir. Helbet, dem û bûyarêñ wî wedeyî cuda bûn û ji qewata nivîskarê me der bû bigîhîsta kûraya wan pirsan.

Ji rûyê sirgûnyê da navbereke mezin dikeve nava jîyana wî ya efrandaryê. Wê sirgûnya Erebê Şemo rastî jî li nav pêşdaçûyîna edebycta kurdê sovyêtê da valayık çê kir, xazma di werê nivîsara vekirî da. Ji romana “Şivanê Kurd” tê zanîn, ku wê demê li meydana edebyeta kurdî da nivîskarekî xweyê qlema adan û bi şuret sekinî büyc.

Ew bi edebyet û zimanê rûsa hatibû perwerdekirin, zargotin û zimanê dê rind zanibû, ziman, deb, erf – edet, pirsgirêkên gelên cînar ra ji nas bû, ji nav evdêñ here bindest derketibû, telî – tengyê jîyanê, nakokyên navbera sinifan da, zulma hukumdarان, rev û beza gelên wê navçê bi çavêñ xwe dîtibû, tevî şerê Rûs – Tirkan û şerkarya Şoreşa Oktyabire bûbû, cîyê xwe di nav jîyana hukumdarya

nû da girtibû, bi gîlîkî hazir bû seva nivîsara karêن edebyetê yê mezine, bingehîn. Eger ew ji nav civaka wî nehata dûrxistin û mecalên efrandinê bêpar nema, wê berhemêن pir giranbiha gelê xwe ra bihîsta.

Bawarkî du dehsal şûnda ew ji wan dijeryên sirgûnyê yê zulm xilaz dibc û dîsa vedigere jîyana cfrandaryê. 22 – 23 sal ji pey “Şivanê Kurd” ra, sala 1958 – an li Yêrêvanê romanâ xwe ya “Berbang” lê salek şûnda “Jîyana Bextewar” têن weşîndin.

Di nav romanê Erebê Şemo da ya here berfîrc û barkêş romanâ JÎYANA BEXTEWAR e. Naveroka romanê nivîskar ji jîyana êleke kurdan ya Sîpka hildaye. Büyarêن dîrokî, yên devedevî sed salan xwe ra kirye hîm û li ser wê fonê wan guhestinêن bingehîn nîşan dide yêن jîyana Kurdêن wê heremê da qewimî bûn. Qehremanê romanê yê herî serekê Emerîke û bûyarêن serekê li dora qedera malbeta wî û kurdêن wê heremê pêk têن, xazma êla Sîpkan. Nîvê sedsala nonzdan nakokiyêن olî, civakî dikevin navbera evdêن vê êlê. Zulm û zora dewleta Osmanyê jî zêde dibe. Malbeta Emerîkê û şîpkîyêن êzdî tev, mecbûr, cî û werêن kal bavêن xwe, milk û malê xwe dihêlin, direvin qeza Qersê, kîjan wê demê bin bandora dewleta Rûs da bû. Koçberya berbi werekî nû xwe ra dijweryêن nû tinin. Raste hukumdarya rûsa ewqas ncheq, bêvîjdan û zulm nîbûn çiqas ya osmanyan, li cem wan hinek qewl – qanûnêن civakî hebûn, ku evdêن sade jî zulma ncheqa xweyî dikin, lê vira jî rasî tunc bû, vira jî evdêن kesîb, belengaz, xebatçî dihatin pelçiqandin. Vira jî hukumdarî alyê axa, beg û zengînan bû. Vira jî nakokyêن li nav û hundur civakan dijî evdêن seqîr û xebatçî dihatin kêranîn.

Dest bi şerê cihanê yê yekemîn dibe. Dinya dîsa li hev

dikeve. Ew herem dibe meydana bûyarên neqenc. Jîyana xelkê ser û binî hev dibe. Li nav Rûsa û Tirkâ da dest bi şér dibe. Dengê Şorişê ji rûsyayê tê digihîje wura. Dîsa xclq cîşihitî dibin. Wê heremê da hukumdarî ji qewatekê derbazî qewateke din dibe. Tek ji pey demezirandina qeydê Sovyêtê ra rastî û aramê tê heremê.

Nivîskar bi zarekî kurmanciyî xwes û hostatî weneýen jîyana kurdên wê heremê yê wê demê raxistîye li ber çavê xwendevanan.

Ji pey ji heremê çûyîna leşkerên rûs ra bêqanûnî, talançitî, cerdevanî, rev bez xelkê dikin devê qetil û zulmê. Emerîk û kurdên êzdî yê qeza Qersê mechbûr vê carê jî çemê Erpeçayê derbaz dibin, koçberî li nav kurdên pala çîyayê Elegezê dibin. Lê ev koçberî ji koçberya derbazbûyî zulmtire, ewa revê ji xezeva roma reş, ji kokbirkirnê, ji kuştinê. Dema revê koka evdan tê. Dê ewledê xwe davêjê. Xelayî, nexweşî, tîrs, xof mîna şûre dudev evda dibirin. Dutîrefî, nakokî û bêtifaqî li nav êl û eşîrên kurdan da betir xurt dibin. Yê mîna Teyo beg, dewleta Tirk ra dibin alikar û zîyana mezin didin xelkên wê deverê. Dewleta ermenya ya nû avabûyî bêtaqete xelkê ji hicümkirinêñ Tirkân biparêze. Leşkerên tirkan, tevî hemîdyan bi xûn û zulm têñ digihîjne gundêñ kurdan, yêñ navça Axbaranê, pala çîyayê Elegezê. Koka xelkên van gunda tê. Gelek zilaman hêşîrigrin û berê wan didine kûraya Tirkîc. Emerîkê jî tev wan hêşîra dibin. Ew rêva, bi cûrekî direve. Ji pey gelek dijweryan û zemetyan ra tê digihîje mala xwe. Vira jî qewlê jîyanê tunene. Mecbûr jîna xwe gund da dihêle, destê Sehîdê xwe digire û diçe bajarê Tilbîsê, xebatê.

Xelq bi hisret demêñ hukumdarya rûsa û leşkerên rûse rem, yêñ ji weletê wan çûne ji bir tînin.

Demezirandina qeydê sovyêtê edlayê û aramyê tînine Komarên Kovkasê: Ermenistanê, Gürçistanê, Azeyrbêcanê. Kurdên wur ra jî rojên xweş têñ. Çawa teva ra usa jî lawê Emerîkê Sehîd ra jî mecalên xwendinê, pêşdaçûyînê vedibin. Ew berê mekteba bajarê Tilbisê da dixwîne, kîjan seva zarokên kurd vebûbû, paşê dişinîne Lénîngiradê (Petrograd) xwendina bilind. Ji pey xwendinê ra Sehîd vedîgere gundê Sengerê cem malbeta xwe. Kolxoza gund da dixebite, mekebê da dersdaryê dike, derecê serketin û pêşdaçûyînê ra bilid dibe, digihîje dereca şuxulvanya serokatya nehyê. Tê bijartin çawa Şêkrêtarê ewlin yê Partya Komûnistê nehya Axbaranê.

Dîsa Sehîd dişinîne xwendinê. Vê carê diçe paytextê welêt: Moskivayê. Hema wê demê jî herba Cihanê ya duyemîn dest pê dibe. Almanya hîtlîryê davêje li ser welatê Sovyêtê. Sehîd dide sîlihê û diçê pêsenya şêr. Bi mîrxwesi şer dike, dibe serlekerekî şereza, digihîje ritma leşkeryê ya bilind û ji bo mîrxwesya wî navê MÊRXWESÊ YEKİTYA SOVYËTÊ didinê. Ji serokatya leşkeryê ya here bilind Emerîkê û Rihana dê ra seva mîrxwesya lawê wan, nema razîbûn û pîrozbahyê tê. Bi wê nemê jî roman dewî dibe.

Helbet ev bûyarên ku romanê da hatine dayîn ji alyê nîvîskar da çekirî yanê berhemên fikirandina wî nînin, ew tev ji emrê kurdê Sovyêtê hatine hildan. Ew bûyar pêk hatine. Qehremanê usa hebûne. Nîvîskar bi xwe jî (Misto) ne tenê şchde, lê şerkarekî aktiv yê wan bûyaran bûye.

Bûyarên romanê ji Entaba Sîpka dest pê dibin, heta diçin digihîjne qeza Qersê, navça Elegezê, bajarên Tilbisê, Lénîngiradê, Moskivayê, herba Almanya - Rûsyayê. Be'sa bi dehan qehremanên nêgativ û pozitîv, bûyarên biçûk û mezin têñ kirin. Gelek erf – edet, eyd, şîn, şayî bi hûrgilî hatine

nivîsar. Mesele dema derheqa mirina Xudêda da dînivîse usan bi hostatî derbâzKirna şîna wî û hildana cinyaz siro dike, tê bêjî dîdemê şînê li cem kurdên Ezdî tîne li ber çavê xwendevanan. Cawa ser cinyaz distirêن, kotelê çawa girê didin, jin gulyê xwe dibirin didin ser cinyaz, hewarî çawa têن û wan ci cûreyî pêşnyaz dikin, xêrê çawa didin. Usa jî qelen birîn, dewat, bindarûka cîwanan, eyda beranberdanê, berodan, eyda da li nav gund gera Kosegeldyan û gelek tiştêن din. Evan tiştêن êtnogirafî – debê yên usanin, ku niha gelek hatine bîrkirin.

Zimanê romanê paqij e, zelal û dewlemend e, akila gilîkirina wî rast wek ya çîrbêja ne. Dema xwendina romanê meriy nikare ji şirovekirina bûyarêن hewaskar biqete. Tebyet di bin qelema wî da tê bêjî hişyar dibe, reng û rewşen bedew e nedîti xwe dike û xwendevan heyr dihêle. Dîdemêن cîwane delal, yên xezaya çîya û banyê Serhedê romanê da pirin, Dema dixwinî her demsala wî welaşî bi bedewî, xêr - bêr û dijweryêن xwe têن ber çavan.

Bi tomerî ev roman bi bûyaran dagirtî û kûre, jîyana gelê kurd ya wê demeye dîrokî, pir dijwer û bi guhestinêن bingehîn tije destnişan dike, li ser wan destanîn û pêşdaçûyîna disekîne, kîjan hukumdarya bolşevîka dane wê para kurdan.

Nivîskar bi tebyêن rîéalizma sosîyalîstyê nêzîkî bûyaran û qehremanêن xwe dibc, nivîsara xwe da bi temamî sîyasî ye, rind tê xanê ku ew komûnîste. Dicedîne nîşan bide, ku qehremanê wî yê pozitîv tim serketî û pozitîv bin. Ewan xeyset va bêqisûrin, remin, xebatçî û paqijin, zanene. Ji bo heqyê, pêşdaçûyînê, edlayê, dostanya gelên bindest şerkaryê dikin.. Bî fîkira wî serketin û pêşketina civakê tenê bi riya sîasya komûnîstyê kare miyaserbe. Ew bawarc, ku tek bi

bawaryêن markisîzm lênnîzmê, rîya sosyalizmê gelên wek kurda, yên bindest, karin azabin.

Qelsayı û kêmânyêن Romanê ji hene:

- romanê, tê bêjî cêrga bûyarêن li pey hev rêzkirîne. Rêyeke alyê nivîskar da kivşkirî, yan pilankirî, kîjanê ra gotî bûyar pêşda herin û xwendevana pey xwe bivin, nayê xane.
- carna bûyarêن ne pêwîst tên dikevin li nav romanê û xwendina wê giran û zemet dîkin. Eger bûyarêن usan û wan va girêdayî hinek par – perçe ji romanê bêñ derketin, bi texmîna min nivîsar tu ziyanê navîne.
- di nav zimanê romanê yê delal da, carna hevokêñ şâşc, ne kurmancî têñ xanê, tê bêjî ji zimanê ermenî yan rûsî xirav wergerandinê.

Romana Erebê Şemo JÎYANA BEXTEWAR bi zimanê rûsî û ermenî hatye wergerandin. ( Rûsî: werger M. Dêmîdova û M. Çêçanovski, Moskivayê da, sala 1965 – a hatyc weşandin, bi zimanê ermenî: werger V. Girigoryan, Yêrêvanê da bi du cilda hatye çapkîrin. Cilda ewlin sala 1961 – ê, ya duda 1964 – a ).

Romana HOPO berdewama romana JÎYANA BEXTEWAR e. Naveroka wê jîyana gundê kurda, ya kolozvanî ye. Emerîk û gundyêñ din kolxoze da bi hevra, kolîktîvî dixebeitin, Sihîd ji serokatya nehyê pêşda dikşînin xebata partyayêye bilind li Yêrêvanê. Ciwanêñ gundêñ kurdan êdî diçine xwendina bilind, diqedînin, dibin pêşekzan, vedigerin karê kolxoza xwe. Emerîk kal dimire.

Nivîskar dixweze li dor jîyan û evîndarya Zînê û Hesen, yên ku xwendin xilaz kirine hatine wan kolxozen gundêñ kurda da çawa pêşekzanê malhebûna gundityê dixebeitin, konfilikta ji bo demezirandiba romanê çêke, lê nayê standin.

Bûyarê romanê kûr nînin. Gelekî sade û serranin, sarin. Tê xanê ku nivîskar gelekî ji civakê, pirsgirêkan, jiyanê dûr ketye. Parên romanê, şirokirina bûyaran gotarêن rojnema RYA TEZE da weşendî yên ne ewqas serketî tînîne bîra mirov. Kîjana da tenê pesin û destanîn dihate nîşandayîn. Lê çi bi rastî gund da diqewimî nedihate gotin.

Sala 1965 – an li Yêrêvanê romana wî ya bi sernivîsa DIMDIM hate weşandin. Weşandina vê romanê bûyareke berbiçev bû di nav edebyeta kurdêñ sovyêtê da. Ew yek ji wan nivîsaren bedewetyêye ya dîrokîye ewlin e, ne ku tenê li nav edebyeta kurdê sovyêtê lê ya temamya kurdan da.

Ji bo romanê çawa hîm destan, beyt-serhatya zargotina gelê kurd, ya bi nav û deng KELA DIMDIM hatye hildan. Ev beyt - serhatya di nav zargotina kurdêñ Sovyêtê da pir hizkirîye, oda da, li nav civaka da tim dihate gotin. Çîrokbejan him bi sitiran, him bi cûrê sirovekirinê digotin.

Gelek varyantên wê alyê kurdzanan va ji nav gel hatine nivîsandin û çapkîrin. Hinek helbestvanêñ kurdê Sovyêtê, wa gotî, ew veçêkirine û xwe ra kirine poyêm - destan. Lê gerekê bi heqî bê gotin qîmetê wan nivîsarêñ ku ser naveroka beyt - şerhatyêñ gelêri (ne ku tenê DIMDIM usan jî yên din) ji alyê nivîskarêñ kurdêñ Sovyêtê da hatne nivîsar (veçêkirin) pir nimz e. Bawarkî ji her alyê efrandaryê va ew ji yê gelêri dadixin.

Ev destana usan ji alyê helbestvanê eyan Fêrikê Üsiv va çawa radyokompozîsyâ hatye amadekirin û bi radioya Yêrêvanê salêñ dirêj hatye dayîn. ( Ez nizanim ew radyo kompozîsyâ berî weşena romana Erebê Şemo pêk hatye yan pey ra ). Ew radyo kompozîsyâ efradineke giranbiha ya serketî ye.

Gerekê bi rastî bê gotin romana Erebê Şemo ji wan

cuda dibe. Mezmezka destana gelêrî romanê da hatye xweyîkirin. Bûyar, nexs, cwaz tec dora wê mezmezkê hûnandye, xemleke kurmancî ya bi dilê xwe lê kirye û heykeleki edebîyî nemir gelê xwe ra efrandîye.

Serketin ûbihêzbûna xweyê kela Dimdim, Xanê Kurda, Xanoyê Çengzêrin ji Şahê İranê xweş nayê. Kela Dimdim bûye dergekî pola, ciyê tifaq û yekîtya kurdan. Berê ew çen serleskerên xwe yên cêrbandî, bu leşkerêb giran dişine ser kela Xanê Çengzêrin, kurd leşkerên dagerkitêne neheq dipelçiqînin, serlesker serşikestî, sekesiz, paşda direvin cem xweyê xwe, tek bi xweyîntyâ Mehmûdê Merekânî kela Dimdim dikeve.

Romanniyîs ew çîrokên xiyalî, fantastîk, ku destana gelêrî da hene derheqa dîtina zéra, çekirina kelê, dor navê peyva “çengzêrin” û bûyarên din, yên nayêne biharkirin daye alîkî, ji romanê derxistye, naverokeke hewaskare rîalistî efrandîye.

Romanê da kela Dimdime bi çarsû, bazar, dukan, qawexane, hostexane, kûçe û meydanênen xwe mîna dîdemekî zêndî tênc li ber çavê xwemdevana. Nivîskar ew usan nitirandîne ku tê bêjî kela Dimdim bajarcî haseyî, bedewî biçûke. Dorê gund û eşîrê kurdan e. Xelqê xebathiz kar û barê xwe va mijûlin. Sura meznayî û serketina Xanê Çengzêrin ewe, ku ew alye heqyê û qencyê ye. Xwestina wî edlayî û aramya welatê wê ye. Yekîti û tifaqê xelqê kurd yê wê heremê kirine mîna kulmeke pola. Kurd xêncî biratyê, wekehevyê jîyana e'dil tu tiştî ji kesî naxwezin û nahêlin tu qewat azaya wan ji wan bistîne. Lê.

Alîkî kela Dimdima azadîhiz e alyê din Tehrana rengin da Şahê Ecemî devxwînî bi qetil û qan e. Dewata Şâhe. Xwedê zane dewata wî ya çenda ne. Bûk keçekte çardesalî ye. Dewatê da jî Şah û neyarênen kurda derheqa wêrankirna

kela DIMDIM da difikirin. Sênbûn û azaya wî warê kurda tirs û kîn kirine dilê Tehranê. Bi rîya cesûsa, delk û fena, zorê, kuştinê, hevkarya tev Sultanê Romê, her mecal tê cêribandin ku kurda li nav xûnê da bipelçiqînin. Nivîskar bi nimûnan xwendevana dide bawaekirin, ku eger tifaq nav kurda da hebe, kurd pişta hev bigrin, xweyî li hev derkevin kes wana nikare.

Romanê da xêncî Xanoyê Çengzêrîn xwendevan rastî gelek qehremanên hîzkirî tê yê mîna Hemze Çawûş, Xaçoyê Ermenî ku topa çê dike, Koçoyê Kal, Mîr Sadiq, Şêx Zade, Cewzo, Sêvdinê lawê Xano, Zadîna jîna Posto, Dîlber û gelekên din. Usa jî li ber xwendevanan tê bêjî derê diwana Şahê Ecem : Şab Abas vedibe, wur tirs – xofê, qelpîtyê, kînê, neyartya dizîva ne, ya dijî hev.

Eger nivîskar ra mecal hebûna biçûya cîyê kelefê kela Dimdimê, ew cîyê bûyarên dirokî qewimî bi çevê xwe bidîta, dokûmêntên dirokî biketana dêst, lêkolîna pêwîst bikira, ez bawarim romanê bi cûrekî dinbihata nivîsar û wê qîmetê romanê bilindtir bibya. Lê wê demê kê cw bext dabû nivîskarê kurd, ku karibe ji hidûdên Sovêtê yê pola derkeve, bigîhîje wan warê Kurdistanê.

Romana DIMDIM bi zimanê rûsî, ermenî û gelck zmanê din hatye wergerandin û weşandin..

Erebê Şemo xêncî van roman û nivîsaran usa jî seva zarokan çîrok nivîsîne, bi miqale, gotaran, bîrnînan rojneme û kovarên koînarên Ermenistanê û Rûsyayê da pêşda hatye. Bi sêñaryoya wî filmekê dokûmêntar bi navê KURDÊN ERMEENISTANÊ hatye kişandin.

Çiqas jî film pesin û piropaganda jîyana sovyêtê ye, dîsa ew ji wan degme dokûmêntan e, ji kîderê ewled karin gelek rewşembirêne kurde wê demê bi zêndî bîvînin.

Emekê Erebê Şemo pir e di werê pêşxistina kultûra kurdên Sovyêtê da. Ew evdeki xweyê zanebûnên kûr û kultûra bilind bû, pêşewitekî gelê xwe bû. Bi zaroka ra zarok bû, mezinara mezin. Tim di civat û êvaryên nivîskar û xwendvanên kurdên Ermenîstanê da hazir bû, bi şêwrên qenc alîkarî dida efradarên gênc.

Derê wî miqîm li ber teva vekirî bû. Ji gundan, bajaran kurdên karker, gundi, xwendevan dihatin cem. Alî teva dikir.

Çawa li Ermenîstanê usan jî temamya welatê Sovyêtê da qedirikî mezin didane wî. Navê xebatçiyê kulturayî î emekdar yê Ermenistana Sovyêtê dabûnê. Wê demê navê wa didane rewşembirên Ermenistanê yên here bi nav û deng, xweyê emekê mezin. Ji bo kar û berhemên giranbiha ew ji alyê dewleta Sovyêtê da hêjayî du ordênên welêti herî bilind: Dostanya Gelan û Ala Sor bûye.

Ji pey mirina wî ra Hukumata Ermenistanê xelata lîteratûri ya li ser navê wî kivş kirin. Ew xelat didane wan nivîskaran yên berhemên kurdîye giranbiha efieandibûn û weşandibûn. Xelata pêşin nivîskar Wezîrê Eşo sitend.

\* \* \*

Havîna sala 1978 an bû. Di scrake bajarê Yêrêvanê, ya mezin û dora wê xelk kimkimî bûn. Bawarkî temamya serkarên Ermenistanê hatibûn wur. Nivîskarên Ermenistanê tev û seroktya yekîtya nivîskarên komarê li wur bûn. Ji gund û bajarê Ermenistanê, Gurcistanê Adîrbêcanê kurd hatibûn. Ji dest xelkê /hewaryan/ cî tunc bû. Cara ewlin ewqas xelkê kurd li cîkî top dibûn. Jorê tabûta wî di nav kulîlka da pêçayî bû. Teyê bigotta nivîskar tabûtê da razaye. Jinê kurdan bi kincêni miletyê li rex cinyaz

rûniştibûn , şîn dikirin, dinivandin.

Di wê rojê jî li pantiona Goristana Yêrêvanê, ya Sovêtaşenê da, kîderê merivên komarê yên bi nav û deng defîn dikirin, me EREBÊ ŞEMO tesmîlî axê kir. Nivîskarê kurdî mezin wusa hate dinê û çû.

**HECÎYÊ CINDÎ**  
**1908 – 1990**



Wextê mirov li pala çiyakî dijî, li nav qûç û newal, gelî, mîrg, zozanê wî digere (şlahî xortanîyê da), tê bêjî bilindayî, reng û rewşê wî ewqas navîne. Her tişt jê ra sade û tebyefî tê xuyakirin. Bi bêxemî li ber xisûsî, nexş û nîgara ra derbaz dibe, gelek tiştî jî navîne.

Lê gava ji çiyayê xwe dûr dikeve, di nava deşt û quçen xerîb da li pey xwe dinhêre, nû bilindaya çiyê, bedewiya mîrg-çîman, gelî-gebozê wî, tem û zelaliyê avêk kaniyê sar, xweşî û başyên zozanê xwe texmîn dike. Bîra wan dike û tê derdixe, ku cw jî pirtîk ji wî axê ye.

Ez vî warê xerîb rûniştîme, pey xwe dinhêrim û nû texmîn dikim, ku ez di nava malbatek rewşenbîraye çawan da mezin bûme: Kê bûne mamostayê min? Min pismamî, hogirî û hevaltî bi kê ra kirye?

Ez bi navê wan xwe kubar û serbilind dibînim: Erebê ŞEMO, Hecîyê CINDÎ, Emînê EVDAL, Qanatê KURDO, Şikoyê HESEN, Fêrikê ÜSIV, Qaçaxê MIRAD, Nado MAXMÛDOV, Casimê CELÎL, Mîkayêlê REŞÎT, Eliyê EBDILREHMAN, Sehîdê İBO, Üsivê BEKO.

Nav pir in, bîranîn kûr, dûr û şîrin. Min tek navê hinek remetîya da. Her yek bilindayîk, maqûlek, şîrhelal û karkirê kultûra gelê xwe.

Eger Kurdê Ermenîstanê, Gurcistanê, rêspûblîkayê Asya Navîn û parek ji yê Azérbaycanê nehelyane, mane, ziman, çand, deba kal-bava bîr nekkirine, di wî warî da emekê van rewşenbîren me pir e.

Kar û barên Kurdê Ermenîstanê yê kultûri-çandî, axastinê Radyoya Yêrevanê yê bi zimanê kurdî, ji gelê welêt ra jî bûn bîr û bawerî. Wan jî ruhê kurdîtîyê demckê ji wur distandin.

Ez ked û karê rewşenbîren me yê din, nimz nakim. Lê heqî ew e, ku ciyê Hecîyê Cindî di nav gişka da cuda bû. Ew, te yê

bigota malxê wê malbata rengîn bû, xemxur û rîvabirê gişka.

Ew havîna timê dihate gundêne meye pala çiyayê Elegezê, ji devê kal-pîra, çîrokbehêja, zana zargotin dinivîsin. Dema ew dihat, eaw di nav gel da bela dibû, digotin Heciyê Cindî hatîye. Em zarok, tomî li ser hev dibûn û me ji dûr va lê mîze dikir. ELFEBA ku em dibistanê da pê hîn dibûn, wî nivîsi bû.

Gel pir hiş lê dikir, qedirê wî zanibûn. Gişka bi serbilindî û kubârî cem gelê cînar navê wî didan.

Sala 1961-ê, wexta ez li bajarê Yêrêvanê ketime xwendina bilind, rojekê payîzê, min devterâ xwe ya helbesta hilda, çûme Akadêmiya Ermenistanê ya Zanyaryê, cem Heciyê Cindî.

Ew rasthatin qet ji bîra min naçe. Naha dilê min davêje, şerm dikim, gavekê pêş da diçim, gaveke paş da. Ha dixwazim paş da vejerim, çûyîna xwe ji rojekê din ra bîhêlim, ha jî difikirim: "Vê rojê çêtir tûnc."

Xulese, ha min culet da xwe, ha poşman bûm, gîhîştim ber derê oda wî. Wî çaxî ew serokê Sêksîya Nivîskarê Kurda bû rex Yekîtiya Nivîskarênen Ermenistanê û Beşa Rohilatzañiyê ya Akadêmiya Ermenistanê da serokê koma Kurdzaniyê bû.

Ez li ber derê oda wî sekinîme, şerm dikim, dêrî bikutim, herme hundur. Xulese, min derî xist. Ji hundir deng hat: "Mitêk!" (Yanê warne hundur). Min derî vekir. Di odê da ew tenê bû. Bi besereke xweş li min nêhêrî.

- Tu Kurd î?

Min serê xwe hejand.

- De pêş da warê, şerm neke! Ware li ser vî kursî rûnê.

Ez li ser kursiyê ku wî nişan dabû, rûniştîm. Min xwe da naskirin.

- Erê, erê tu ew xortê Belî yî ji Qundexsazê. Ez te, seva xwendina bilind pîroz dikim. Qundexsaz, -ewî navê gundê me wekiland, demeke kete nava mitala,- gundê we da 30 sal berê

min dersdarî kirye. Kurmacîya gundê we xweş e. Wura min him dersê zimanê kurmancî dida zarokê gund, him ji ji wan hînî kurmancî dibûm. Wextekî dijwar bû. Lê heta naha çîma nayeyî xanê, pismam! Xwendekarê me gişk têñ-diçin. Ji min ra gotin yekî Qundexsazê jî Înstîtûtê hatiye hildan. Bela dibûrîne, ha!

Min tê derxist, wekî cw idî derheqa min da zanc. Guhê ronakbîrêñ me li ser her qewimandinekê bû, ku jîyana gel da dibû. Wana qîmetekî mezin didan xwendin û pêşdaçuyînê. Hersal çi ji destê wan dahat dikirin, wekî ji cîwanê Kurd gelek zanîngchê Ermenîstanê da qebûlbin. Diçûne cem dersbêj, profêstor û serokên zanîngeha, navçitî dikirin; ji wan hîvî dikirin, dostaniya xwe wan ra didane kêranînê. Pey êntîyamê qebûlbûnê, idî Yêrêvanê da civaka Kurda teva zanibûn çend xort û keç ketine xwendina bilind.

Dest pê kir hinck xweşî û laqîrdî derheqa qebîla Bela û gundê me da gilî kir. Em tev kêfxweş bûn. Ji berbirbûna wî, min jî bîra kir, ku eva Hecîyê Cindi ye, nivîskar û zanyarekî mezin e. Pê ra ketime xeberdanê.

-Usan e tu nebîyê scrokê êla Hesenîya Ûsiv Begê yî. Tu zanî xwendiyê ewil li navâ Kurdêñ meye Ezdiyêñ Ermenistanê da kalkê te bûye. Paşê bû endamê parlamenta dewleta Ermenistanê. Bavê wî: Hesen Axa scrokê Ezdiyêñ Ûrisêtê bû. Cara ewil ewî lawê xwe şande xwendinê û wî edetê bêkêr, ku digotin: "Xwendin ji Ezdiyan ra heram e" ji navâ gel rakir. Bi navçitiya wî, sala 1900-î dewleta Ûris li sê gundêñ me, Ezdiyêñ Kurd da (Zor, Qundexsaz, Bacelû) mektebêñ zimanê ûrisi vekirin û hukumî li ser xelqê kir, ku zarokê xwe bişîninne mektebê.

Rast bêjim min ew melûmetî nû dibihîstîn. Ez seva gilikî din çûbûm, lê ewî sercema axaftinê usa guhestibû, ku min nizanbû çawa mena hatina xwe jê ra bigota. Waxt jî derbaz dibû. Ewî jî derheqa gundê me, mala kalkê min da digot, ha digot. "Heyran

eva evqas tişt ji ku zane, -cz difikirîm û min qirar kir mena hatina xwe ji rojeke din ra bihêlim, xatirê xwe jê bixwazim, herim. Min ew pir mijûl kir, şerm e."

Ew bû ezê rabûma, nişkêva navbirî da axaftina xwe û pirsî:

- Em ketine xeberdanê, min nepirsî xwendina te çawan e?  
Çawa cî bûyî? Em ci dikarin alî te bikin?

Min razîbûna xwe got û devterâ helbestên xwe nîşan dayê.

- Ha, şîera jî dînîvîsî? -devter ji destê min girt. Demekê lê nîhêrî û got,- hela evê bixwîne.

Min xwend.

- Ya peyê ra jî.

Min 6-7 helbestê biçûk jê ra xwendin.

- Na, nivîsarê te da pirîsk henc, -got, - he'vtîya tê, li mala nivîskarênen Ermînistanê êvarîya me heyc. Tu jî ware, him tê nivîskaran nas bikî, him jî li wir şîerckê-duda bixwîne. Çika şayîrê me ci dibêjin. Usa ez ketime nava refê wan maqûla.

Ji wê rojê heta sala 1990-î, wextê çû ser dilovaniya xwe, 30 salî, bawerkî hevtê tunebû ez rastî wî maqûlî nehatama. Bîranînê pir xweş bi wî va girêdayî ne. Ne ku ez tenê, guhê wî li ser rewşenbirê me ye wê demê teva bû. Bi destanînê me va kêfxweş dibû, tengasiya da digîhîste me.

Di mala xwe da jî, alîyê xweyîkirina ziman, erf-edet, rabûn-rûnişandinênen miletiyê da nimûnc bû. Wextê diçûyî mala wî, teyê bigota ketî maleke eşîrê ya qedîmî. Keda wî pir e. Ez pir tiştî jê hîn bûm. Xweyê merîfeta bilind bû.

\* \* \*

Hecîyê Cindî Cewarî, sala 1908-a li Qeza Qersê, gundê Emençayîrê ji dayka xwe bûye. Wê demê Qers di bin bandora dewleta Rûs da bû.

Sala 1914-a dest bi şerê Cihanê yê Ewlîn dibe. Cîhan li hev dikeve. Dewleta Osmanîyê berê devê şûrê xwe dide gelê Êrmenî.

Kurdê Êzdî ra jî rojên reş têن. Rûsyayê da jî dest bi Şorcşa Oktobrê dibe. Leşker û qewatêن Rûsa dikşin, diçin. Ew war dimîne devê "Roma reş" da. Leşkerê Osmanî û Alayên Hemîdiyê mîna peranya gura dadikutine heremê. Dewleta Tirk Kurdêñ musulman û Êzdî yêñ wê heremê jî radikin dijî hev. Êzîdîyê Wanê, Surmeliyê. Qersê, gund, mal û milkê xwe dihêlin, ber bi Ermenistanê direvin. Mala bavê Hecîyê Cindî jî direvine Ermenistanê, gundêñ navça Elegezê. Ji xelayê, nêxweşîya, zulm û qana Tirka qira evda tê. Ji şes neferê mala bavê Hecî, tek ew û birayê xwe dimînin. Ew jî sala 1919-a dikevin sêwîxana Amêrikayê, ya li bajarê Alêksandirapolê (Gumri).

Di sêwîxanê da gelek telî-tengîya divîne, heta zimanê dîya xwe jî unda dike. Nîvískar, derheqa wan sala û rasthatIna xwe bi ulmdarê mezIn Qanatê Kurdo, ku wê demê ew jî sêwîkî mîna wî bû, usa dinivîse:

Sala 1926-a ez jî paytextê Gurcistanê, ji Tiflîsê vedigeriyame Ermenistanê; êtîmxana bajarê Lînînakanê, li kîderê dimam. Apê min Têlîyê Esced, ku îdî li bajarê Tiflîsê dima, ez verêdikirim. Li îstasyonê, hema pêîberî me nişkêva dengekî wa bihîst: "Oro, roro", - hinekî ji me wêdatir yekî soltemizkir, li kincêd minc ne êd cî dinhêrî û dikir, ku bi min ra xeberde. Bextê xirab, îdî ew çend sal bûn min kurmancî ji bîr kirbû, nizanbû bi pakî xeberda. Gava, ku min dengê xwe nekir, ewî bi laqirdî çend xeberê dinê gotin, çîka çîra xwe nagirrim pê ra xeberdim. Apê min wê demê ha-hanga nêzîkî wî bû, çîqas min tê derxist gotê, wekî 'kurmancî nikare xeberde. Hêja wî zilamî halê min fem kir. Wê le'zê me bi

teherekî nasya xwe da hevdu. Ez pê hesyam, wekî navê wî Qanat e, di mekteba Apo da (Hakob Xazaryan) dixwîne û pê ra jî tê wê derê sola temiz dike, ku çend kapêka qezenc bike. Wî çaxî te digot me herdu cahila halê hevdu fem kir û wextê xatirxwestin, rêketinê, qe nizam çawa bû em rabûn çûne dest û rûyê hevdu.

Bêguman nabe, dixwînc, gelek ronakbîrên Ermeniyaye paşwextiyê ra, ku ew jî mîna wî sêwîxanê da bûn, dibe nas, hevaltiyê dike û qirar dike xwe pêşkêşî pêşdaçûyîn û çanda gelê xwe bike. Bona mîaserkirina wan merema xwe pêwîst dibîne zimanê xweyî dê carke din hînbe.

Sala 1929-30 li gundêñ Qundexsaz û Elegezê dersdariyê dike. Wextekî kin da hînî zimanê kurdî dibe. Paşwextiyê em tev şede bûn, ku zimanê wî çîqas delal û xweş bû.

Wê demê Yekityâ Sovyêtê hewl dida xwe, ku li welêt da problêmên paşdamayînê, nexwendîtiyê da gavêng girîng bavêje; wan çareser bike. Li Ermenistanê xebatêng girîng di nava Kurda da jî dahatine kirin. Li gunda teva da mekteb vebûbûn, bajarê Yêrêvanê da Têxnikûma Kurdaye dersdarhazirkirnê vebû, dest bi weşana rojnama RÎYA TEZE û axastina radyoya Yêrêvanê yên bi zimanê kurdî bûn. Gerekê bê gotin cw kar li cîyê vala pêk dahat. Kurdêñ jêhatî, xwendî pir kêm bûn. Gel halê koçeriyê û nîvkoçeriyê da bû; haj çand û kultûra xwe jî tunebûn. Vê pirsê da dostêñ Kurdan, ewladêñ gelê Ermeniya pir alîkarî dan.

Sala 1930-31- Hecîyê Cindî, di têxnikomê da dersê zimanê kurdî dide, rojnama RÎYA TEZE da serokîya beşê çandî dike, tevî kevaniya xwe, Zeyneva Îbo usa jî radyoya Yêrêvanê da xcerbêjiyê dike.

Ewladê gelî hêja tê derdixist, ku eger paşwextiyê da karibe kîrî pêşdaçûyîna çand û kultûra gelê xwe bibe, pêwîst e zanebûnên kûr. Sala 1933-a ji bo xwendina doktoriyê dikeve

Aspirantûrayê; beşa lêkolîna zargotinê dibijêre û temamya jîyana xwe pêşkêşî beravkirin, çapkîrin û lêkolînkirna wê ye zanyariyê dike.

Saya rûnermî, xebathizî û zanebûnê piralî li nava dinya Ermenistanê, ya zanyariyê da tê naskirin. Hema wê salê jî dibe endam û hîmdarekî Yekîtiya Nivîskarên wê Rêspûblîkayê. Salek pey ra li bajarê Moskvayê kongrêya Nivîskarên Sovyêtê derbaz dibe. Ew bûyareke mezin bû nava jîyana wî welaşî da. Nivîskarê dinêeyan tevî kongrê dibûn. Hecîyê Cindî jî tevî çend nivîskarên Ermenî ya bi nav û deng diçe kongrê. Li wir rastî gelek nivîskaran tê, bi geleka ra dibe nas. 30 salî zêdetir cw endamê serokatiya Yekîtiya Nivîskarên Ermenistanê bû, serokê beşa nivîskarên Kurd.

Sala 1937-a Yekîtiya Sovyêtê da dest bi rojêن giran, zulm û reprêşîya bûn. şipûka Stalinîzmê serê bi mîlyona evdêن bê sûc xwar. Neqenca ra mcydan vebû. Hebs û lagêr tije girtî bûn. Evdêن am-tam dihatine girtin, gulekirin, zar-zêça va unda dibûn. Sîbîra sar bi seda, hezar evda ra bû goristan. Kurd jî bêpar neman; hatine girtin, sîrgûnkirin, gelek bê scr-berate çûn, unda bûn, venegeryan. Gelek rewşenbirêن Kurd, yê wê demê jî ketin devê wan râprêşyan.

Destpêka sala 1937-a di rojnama KOMÛNÎST da miqalek çap bû. Sernivîsa wê bû "Cesûsa ji Yekîtiya Nivîskaran raqetînin". Li wur da derheqa Hecîyê Cindî da jî dihate gotin. Çendekî şûnda wî jî ji kar derdixin û 18-ê Adara sala 1937-a dikine hebsê.

Ew dihate gunekarkirin bona bîr û baweriyê mîletçîtiyê, bona ku Xalit Celil Zade, yê "kontrrêvolûsyonêr" di mala xwe da xweyî kiribû û xebatê cî kiribû (Xalit Celîl Zadê Kurdê musulman bû, ji zulma Tirkan revyabû Ermenistanê), boy piştgirtina Erebê Şemo yê "kontrrêvolûsyonêr", boy namê wî

tevî Celadêt Bedirxan hene (Heyf, ku ew name hema wê salê hatine şewitandin), ji boy, ku ew serokatiyê Êzdîyan dike dijî Yekîtiya Sovyêtê û şer-şiltaxên din.

Salekê di hebsê da dimîne û bi piştgirtina hinek rewşenbîrên Ermenî tê cfûkirin. Pey efûkirinê ra jî demeke dirêj kar nadînê. Bi navçîtiya nivîskarê mezin yê Rûs, Alêksandir Fadêyêv, hildidîne xebatê.

Sala 1940-î Hecîyê Cindî, dîsêrtasiya doktoryê ya ewlîn, bi têma "Ker û Kulikê Silêmanê Silîvî" xweyi dike.

Jî pey salên rîprêsyâ ra temamya ocaxên çand û kultûra kurdfî, ku di Ermenistanê da hatibûn damezirandin, têne dadan. Kar û bar nîveî dimînin. Xebatkarê wan ji hev bela dibin. Ronakbîrê hêja bêguman nabe, kar-barê xwe, bi hêvya rojêñ ron berdewan dike.

Miqala xwecye derheqa Hecîyê Cindî da prof. Şekroyê Xudo wa dinivîse: "Di vê dema giran da Hecîyê Cindî xebata xwe, ya zanyariyê û lîteratûryê va bû berbînî, taqet bona çanda me, xwe da ber giranya mezin, wekî ocaxên çanda me netemirin, bigîhîjne rojêñ fîreh".

Sala 1941-e hukumata Ermenistanê bi spartina hukumata merkeziyê qîrar kir ku Elfabeya Kurdaye Latinî biguhezin ser hîmî girafîka Kirîlî. Ew kar sipartin Hecîyê Cindî. Wextekî kin da wî ew kar pêk anî û Elfabeya nû aliyê hukumatê da hate qebûlbûn. ELIFBA nû bi tipê Kirîlî seva dibistanê gundê Kurda hazır kir û sala 1946-a da çapkîrnê. Bi vê Elîfbê, ku heta naha deh cara çap bûye, ne ku tenê zarokê Kurdê Ermenistanê, lê usa jî yê Gurcistanê, rîspûblîkayêن Asîya Navîn xwendin û hînî nivîsandina zimanê dayîkê bûn.

Nîvê salên 50-î di Ermenistanê da dîsa rojêñ xweş seva pêşdaçuyîna çand û kultûra Kurda hatin. Dîsa dest bi çapkîrina rojnama RÎYA TEZE, axaftinê Radyoya Yêrêvanêye herrojî

bûn. Têxnikûma Kurdaye dersdar hazirkirmê vebû. Hecîyê Cindî tevî karê xweyî hîmlî barê van ocaxa jî hilgirt. "Gava sala 1955-a RÎYA TEZE disa weşana xwe ji pey navbira devedevî du desala ra berdewam kir. Hecîyê Cindî tevî hogirê xwe, êtnograf û nivîskarê Kurd Emînê Evdal dersdariya me, xebatçiyê RÎYA TEZE kirin; wekî em zanebûna xwe ya zimanê kurdî kûr bikin." -katibê rojnamêyi wê demêyi cawdar prof. Şekroyê Xudo bîr tîne.

Sala 1959-a di Akadêmiya Ermenîstanêye zanistîyê da Beşa Rohilatzaniyê tê damezirandin. Li wir Hecîyê Cindî 8 sala serokatiyê Koma Kurdzaniyê dike. Akadêmiya Ermenîstanê jî ji bo emekê wî yê mezin dereca Kurdzaniyê da û zanebûnên piralî bêyî xweyîkirna disertasyayê navê Doktorê Zanyarya filologiyê didne wî. Zûtirekê navê profesoriyê jî distîne. Salê 1968-74-a di Fakültêta Rohilatzaniyê da ya Unîvîrsitêta Yêrêvanê ya dewletê demekê beşê Kurdzaniyê vebû. Profesor Hecîyê Cindî li wur lêksîya zman û edebiyeta Kurda dixwend.

Profesor Hecîyê Cindî, temamya jîyana xwe pêşkêşî folklor a gelê xwe kir. Bi hezara nimûnê wê berev kir; ji undabûnê xilaz kir, derheqa pirsgirêkên wê ye tevliheve-ne eyan da lêkolîn û îzgeriyê giranbaha jî me ra hişt. Sala 1936-a wî û Emînê Evdal FOLKLORA KURMANCA çap kirin. Eva berevoka çavkanîke zargonina Kurdaye nemirîye û çiqas diçe qîmetê wê bilindtir dibe. Eva berevoka, hela dema Komara Mahabadê aliyê Qazî Mehmed da bilind hatyc qîmetkirin.

Folklorzanê cyan bi 5 cildan hikyatê gel (salê cuda), berevoka MESELE Û XEBEROKÊN CIMETA KURDA, ku 800 rûpel e (sala 1985-a) neşir kir. Lêkolînê wî ye giranbiha derheqa êposa Dimdimê, tevgirêdanê afandinê Şekispîr biryarêni folklor Kurda ra, varyantê (şaxê), Rostemî Zal û Koroxlî li nav zargonina Kurda da. métodolojîya çêbûna stran,

efsane, çîrokên mîraniyê, şin û şayê û hwd. Hecîyê Cindî xebatê berbiçav kirye di dereca zmanzaniya Kurdî da, usa jî gelek helbest û kurteçîrok nivîsîne.

Wextê mirov kirina folklorzanê mezin ra dibe nas, ecêvmayî dimîne, ku mirovekî çawa karibûye mîrateke ewqas mezin pey xwe bêhêle:

- 15 kitêbên folklorzaniyê û edebyatzaniyê
- 12 berevokên zargotinê
- 7 kitêbên zanistiyê yê pêdagogiyê
- 33 kitêbên dersa
- 19 berevokên tercema
- Romana HEWARÎ (kurdî, ermenî, ûrisî)

Kar û barêni wî ji alîyê Yekîtiya Sovyêtê û hukumata Ermenîstanê bi layîqî hatin qîmetkirin. Ew hêjayî navê Şuxulbanê Zanestiyê yê Emekdar bû, kîjan didane zanyarêne mezine bi nav û deng. Usa jî bi gelek ordêñ û mîdala va hatye rewakirin. Lê qîmetê mezin ew hurmet û nav e, ku wî dilê gelê xwe da hîştiye.



Hecîyê Cindî û Emînê Eydal

HEWARÎ kul û jana gelê Kurd e, êşa bi dewr û zemana. Bi jîyana êlekê nivîskar temamya nakokî û problêmên nava gel da, sebebê bêtifaqî, bindestî û hejariya wî tîne holê û li ber xwendevana radixe.

Roman li ser qewimandinê bûyî hatiye nivîsar. Nevs û nîgarêñ romanê tev jî mirovên eslî ne, qewm-pismamêñ nivîskar in. Ew bûyêr çawa derbas bûne, çâ qewîmîne û çawa hebûne, usa jî bê zêdekirin, reng û awazêñ zêde rokirye ser kaxêz. Wî, mîna çîrokbêjekî odan, bi zimanekî delal, di derheqa kal-bavêñ we; êla Sîpka da gîlî kirye. Heta navê evda, cî û wara, sal û dem jî neguhestîye. Mirov bê şasî wê romanê dikare hesav bike dîroka Kurdêñ Ezidî, yên êla Sîpka, di dema nîvê sedsaliya 19-an heta nîvê sedsaliya 20-î.

Bi nûçekê derheqa şoreşgerekî Şoreşa Oktobrê, yê eslê xwe Kurd, Fêrik Polatbêkov da roman dest pê dibe.

Fêrik, dema Şoreşa Oktobrê Ûrisêtê, li herema Sîbirê bê ser û berate unda dibe. Xwîşka wî, Nûrê Polatbêkova û xizmê wî derheqê da tu tiştî nizanîn. Pey gelek salan ra serokatiya rîspûblikâ Ermenîstanê namkê ji Rûsyayê distîne. Nivîskarê namê, hevalê Fêrikî berê, nivîskarekî Rûs e; hêvî dike derheqa kal-bav, qewm, gund û warêñ şoreşgerê mezin da melûmetiya jê ra bişînin.

Nivîskar wê cawê dike firêta romanê û dîroka kal-bavêñ Polatbêkov ya êla Sîpka li ber xwendevana vedike.

Sedsaliya derbazbûyî da êla Sîpka, ku eslê nivîskar jî jê tê, dibe du parçe. Malmezina wan, malbata axa perçekî va diqilibin ser ola Musulmanyê, xwe dispêrin dewleta Osmaniye û bi hêlandayîna dewletê, bira-pismamê xwe ye ser ola kevn têne xezevê. Dest bi neheqiyê, zulmê û tiragêdiya êlê dibe. Qewm-pismam hev temûl nakin, dikevin qırka hev, dibine neyar. Yêñ ku berê şîn û şayê hev bûn, xal-xwarzî, ap-birazî bûn, keçê wan

malê hev da bûn, serê xwe li ber hevda didan, nanê hev heram dikin, heta xêra bavê hev jî naxwin. dibine "dîn dijmin". Gilî digihîje qirkirinê. Tev leşkerê Osmaniye, bi serokatiya mala axê êrişê dibine ser Êzdiyên Sîpkî, ku qirkin. Jinek diçe pêşıya wan laçka serê xwe vedike davêje ber pîyê wan. Xireta miletiyê dilê axê da şîyar dibe, gura zapitê Osmaniye nake, ji xwestina xwe poşman dibe.

Êzîdîyên Sîpkî dinhêrin îdî wura jîyan nabe, boy parastina ol û heyîtiya xwe, bi zehmet direvin wî warê Qersê, ku bin hukumê dewleta Rûs da bû. Wura ji xwe ra gunda şen dikin, dijîn.

Dewleta Rris alîyê hinek xalêن heqê ışaniyê da ji dewleta Osmaniye pêşdatir û dêmokratîtir bû. Wura zulma li ser evda ya seva dîn-meshefa, miletyê û ziman tunebû. Her kesî karibû aza, serbest ola xwe bihebanda, eyd-erefatêن xwe derbazkira. Ev qewlana, bi heqî jî Êzdiyan ra xilazbûn bûn.

Lê vira jî zordarî û neheqiya çînovnîk-quluxçîyêن dewletê, axa û begêن Kurdan li ser xelqê sade kêm nîbû. Vira jî ruşet, talan, dizî û xiravî hebûn.

Dewleta Rûs mala Emerîkê Polat dike malmezina wan, Elîyê lawê Emerîkê jî dike axê wê êlê, pêra jî quluxçîyê dewletê. Egît axayê birayê Elî axê, keçekte dergîstî bi destê zorê direvîne. Dema revandinê xwîşka keçikê tê kuştin. Seva wî sûcî Egît û du hevalên wî sirgûnî Sîbirê dikan. Hevalek wur ji qewlên sirgûniyê û serma Sîbirê dîmire. Halê Egît axê jî giran dibe, mecbûr dibe qewlên Êzîdîtyê biteribîne û jineke Rûs ra bizewice. Du law û keçek wan ra dibin: Fêrik, Baso û Nûrê. Egît axa jin û zarokê xwe va vedigere gundê xwe, Dîgorê. Civaka Êzdiyan jinika xaçparêz qebûl nakin. Jinik zarokêن xwe hildide carke din paşa diçe. Wura dê û zarok dikevne halê xirav. Egît axa dizewice. Namê ji Fêrik distîne, ku diya wan mirye, zarok bêxweyî mane. Egît diçe Nûrê û Baso tînc. Fêrik, çimku xwendinê da bûye,

wura dimîne. Ew jî havîna tê cem bavê, paşê diçe xwendinê.

Dest bi şerê Hemdinyayêyi Ewlin û Şoreşen Rûsyayê dibil. Qewatên Rûsan ji heremê dikşin, diçin. Ew dimînin devê leşkerêن Roma reş û alayên Hemîdiyan da. Rojên reş tê. Êzdî dîsa cîşihitî dibil, direvne Ermenîstanê, li gundêñ êzdiyaye pala çîyayê Elegezê. Rêva qira wan tê. Lê bi revê ew xilaz nabin. Xûnxur digihîjne gundêñ Elegezê. Çem bi xûna evda dikşe. Elî axê bi cizaret dikujin. Koka Êzdiyan tê. Bi hezaran zarok êtîm dimînin, nava wanda usa jî xudanê vê romanê.

Tava Şoreşa Oktobrê dide Ermenîstanê da jî. Ëla birîndar dîsa sér xwe da tê, lê Fêrik Polatbêkôvê şoresger usa jî venagcre.

Ev tiragêdiya kal-bavê xwe, ku şedekî wê jî nivîskar bi xwe bûye, bi hostatî tîne li ber çavêñ xwendevana.

Bi keser derheqa axa, beg, serokeşîrên qure, nezan, qafseçet, erf, edetên gele bêkêre zîyandar û nezanî, xizaniya gelê Kurd da dinivîse. Mirov dema pirsgirêkên romanê da hatine bilindkirin dînhêre, tê hêjî yê îroyîn in; dîsa ew neyarê xwînrêj in, dîsa nav Kurda da bêtifaqî, qebîlatî, nakokî, nezanî, dîsa rev û bez, koçberî, penabirî. Romanê da tê gotin, ku xilaziya gel tifaq û yekîtyê da ne.

Zimanê romanê xweş û gelêri ye. Bi mesele, metelok, xeberok û stranêñ gelêri roman hatiye xemilandin. Her gotinek li cîyê xwe da ne, bêy şirovekirin, şîret, temî û sipartînê zêde, ew jî qîmetê romanê hê bilind dîkin. Dîdem, sifetê romanê usa rînd hatine nîgarkirin, reng û rewş usa baş hatine kişandin tê bêjî wêneyêñ çîya, gelî, geboz, zozan, guhêr û gundêñ Kurdan e.

Ev romana delal destanîneke edebyata Kurdê Sovyêtê ye. Pêwîst e her Kurdek wê bixwînc.

**ŞİKOYÊ HESEN**  
**1928 - 1976**



Şikoyê Hesen sala 1928 – an, 17 – ê hezîranê gundê Camûşvana biçûk da, nehya Aparanê li Komara Ermenistanê ji dayka xwe bûye.

Zaroya wî bi dijweryan derbaz dibe. Hê pênc salî tune bûye bavê wî diçe remetê. Paşê dest bi şerê Almanya Hîtlêryê û Welatê Sovyêtê dibe. Zaroka sêwî hemû çetinayî, kul û derdên êtîmyê û şêr tem dike. Berxvantîyê dike, tezî, serqot, pêxwes û birçî dimîne.

Pir ji xwendinê hiz dikir. Sala 1948 – an mekteba gundê Elegezê ya navîn diqedîne. û diçe bajarê Yêrêvanê û be serfirazî Ünîvêrsîtêta wure dewletê, para Rohilatzanyê da qebûl dibe.

Hevalên Şiko, yêñ xwendinê salixê zîrekya wîyc zimanzanyê didan, digotin zimanzanen Ermenyan, yêñ wê demêyc eyan, ku ders didane Şiko li ser zanebûnên xwendkarê Kurdi zimanzanyê ecêvmayı diman. Ewî ew beşa xwendinê bijarti bû, ku paşê karibe di nav kurdzanyê da kûrbe, kêrî gelê xwe bê.

Sala 1953 an xwendina bilind bi açixî diqedîne. Wî dişînin gundê Baxnarê, nehya Gagrayê (Abxazya) Komara Gürçistanê ku dibistana wî gundê Ermenya da wek dersdarê ziman û edebyeta Ermenî bixebite.

Heta sala 1959 – an li wur dixebyite. Lê xwestin û meremên wî berdewankirina xwendinê, kurdzanî, cdebyet û zimanzanya kurdi bû. Ewî salên xwendevanyê da helbest dinivîsin. Sala 1959 – an dema karêñ kurdewerî li Ermenistanê ges bûbûn, vedigere Yêrêvanê û rîdaksiya Radyoyê ya xeberdanêñ bi zimanê Kurdi da derbazî ser kar dibe wek werger û xebatçyê edebyetê.

Du sala şûnda êntyama dide, di aspîrantûra Akadêmya Ermenistanê ya zanyarî beşa zimanzanyê da qebûl dibe.

Dişînîne Lênîngiradê, ku li cem rojhilatzanê eyan li ser têza xwe ya doktoryê bixebite. Tê bêjî meremê wî dihatine sêri.

Ew helbesteke xwe da wa dinivíse:

Dûr ji çiyayê Elegezê sersedefe e'şhemêz,  
Li ku bihar kaw dihûne dengê teyra, seda pêz,  
Li ku gundê kurdaye ro, mîna karbar bûne rêz,  
Li ku qîz û xortê kurda nav û navdar, nûr – neder,  
Bi xebata xweye şemal eşq û şayı kirine ber,  
Li ku nolî kanyê kewser kilamê me dixulkulin,  
Zeryê meye kawc – kubar li nav deşta dimilmilin,  
Qevzê sosin, rihanê reng, ew te'va zér tev dişxulin,  
Û ev temam, û ev temam dilê min da, ber çevê min  
Lênîngirad, te bûm mîvan, çawa ewled li diya amin.

Pêşya rast gotye: “ Ku bextê sêwya hebya, sêwî nediman”. Meremê wî mîyaser nabin. Rûyê destengî û tunebûna mecalâ da xebata doktoryê nîveî da dihêle, pêra ji nexweş dikeve û vedigere Yêrêvanê. Pîrek û zarokê wî halê aborîyî xirav da bûn. Vira ji bext jê ra nakene, nikarc pirobilêmên mala xwe yên aborî safîke. Nivîsarên wî wede da naweşînin. Mala xwe bar dike diçê bajarê Tilbîsê. Destengî, nexweşî, bêgumanî lê zor dikin. Helbestvanê pirşuret, 48 salya xwe da, sala 1976 an çû ber dilovanya xwe.

Çû dema efrandarya xwe ya herec geş û xurt da, wextê êdî hostê peyva bedewetyê bû, karibû dur û cewahirên giranbiha gelê xwe ra biefranda.

Vî warî da sûcêñ rewşembirêñ Kurde wê demê, yên wa gotî desthiletdar pirr bû. Ji bo wê demê hinek ji wan “e'frandaran”, ku paşê bûn xweyê bi deha berevokêñ

helbestan yên bêtceme, bêrenge, sade li ber derê weşendina pirtûkên kurdî sekinibûn, xêncî pirtûkên xwe û neferên mala xwe rê nedidan efrandarêن wek Şiko.

Li welatê Sovyêtê da çapemenî dest dewletê da bû. Bêy qirara dewletê kesî nikaribû perrek jî çapkira. Pirtûk gerekê salek yan du sal pêşda biketana pilanên weşandina weşenxana pirtûkan. Seva pirtûkên ku çap dibûn, bê hesabhidana jimara pirtûkên çapbûyi û sirotina wan, nivîskaran perên qalim distandin. Usan jî edebycta kurda ra çapa weşanê kêm bû, mecalê weşendinê yê din tune bûn. Rojnema RYLA TEZE jî usa biçûk bû, ku cend meha carekê helbestek yan kurteçirokeke biçûk biweşanda baş bû.

Salbisal alyê desthilatdarya Komar Ermenistanê da jî ew mecalê hukumata Sovyêtê dabûn kêm dibûn. Rexnegirî nikaribû hebya, rêxnê ku dikirin jî nedigihîştin cî, ji bo cîyê neşirkirna rexna jî tune bû..

Ji hesavê nivîskarêñ Kurd, wan “cwamîrêñ “meyc naskirî ziman seroketya neşireta dewletê ra didîtin û berhemên xwe û yên merivên xwc diweşandin, pere distandin. Ji bo wê jî dîrokzana kitêbê zargotinê diweşendin, xwendevanên zanîngchan pirtûkên sitiranen çap dikirin, “şayîran” jî destanên zargotina me “veçê” dikirin. Tek pirtûka tijekin û biweşînin. ?

Wan sala çiqas efrandinên bedewetyê yê pîrqîmet rûyê wan da unda bûn, çûn. Lê çiqas nehatine nivîsar?

Minê ev xet nenivîsa, eger halê Şikoyê Hesen yê wî çaxî neketa bîra min: çawa û çîma ew ji Lînîngiradê vegerya, zarokê wî halê kesîbyêyi çawa da bûn, çawa zarokeke wî mir û bi ci çetinayê ji Yêrêvanê bar kir çû bajatê Tilbîsê. (Rastî ji Yêrêvanê revî). Ezê li ber îsafa xwe gunekar bûma eger min ev rastî nenivîsa.

Sureke din jî heye, ku nikarim nenivîsim. Jî pey mirina Şikoyê Hesen ra li nav pirtûkên hinek “helbestvanen” me yê “bi nav û deng” da helbesten mîna yê Ş. Hesen (sitîl û cûrê wî) hatine xanê. Hinek zimanen “nepakan” digotin jî pey mirina Şiko ra wan çûyc û ew helbestan ji mala wî kirîne, anîne kirine pirtûkên xwc. Wan “helbestvana” jî digotin giva Şiko rîdaktorî li wan efrandinen wan kirine, wan ra serrast kirye, loma jî ew helbest û destan mina yê Şiko ne. Ji wan kî rast bûn, kî derew, nizanim. Gune bira ustyê wan be. Çawa gel dibêje: “Xwedê ji wan bixweze”.

\* \* \*

Berevoka wîye ewlin: QALÇÎÇEK sala 1961 – ê li Yêrêvanê çap bû. Bi vê berevokê Şiko çawaa helbestvanekî xweyîşuret di nav xwendevana da hate naskitin û hizkirin. Li nav “helbest – hevanînên” berê yê bêteme bêreng da, QALÇÎÇEK wek kulilkeke helbesta kurdî ya rengîn xuliqî bû. Helbestvanekî esil peyayî meydana edebyeta kurdî bûbû.

Ev xeta hema derheqa wî da ne:

Tu dengbêjê e'rs û e'rda,  
Tu dengbêjê baxçê nûr,  
Tu mêzîna dilê benda,  
Eşq û şaya huba nûr.

QALÇÎÇEK ji alyê xwendevana va rind hate qebûlkirin. Derheqa wê da gotareke hêja kurdzan û nivîskarê eyan Emînê Evdal rojnema RYA TEZE da nivîsî. Destanînên vê berevoka biçûk ew bûn ku helbestvan bi ruhê gelêri nêzîki pisa dibû, xebera xwe ya nû digot. Zimanê wî zelal bû,

dewlemend. Teqil, çap û têxnika nivîsarê ji helbesta kurdî ya kilasîk dihatin, sitîl û cûrê xwxatya helbestvan, destnîvisara wî ji helbestan rind dihate xanê. Gerekê bê gotin sitîla helbesta wî li nava hezara da cuda dibe.

Zaroya wî li nav xezaya çiyayê Elegezê derbaz bûbû. Gelek helbestên wî didem û sifetên xczaya bedew bûn. Elegeza rengîn bi bihar û havînên xweye bedew, çayîr çîmanê bi kulîlkan xemilandî, cewêن leze avsar, payîz û zivistanêن wêye sare berfin, bager û dûman, tev ketibûn dilê wî, li nav ruhê wî û bi tembûrê xwe yê delalî kurdî distira.

Hestê wî pir nazik û delalin.

Ez bûme li cenûba dûr  
Ku Elegez e'rs radimûse.

Ez bûme li ocaxa nûr  
Kalê wê tim mîrxwese.

Bêşîka min çayîr – çîman,  
Bi xemla xwe hezar rengî,  
Pêçeka min mij û dûman  
Ber hemêza çiyayê bengî.

Li nava wê xezaya delal û nazik da ruhê helbestvan ji nazik bû. Deîna salêن zaroya wî, gundêن kurda yên wê heremê da ode hebûn. Ji çirokbêjan Şîko pir tişt hîn bûbû. Ew bûbûn mamostayêن wî yên ewil. Zargotina gelêrî ya dewlemend zarotyê da ketibû li nav ruhê wî, jêra bûbû xûn – qinêt:

Her kalekî zemîn vir pêxembere,  
Gilyê wan şîret şînemdevîre.

Zanebûnêñ usan hene, ku evd dibistan û zanîngeha da nikare hînbê, wan dest bîne. ew ji xûnê têñ, ji şîrê dê têñ, ji kûrma jîyanê têñ, di nav kîjana da bende mezin dibe. Rêça helbestvanya Şikoyê Hesen ji nava wê kûrmê ji dihat. Ewî şîrê dayka xwe ra zargotina Kurda mihandibû, ew ji malbeta dengbêja da mezin bûbû. Biayê wî Xemoyê Hesen dengbêjekî dengxweşî xurt bû, gelek kilamên wî dengxwena radyoya Yêrêvanê da hene.

Berevoka duda: TEMBÛRÊ KURDA sala 1965 – an hat weşandn. Eva, tev çend berevokêñ helbestvanêñ din wê demê bûn xemla textê xwendevanêñ kurde edebyethiz. Gelek helbestêñ vê berevokê paşwextyê bûn sitiranêñ hizkirî. Bi texmîna min ev berevok kulîlka poçzya Şikoyê Hesene. Wede da derheqa vê bcrevokê da gotareke rexnegeryê rojnemevan Hesenê Qeşeng nivîsiye. Wê gotarê da TEMBÛRA KURDA tê qîmetkirin çawa destanîneke edebyeta kurdêñ Sovyêtê.

Sala 1970 – ï berevoka wî ya helbesta MEREMÊ DILÊ KURD, lê sala 1977 – an, êdî salekê ji pey wefetbûna wî ra berevoka PERWEZÊ WETÎN çap bûn. Xêncî van heçar berevokan, gelek efrandinêñ wî bi wergera zimanê rûsi, ermenî, gurekî neşir bûne. Hinek jî bi destnîsar li cem qewmê wî mane.

Helbestvan jîyanekê pir dijwer û kin derbaz kir. Lê çî jî ji pey xwe hîşt hebûneke pirqîmete nemirîye, wê heta - hetayê gelê wî ra bomîne.

Şikoyê Hesen li nav helbestvanêñ kurdê Sovyêtê, yên wê demê da yê herî xwendî û zanî cedebyetê bû. Ewî him zimanê Kurdî rind zanibû, him edebyeta cihanê, him jî, zargotina Kurdî, ya dewlemend.

Salêñ efrandarya helbestvan dikevin dema hişyarbûna gelê

Kurd, wexta li Başûrê Kurdistanê ala azayî û serxwebûnê bi serokatyâ Barzanyê Mezin hatibû bilindkirin. Huba wî ber bi welat û gelê wî yên dûr pire:

Welatê min, miskenê min,  
Tuyî e'rs û e'zmanê min,  
Tuyî min ra çar û iman.

Helbesteke din da wa dinivîse:

Jî min pirsîn: Çi hiz dikî,  
Li vê dinya kaw nazikî ?  
Min go: Zarê meyî Kurdî.  
Ku miletê pirtî – pirtî  
Doicivîne û dike yek.

Tê bêjî ev xetên wî seva fro hatye gotin. Rastî jî zimanê me hîmê heyîti, tisaq û xwenaskirna gelê me ye. Zimanê Kurdî ye ku gelên kurdî li nav dagerkiran, û ol û meseba da parkirî digîhîne hev. Helbestvan halê gelê xwe yê bindest distirê û dide kivşê ku azaya gel û welêt li nav tisaq, yekîti û qewata gel bi xwe dane.

Sultan Hemîd gote Kurmanç:  
-Min standye te text û tac,  
Hûn hîştine bê xweyî – xwedan,  
Bê dewlet, bê extyar û bac.  
Kurmêne go: Em heta saxin,  
Ber Sultana qet danaxin,  
Emê rokê cse rabin  
Ser kele ta wetan derxin.

Helbestyan bi gumane, ku rojekê bê welatê wî jî wê aza be. Efrandinê xwe da, ew bi sidqekî qenc nêzîkî pirsa azaya gel û welatê xwe dibe. Helbestên “Zimanê Kurdfî”, “Wek zarê xwe em xulxulîn”, “Kurdistan dişewite”, “Lûrî – Lûrî”, “Abas bira” û gelekên din efrandinê pirqîmete usanin ku tê bêjî dilê her kurdekî azayîhiz dertên û karin quesra edebyeta gelê Kurd bixemîlinin.

Hinek helbestên xwe da ew dicçîribînc cawa pirsa heyîtya gelê xwe bide. Bi rastî jî li nav goveka dîn û dewletên miletxwer da, bê dewlet, bê tac û text, gelê kurd çawa xwe xweyî kirye û hatyc derketye roja frôyîn ? Çawa mina hinek gelan ne helyaye, unda nebye? Ew menya heyîtya gelê Kurd, bi heqî di nav ruhê wîyî azadîhiz, zimanê wîyî şîrin, zargotina dewlemend û e'rf – c'detên xisûsî da dibîne. Kurd li ser erdê kal û bavê xwe bûn, Kurd çiyayê xwe va girêdayî bûn û mina çîyaen xwe jî man.

Helbestvanya Şikoyê Hesen bi hezar rehî gelê xwe, dîroka kal - bavê xwe, zargotina gel va girêdayîne. Reng û ewazên poêzya rojhilate, xisûsyen zargotin helbestvanya Kurda ya kilasîk, helbestvanya rojavayêva usa hatine helkirin, ku mirav ecêvmayî dihêle.

Evîndarî naveroka helbestvanya wî da cîyê mezin digre. Huba helbestvan mîna ava kanyê çiyayê Elegezê zelal û safî ye, wek kulîlkên wê bîn xwes û delale. Zerîdomama wî keça Kurdaye kawc - kubare. Helbestvan derdikeve dijî edetên kevne bêkêre, zîyandar, dibêje ku mala bextewar kare tenê qewlên huba paqîj da çêbe. Şkoyê Hesen bi nexş û nîgarên xczayê yê delal helbesta xwe dixemîline. Ew hostê esfrandina sifet û didemaye. Helbestên wî yên usan hene, ku her xeteke wan sifetekî bêqisûre.

Helbesta Şiko bi şêwa kilasîke. Câp, cûre, teqil berdewama helbestvanên me û yên rojhilate tê. Carna kilamên gelêri ji tînin bîra mîriv, lê mora sitîla xwexatyê rind tê xanê.

Helbestvanê xweyî şuret xwe jî bihê poêzya esil zanibû. Dilê wî yê tije kilam dixeyîdi dema rex xebera bedewetyê, helbestên bêring, bêtêm, bêruh didît, merivê , ku tu karê wan helbestvanyê ra tune bû, xwe kiribûn helbestvan, seva qazanckirina pera dinivîsin, yên telebext ra wê demê li nav edebyeta Kurdên Ermenistanê da pir bûn. Helbestvanê milahîm bi keder nivîsiye:

Qurba tembûr ne şivdare, bigerîne her şivan,  
Saz – şayîrtî ne palane, ku hilîne her yekan,  
Saz û tembûr ne kinecke, her kes xwe ra bikire,  
Her destî da tembûr nastîtê, bêzar baqkî diqure.

Helbestvan zû koça xwe bar kir û pirsgirêkên jîyana dijwer macal nedan, ku wî anegorî hunurê xwe, ci karibû binivîsyâ û ewleda ra bihîsta, lê çi jî ji pey xwe hîş giranbiha ye û wê bimîne. Naveroka elbestvanya wî şireye,lêkolîna edebyetzanyê ya kûr û dûr dixweze. Helbet li nav vê gotara biçûk da min nikaribû sifetê cfrandarya wî tam derxista li ber çevê xwendevana. Eva peyveke bçûke seva bîranîna helbestvanê mezin. Ez gumanim derheqa kar û barê Şikoyê Hesen da lêkolînen hêja bêne kirin, ji bo ew bida ykene ku tenê li nav edebyeta Kurdên Sovyêtê da lê bilindayîke li nav temamya helbestvanya Kurdi da.

Sed heyf ji pey hilweşîna qeydê Sovyêtê ra tê bêjî ew xizna medenî ya ku wur hatibû çêkirin tê bêjî hatye bîrkirin.

FÊRÎKÊ ÜSIV  
1934 - 1997



Nîvê salên pênciyî dîsa ronaya remê li ser pêşdaçûyîna çand û kultûra Kurdên welatê Sovyêtê, xasma li ser Kurdên Komara Ermenistanê vebû. Ocaxên kultûri, çandî, perwerdeyî, zanyarı, ku ji pey Şorişa Oktyabirê ra vebûbûn û ji dest râprêsyayê diktatorya Stalîn, sala 1937-a hatibûn dadan, carke din vebûn.

Li merkeza Komara Ermenistanê, li Yerêvanê dîsa agirê karê kurdewaryê geş bû. Rojnama Rîya Teze, di Radyoya Yerêvanê ya dewletê da beşa axavtina kurdî, Akadêmya Ermenistanê ya zanyaryê da kurdzanî, beşa nivîskarênen Kurdan, li rex yekîtya nivîskarênen Ermenistanê gumrih dest bi karê xwe kirin.

Di destpêka salê sîhî, dema li welatê Sovyetê nû avabûyî da, seva civaka Kurda mecalên çandî, kultûri, perwerdeyî vebûn, Kurd hê seva kêranîna wan mecalan amade nî bûn. Kadroyên Kurda yê abegor tune bûn, yê pirî-hindîkî xwendî jî bi hejmara tilya dihatin hesavê. Bingeha zanistî ji bona xwendin-nivîsarê, perwerdeyê tune bû, gclek erf-edetên kevne ziyankar asteng bûn li ser wê rê û hêviyê. Lê vê dema nû kadrên zaneyeye xwendî êdi hebûn û hazir bûn tev rewşenbirênen salê sîhî wî kar-barênen pêşdaçûyîna gelê xwe, yê pîroz bidin li ser milê xwe û bi serfînyazî pêşda bivin. Gelek xort û keçen Kurd di nav wan salan da zanîngehê Ermenistanê xwendina bilind xilaz kiribûn, geleka jî dixwend û hazir bûn bi hizkirin tevî wê xebatê bibin.

Beşa nivîskarênen Kurd, ku wê demê nivîskar-zargotinvanê bi nav û deng Hecîyê Cindî serokî lê dikir, karê efrandaryê li nav gêncâ da ges kir. Heftê tunc bû, ku civînên nivîskaran, enenekirina pirtûkan, rasthatin di tevî nivîskar û zanyarênen eyan, şevênen xwendina helbesta, sazbendiyê teşkîl nekira. Odêñ karkirinê, yê rojnama Rîya Teze û axavtinênen kurdî yê radyoyê bûbûn cîyê rasthatina efrandarênen gênc.

Wan sala hatina serokê gelê Kurd yê azadaryê Mele Mistefa Barzanî li nav Kurdê Ermenistanê û bi serokatyâ wî serhildana li

Kurdistana başûr agirê welatparêzyê li nava vê cîvakê da jî gur û  
ges kir. Çav û guhê teva radyoyê û rojnamê bûn.

Alaveke xweş karê efrandaryê jî girtibû. Dengê helbestvanê  
gênc dihat bihîstin. Wî dengî bi xwe ra reng û awazên delal yên  
nû tanîn. Bîhna edebyeta esil dihat. Ager gavdanê nivîskar-  
helbestvanê salêن sîhî, mîna gav avitînê zarokêن nû pîya diçûn  
bû, payê nivîsarêن wane pirê him ji alyê ziman, naverok, him jî  
cûre û tecîla nivîsarê va qels, kesîb bêreng bûn, lê dengê  
gêncan zelaltir û xweştir bûn, ji kanya zargotina gele zengîn û  
bingeha edebycta eslî dihatin.

Dengê herî hizkirî, ku teva jî hiz dikir, dengê Fêrikê ÛSIV  
bû. Ji wê demê da xwendevanê Kurdê Sovyêtê helbestvanê  
xwe nas kirin, hiz kirin û nexapyan.

Hejmara rojnama Rîya Teze ya 25-ê oktyabirê, sala 1989-a  
da gotara min ya bi sernava SîPAN çap bûye. Di gotarê da wa  
hatye nivîsar: "Avtomaşînê me ber bi gundê Sîpanê, Pampa berê  
dibe (nehya Aragasê). Ez pencerê ra çiyayên dora gund dinhêrim  
û şera şayîr Fêrikê Usiv dikevc bîra min:

Pampa mine xweş, Pampa min kubar,  
Wê pal vedayc wan quntarê sar,  
Pampa min bûk e, bûka xeml lê bend  
Dorê çiyayê me girtine govend.  
Çiyayêd me bilind, çiyayêd me kubar,  
Ku jê dikişin cew û kanîyê sar,  
Şimalê mij tê mîna karwana,  
Ser çiyayê me ra diçe arana.  
Êvarê bi hewas mij guje-guj e  
Û nav mijê da Pamp dihêniye.

Min û avtoajo derheqa poyçzya Fêrikê Ûsiv da xeber dida,

wextê hema li nava gund ew pêşya me va derket.

- Ez bêyî Pampê teyax nakim,- şayîr hela çend sal berê ji min ra gotye.. Nenihêri mala wî, neferê wî li Yêrêvanê ne, lê ew nikare ji "Pampa xwe" biqete. Di bajêr da xebata wî jî hebû, derecê wî jî baş bûn, lê eva bîst pênc sala zêdetir e di gundê xwe da dersdar e. Poêzya wî ye nazik di vî gundi da hatyc xuliqandin. Xwe ra li pala çiyê xanîyekî bedew çêkirye, dorê sûreke dirêj kişandîye. Tê bêjî cw xanî, cw sûr jî pareke poçziya wî ne, di wan da jî ruh, kilam, awazên xuliqandinê hene. Ew jî ji kûraya dilê şayîrê esil xuliqîne.

Fêrik ji maleke esilzade ye: mala Ûsivê Îbo. Bavê Ûsiv, Îboyê Nemo sala 1918-a, wextê rev û bezê gundê xweyî hizkirî, Yamançayîrê, li qeza Qersê dihêle û bi malê va direvne pala çiyayê Elegezê, gundê Camûşvana mezin (niha gundê Elegezê, nchya Aragasê). Roma reş tê digîhije vî gundi jî. Bav û apê Ûsiv jî tevî bi sedan mérên gund digrin, dikujin.

Ji pey zulma Romê ra dest bi xelayê dibe. Ûsiv û birê wî neferên xwe hildidin diçinc Borçalyê-Gurcistanê, ku bikaribin ebûra xwe bikin. Sala 1922-a vedigerin, têne gundê Pampê (Sîpanê), cem qewmên xwe, dibin mal-hal. Ûsiv di kolxozen da birigadîryê dike, dibe malxê mala giran. Nch kur û du keç mala wî dixemilînin. Bi gotina gotya hesavê nebî-nebiçirkê remetyê Ûsivê Îbo ji sedî zêdetir in.

Di wê mala giran, di da sala 1934-a da Fêrik tê dinê. Zarotya wî li nava mîrg-çîmanê Elegeza bedew, jîyana gunde qedîmî, odêñ bi zargotinê tijî û evdêñ gunde sade da derbaz dibe. Helbestvan, paşê bi hisreteke mezin derheqa wan da wa dinivîse:

Hey, hevalêd zarotya min,  
hûn li ku ne. ku ne naka?  
Ez li dor xwe dînihêrim

Û dibînim tek û tûka.  
Werêñ qewmêd mine ezîz  
Heytchol û hewasî,  
Bi dengê def û zurna zîz  
Zarotya min dike gazî.

Evan xeta ji destana wî ya HISRET in. Destan sala 1981-1983-ya hatyc nivîsar. Bi rîyalîstî û delalî helbestvan dîdemên jîyana gundê xwe li ber xwendevana vedike. Neferê destanê tev bi nav û kar-barê xwe va gundî, cînar, qewm û pismamê wî ne. Şayîr bi hesret rojêñ buhûrî, evdêñ hizkîrî, bûycrêñ gund da bûyî bîr tîne. Guhêra şivana, odêñ gund, şevêñ zivistanê ye dirêj, çîrokbeja, beranberdana, reva jina, dewatêñ gund. Xatî, met, ap û xala, henek-laqirdiyê wan, camêrî, dilovanî, dilnermîya wan evdêñ sade, erf-edet, rabûn-rûniştandina wane bedew.

Çavê wî da zarotya wî dibe çîrok, çîrokeke şîrin, kesercke kûr, hisretekê xweş. Qewlê jîyanê usa ne. Hatî çûya ne. Kê dikare pêşyê bigire? Emir mîna çemekî dikşe. Dinya ji kê ra maye.

Ez seba we dikim ax-wax,  
Çî ku wede xwe ra birye,  
Zid ji gelek saxêd alçax-  
Min mukurya mirya kirye.

Jî pey van xeta ra ew nava rêz dike, bûyêra bîr tîne û destanê bi xetêñ wa, yê xurt va tomerî dike:

Lê naxwezim hela feqet  
Herim meskenê mirinê,  
Tişt hene, ku bi dil û ced  
Jê hiz dikim li rûyê dinê.

Dibistana heft salan di gundê xwe da diqedine. Diçe bajarê Yêrêvanê berê xwendinxwana dersdarhazirkirinê, paşê jî li beşa edebyet û dirokê ya zanîngcha pêdagogyê ya ser navê Xaçatûr Aboyan da dixwînc. Sala 1960-î, ji pey qedandina xwendinê ra rêdaksiya axavtinên radyoya Yêrêvanê, di beşa bi zimanê kurdî da derbazî li ser kar dibc, çawa serwêrê para edebyetê. Lê karê wî dirêj nakşîne, kar dihêle, vedigerc gundê xwe, Pampa Kurda (Sîpan), di dibistana gund da dersê zimanê kurdî dide. Weke 25 sala wî karê xwe berdewam dike.

Berevoka wî ya ewlin a helbesta di saala 1961-ê li Yêrêvanê bi navê ÇAVKANÎ hate weşandin. ÇAVKANÎ rastî jî kanîke nû bû, kanîke avzelale, avxweş li zozanê edebyeta kurdî da li berpala çiyayê Elegezê. Pirtûk di demeke kin da hate firotan, kuta bû. Xwendevana, ilahî gêncâ ji destê hev direvandin.

Wê demê ez jî li bajarê Yêrêvanê xwendevan bûm. Me xwendevana gelek helbestên ji wê pirtûkê ezber kiribû û cyd-şaynetyê Kurd da digot. Bijîşk, zanyarê bi nav û deng remetyê Sehîdê İbo jî derheqê berevokê da gotareke berfîre di rojnama RÎYA TEZE da weşand. Ulmdar qîmetekî layîq da ÇAVKANYÊ. Gelek helbestên wê berevokê bûne kilam, heta niha jî jî alyê stranbêjên Kurdan va têne gotin.

Dû ra li pey hev bercvokên wî ye helbestan Gula Elegezê (1964), Lîrîka (1967), Destana Ûsivê Nevya (1973), Narê (1977), Hisretdefter (1984) û Dinya Delal (1987) hatine weşandin.

Her du pirtûkên dawyê li nava berevoka BAHAR ya esrandinên şayîr û nivîskarên Kurdê Ermenistanê yê salane da çap bûne. Berevokeke Helbestên wî jî li Sûryê da bi tipêñ latînî hatîye weşandin.

Fêrikê Ûsiv helbestvanekî Xwedêdayî bû, hostê xebera bedewetyê. Ewî bi helbest û destanên xwe yê delal cûre, reng û

naverokeke nû, bi heqî nûjenîke eslî anî nava poêzya Kurdaye pirqume. Ji cûrê klasîkî dûr ne ket lê ew bi rê û şopa xweye kûre xwexatyê xemiland, dewlemedend û rengîn kir.

Ji alyê wergerê (terceme) da ji Fêrîkê Ûsiv hostakî bê qisûr bû. Wergerê, ku bi destê wî hatine kirin bi hêzbûna xwe ji orgînal firq nabin. Wergerê ku wî kirine- tev jî ji dur û cewahirên xizna edebyeta navnetewî ne û bi hostatîke usa wergerandine zimanê kurdî, ku di qewata evdêne sade da nîne.

Bes e em navê wan nivîskarêن cihanê yê eyan bînin, ji nivîsarê kîjana wî terceme kirine: Şêkispîr, Bayron, Haynê, Pûşkîn, Lîrmontov, Yêsenîn, Sayat-Nova, Avêtîk Îsahakyan, Hovhanês Tûmânyan, Vahan Têryan, Yêxîşê Çarêns, Parûyr Sêvak, Rasûl Hamzatov û gelekên din.

Di sala 1963-a da, gelê Ermenî 250 salya şayîr û dengbêjê xwe yê mezin Sayat-Nova bi heyte hol dida kivşê. Wê salê bi wergera Fêrîkê Ûsiv stranêن Sayat Nova bi bercvokekê zimanê Kurdî hatin weşandin. Ew werger bi hostatîke usa hatibû kirin, ku gelek ji wan kilam-helbesta bi teqil û miqamê xwe yê berê bûnc kilam. Ew heta niha jî di radyoya Yêrêvanê da bi dengê Aslîka Qadir zimanê Kurdî têne gotin. Werger ji alyê civaka Ermenya ya edebyethiz da jî hêjayî qîmetê bilind bû.

Ji cewahirên edebyeta hemdinyayê ya klasîk wergera destana Misirî (Lîrmontov), Masyê Zêrin (Pûşkîn), Abû Lala Maherî (Îshakyan) û gelekê din bi texmîna min destanînê wergerêye here bilind in di cihana edebyeta Kurda da.

Çawa temamya mîrata efrandînê helbestvan usa jî wergerê bi destê wî hatine kirin, hêjayî lêkolînê edebyetzanyê nc. Ez bawer im nivsê ku bêñ, wê wî karî bikin û qîmetekî anegor bidine wî efrandarê mezin.

Helbestvan qewat û qîmetê qelema xwe zanî bû:

Hiz nekiryê çîn û rutib  
Serekbazî min tu wexta,  
Nebûm şedir, nebûm katî  
Ne jî dolceşê texta.

Min tesîr kir şîera xwe da  
Hukmê mîr û mînistra,  
Lê xwe-xwe jî, koreqeda  
Bûm mîrekî nav şayîra.

Mixabin ev helbestvanê gewre ne li aqara welatê Sovêtyçyi berê da, li kîderê jîyana xwe ya efrandaryê derbaz kir, ne jî ji alyê gelê xwe yê Jurd va hate naskirin û qimetkirin. Nivîsarê wî pir kêm bi zimanên din hatine wergerandin û çapkrin.

Di helbesta xwe ya Çendik Çend Sal da, ku sala 1974-a hatyc nivîsar, ew gazina dike, besa şureta xwe ya nivîskaryê dike û dinivîse, dibê hûn şas nemînîn eger ez ji agirê hundurê xwe yê helbestvanyê karim bişxulim, bisîrim, firqas kim, ji destê mine "şêrnivîs" mîna kevir-hesta karin agir bipekin, dibê hûn ecêmayî nemînîn, ku ez karim dur û cewahira bidime xwendcwanê xwe, lê dibê ecêmayî bimînin:

Lê iro seqet  
Li rîkêñ emir teng ì firêqet,  
Milê min da tûr, dînc û dinêdûr,  
Wek parsokekî li guhê gunda  
Herim xalîfî, belengaz, unda  
Hûn şas bimînin,  
Hûn şas bimînîn.

Ji salê hevtêyî girtî di Ermenistanê da mecalên pêşvaçûyîna

edebiyeta civaka Kurd sal bi sal, bere-bere kêm û teng dibûn. Mafê weşana efrandinê nivîskaran dest dewletê da bû. Ji bo wê karê jî rewşa weşandina efrandinê nivîskarên Kurd pir dijwar dibû. Çapa weşana gelekî kêm bûbû. Burokrasiya komarê ya mîletçî her asteng li ser rîya weşana kurdî çêdikir.

Goveka edebiyeta kurde rêsپublikayê jî sal bi sal xurt, kûr û fire dibû, lê li nava hidûdên tenge, nexweze şovenist da nikaribû bihata xwenê, efrandinê hêja bi sala çap nedibûn, nivîskar bêguman û bê hêvî dibûn. Mecalên dayî jî diketin destêne hinek "nivîskarên" wa gotî desthilatdar.

Tiştên nebûyî bû, ku efrandinê nivîskarên Kurd bihatana wergerandin û bi zimanên mayîn bihatana weşandin. Di Ermenistanê da xwestin jî tune bû, ku şexsiyetekî Kurd bi şuret di aqara rêsپublikayê yan di welatê Sovêtê da bihata naskirin.

Cî nine mirov loman û gazina xclqê bike (rast eva loman jî nînc, ew mecal ne ku Ermenya lê welatê Sovêtê dabû hemû gela, usa jî Kurda).

Welat û gelin seva lawêن xwe him pişt, him nav, him hizkirin, him dê. Dilê dê li ser ewleda dêşe. Ewî xwe bi xwe jî tê derdixist, ku nivîskar, dengbêj, hozan, zanyar bi serê welat û gelê xwe têن naskirin, qîmetkirin. Perbask, nav-nışan, qîmet, kubarî welat û gel didin ewladêن xwe.

Bextê nivîskarê Kurd jî weke bextê Kurdistanâ wî ye. Berfire ye goveka efrandarya helbestvan. Ew ji derca gundê xweyi biçük, bilind dibe ber bi pirsgirêkên cihanê yê here ferz, ji sadetya jiyana gundai niqoyî li nav felsefe û aqilbendya mirovatyê ya hera gur û dîrmâtîk dibe, jî çîrok, kilam û destanên odêن gelêryê yê "hezarsalî" derbazî pirsgirêkên pêşvaçûyîna destanînê zanyarya vê dewranêye here kûr dibe. Dilê şayîri nazik li ser her pirsgirêkê dikewgire, wan li nav kûrma agirê dilê xwe ra, li nav hizkirin û sura afrandaryêye esil ra derbaz dike,

xwendevana ra dikeve şêwrê, bersîva pirsgirêkan dide, wan dike efrandinê bedewetyêye nemir û dide xwendevanê xwe.

Fêrikê Üsiv dengbêj û maşoqê gundê xwe, Pampê bû. Li nivîsarên xwe da ewî ne ku tenê pesnê çiya û banî, gelî û gêdûk, mîrg û zevî, cew û kani, obe, guher heta kevir-kuçikê gundê xwe yê hişke hola daye, lê tê bêjî ruh ber wan da berdaye, ziman kirye devê wan, hizkirina xwe kirye nava wan, usa ku xwendevan Pampa wî hiz bikin.

Xezaya gundê xwe, reng û rewşê wê, bîn û buxs, deng û cengê wê, dinitirîne, distirê: bihar-havînên xweşe buhuşt, payîzên hişk û hola, zivistanên sur-seqem û bager. Tevî cotkara erd radike, tev kîlendûkêşa gîhê didrû, tev şivana diçe çiyê, û ne tenê diçe çiyê, lê:

Min tab nanî, min da dû sa,  
Hevraz hêl bûm kelôşk-kelôşk,  
Ragîhîstim navsera çiya,  
Dinya ber min bû xewneroş.

Mîna xaliçekc bêhed  
Bi nexş-nîgar, reng û rîşî,  
Fire-fire ber min raket  
Sergera gul-gupik tijî.

Xwes hatyc gotin. Binhîrin dîdemne çiqas bêqisûr û xezayî li nav çar xeta da dinitirîne:

Mij dihelya bere-bere,  
Û ji nava bera mijê,  
Mîna hûtê binê berê  
Gultima çiyê dihat kivşê

Tê bêjî mirov li pala çiyê sekinye û ev dîdemê bedew li ber vedibe. Baxçê cfrandinêş şayîr bi dîdemêñ wa xemilandîye. Em mîzokin bi şikleki çiqas zêndî dîdemê maqûltîya civaka kurda ya qedîmî dide: çaxê mîr diçine oda:

Zû biçûna yanê dereng,  
Her yek cîyê wî hebû-sekyâ:  
Maqûl-mezinê bi nav û deng,  
Fêzê da pişt didan balgîya.  
Li pey wana, angorî yaş,  
Ser kulavêd binda palax,  
Mîrêd malxê, zilamêd baş  
Rêz digirtin xeleg-xeleg.

Helbestvan bi hewas, hizkirin û hisret derheqa malxê mala, mîrê çê, henekçîya, dengbêj- sazbenda, çîrokbeja, kevanyêñ destemel û bûkêñ bedew da distirê.

Dilê helbestvan ji bo xeyset, tiradîsyâ, edetêñ gelê Kurd yê maqûl dêşê, kijan li vê dewrana têlêvîzyon, îcat û zanyarya lez da têñ bîrkirin, guhestin, unda dibin.

Di helbesta Odêñ Kevn da bi keser, bi dîdemêñ odecke gunde "hezizye hezarsalî" nîşan dide çawa ew ode ji bêxemyê hildişen û li bin kelcê xwe da zargotina me, ew xizna me ya ruhî, ew hebûn û mîrata kal bavan têñ çelkirin. Ode, ku dibistanê gel bûne, cîyê şevbêrka, cîyê çîrokbej, dengbêj, hozan, maqûl û mezina, wanda xeysetê gelê Kurd çedibû, kere-ker, bê xem ji holê radibin.

Mertekê rizî, maxê qelişî,  
Şop sembelek pêva darda,  
Hêlûnê kêranava pelişî

tûnê pelik ber dîwara,  
Bixêrya sik-sar,bê kêlc kozî,  
Peltik-pêçirê kevne sade,  
Kerayek li ser hevda tevízî,  
Odê hezizye hezasale.  
Îdî dimirin,ketine "ber ruh"  
Bi rewşa xweye kevne sade  
Lê didine min nifûseke nû,  
Li min can dikin xêlî wede.

Helbesteke din da bi keser wa dibêje:

Hey gidî eva oda Osman e,  
Diwar hezizi. mertek rizyanê,  
Peltik xitimye bi konê pîrê,  
Nemaye ïz û toza bixêryê.

Tenê gundiyê Kurd kare wa bike axîn. Di van xeta da çiqas keser heye, cwqas jî kurdeyatî.

Lê tevî hizkirina gund, xeza û evdên wê usa jî nikare li rex tiştên xirav, erş-edetên bêkêr, gundyê çevnebihar, dirû û tima, gevezê û şerletan ra derbaz be. Helbest, destan û şanoyêñ xwe da bi diramatîkya kûr nîşan dide ku ew xeysetê civakêyî nerind çiqas zîyanê dide wan evdên sade. Carna bi laqirdîya, carna bi ken, carna jî bi kirîfîka tûj derheqa wan nerindya da dinivise.

Jî jîyana bajêr vegera helbestvan ber bi gund, werê zarotya xwe bûyereke nişkêva yan tiştekî bê mene û bê fikir nî bû. Ew nikaribû li nava jîyan û civakeke seva ruh û xeysetê xwe xerîb bima.

Cahiltîya [gencitiya] şêr derbaz bû,  
Nava gôl û gêjya şeher derbaz bû,  
Ü ez revîm ji wê gêla qîr û sîr,  
Çawa kurmanc dixulike ji xinzîr.

Eger F. Üsiv venegerya gund, ew cîyê seqirî, werê zarotya xwe xwe ra nekira cîyê efrandaryê, mîna efrandarê meye din bima li nav kar-bar, xiringêla bajêr ya tev li hev da, li devê hinek "nivîskarê", "Şêr diz", "Çevnebihar", "Xêrnexwez" da gelo ev berhemêن wî ye wa giranbiha çêbûna. Wê bigîhişa wê kûrayê û bilindayê?

Mirov dijwar kare bersivê bide wan pirsan. Ji bo hinek helbestvanê meye eslî, bi şuret li nav wê gêjgerînga "şêrdiz" û nexweza da, ketine halê aboryeyî xirav û bûne qurban.

Bi vegera gund Fêrik ra mecal çêbûn, ku ew bi temamî xwe pêşkêşî edebyetê bike. Ew ji nivîskarê me yê profesyonal bû û bi bawer ji karê efrandarî bi tu karê din va mijûl nî bû.

Fêrikê Üsiv çû gund lê ji jîyana bajêr neqetya, li nav civaka efrandaryê derneket. Cîyc bê gotin di wî warî da emekê jina wî, Firida CEWARÎ (keça Hecîyê CINDÎ) pir e. Wê qaranya malê, xweyîkirin û perwerdekirina zaroka, kar û barên rojanc hilda bû li ser milên xwe, micalen efrandaryê yê aktîv zilêm ra çêkiribû.

Gundê Pampê xweyê tradisyonên qedîmî, erf-edetên kurmançî, kolorîta xwexwetyê bû. Pamp xizna zargotinê, warê dengbêj û çirokbêja bû. Mirov hewas dikir rex rîspî û maqûlên wî gundi rûnişa, axaftina wanc bi elka şîrin, bi mesele-metelok, bi ten û niç, laqird, pesin û qerf, nifir û duaya bibihîsta. Çêrên wan heft qet bûn, duayêن wan heft tevek.

Efrandinê helbestvan da jîyana gund bi rîyalîstî û zêndî hatye nitirandin.

Vêşê şebcqê, ez hê nava cîya  
 Hesek ser min ket ji derî-bacya  
     Ji nava hewa payîzêye nêm  
     Piste-pistekê şirin dibihêm.  
     Nizam, diçin aş mezinê malê,  
     Nizam, bazarvan diçin bazarê.  
     Nizam, birê pêz dajon qiraca,  
     Nizam, koç dikan zomê kurmanca.  
     Nizam seferya dane serê riya,  
     Nizam, difîrin qulingê berya,  
     Hesek hisretî serê vê sibê  
     Min kamço dike berbi cenûbê.

Helbestvan jîyana Pampê tevna efrandinê xwe ra kiryc firêt  
 û li ser wê tevnê nexş-nigarên xwe yê nemirî nitirandiye.

Destan, ango poyêmîn wî Hisret, Rihana Reşo, Rizayê Kurmet, Dewatyê Dîlbend, şanoya Bê Qelen û gelek efrandinê wî ji jîyana gundê wî ne. Dîdemên xezaya gund, evdên wê, bûyar, çûyîn-hatin usa bi zêndî, rîyalistî hatine nitirandin, ku xwendevan bi xwe jî dibe neferckî wê dinya kurdewaryê, wê hiz dike.

Dawya salê pênciyî hewa welatparêzyê li nav Kurdêñ welatê Sovête da jî derbaz bû. Şekarya Kurda ya azadaryê, ku bi serokatyâ Barzanyê mezin dest pê bû, carêkê va Kurd hişyar kirin. Agirê xîret û namûsê, xwe naskirina milctyê ewqas gur bûbûn, ku her evdeki Kurd dixwest, çi dibû bira bibya, cîyê xwe li nav wê şerkaryê da bigirta, ji bo azaya welatê xwe şerkira.

Wê demê gumrih dest bi karê kurdzanyê jî dibû. Di pey hev pirtûkêñ giranbiha bi zimanêñ rûsî, ermenî li ser ziman, dîrok, çanda kurdî çap dibûn. Hestêñ welatparêzyê li ser bingeha

xwenaskirina mîletyê çê dibûn.

Têma welatparêzyê li nava edebyeta Kurdê Sovêtê da cîyê xwe yê sereke digre. Lê ji bo dora wan sûr û sinorêñ sovêtyê yê pola bûn, destê wan nedîghişte welêt, hestêñ welatparêzyê, xerîbye, hisreta welatê kal-bava, halê gelî dijwar, tev li hev dibûn, dibûn him axîn û keser, him evîn û hisret, him jî gazin.

Fêrîkê Üsiv wa dinivîse:

Huba milet serxweş bûma,  
Egît, mîrxas, keleş bûma,  
Teyarekê ez siyar bûma  
Li ser best û beyar bûma,  
Bê tirs û xof, zor û qeşeng  
Min dijmin ra danya qal-ceng  
Û bo azaya kurda  
Serî danya ax û erda.

Helbestêñ xwe Xûna Miletê Min, Çendik Çend Sal, Barzanî ra, Gilî Gazin û gelek nivîsêñ xwe yê din da halê gelê xwe, efatî û mîrxwesya wan, dîroka dijwar, zulm-zora dagerkira pêra jî cînarhizi û mirovhizya gelê xwe dide.

Qedîmî ye kurd, arî, xerîbdost,  
Ji xelqê xerîb me hiz kirye,  
Navê mîleta bimbarek, pîroz  
Li ewladê xwe ezîz kirye.  
Üris me danye navê kurê xwe,  
Çerkez û Çaçan, Gêrman û Ereb,  
Lê Ereb.

Lê dewletên Ereb, Ecem, Tirk gelê me kirine navbera xwe. mîna dêwêن çavbirçî dixwazin hûfî xwe bikin, tunekin, ji dîrokê rakin, bivin xweyê welat û hebûna wê. Û dibêje qerfa wedê ye yan ya benda, ku ev miletê gewre:

Dil bike wê bire-bedenê Misrê,  
Nava rokê da ji cî biguhezin,  
Berî berya din çemêd kewserê  
Vejenin sûra Çinêye mezin.  
Lê mîna şêrê bi sindê rûvî  
Qend û bend bûye, maye belengaz  
Bin destê şahêd Şîrqê herevî,  
Qanûnêd siyasetêye delkbaz.

Dibêje gelê Kurd bûye şihîdê "diplomasya bîc".

Dewletên hicûc-xweyê text û tac  
Xweyê extyaryê xwe zemanda,  
Ber bêdewletya bîst mîlon kurmanc  
Qerfa Xwedê ye yan ya benda?

Li xerîbyê wefetbûna Barzanyê mezin hukumekî giran ser helbestvan dike. Helbesta Mistefa Barzani ra, ku sala 1979-a nivîsiye, cfrandineke edebyeta Kurdên Sovyêtê ya bijare ye. Wê helbestê da xetne wa hene: "Me mal-mileti nekir şîn-girî", "Me li serê wan

Lawa nihêrî, ji kîjana ra dibêñ Barzanî", "Me bi sebrê girî guherî", "me bi hêstira nekir arzanî", "Bira ew milet hêşira birêje, yê ku nikare birêje xûnê."

Lê me aqa xûn meydana da rêt,  
Wekî em pê da bûne Cegerxwîn,  
Em bûne Hejar, Şivan, Cellêt,  
Xoşnav Xêrûlla, Leylê û Mehmûd.

Dibê em niha gerekê şîna "Bavê cimeta Kurd" nekin:

Belê serê me ket, lê em nagrîn,  
Şîna te nakin, bavê cimetê,  
Emê mînanî kurkê dêmbirîn  
Bigrîn, bikenin ber hemêza dê:  
Dayka Kurdistan. kengê xwe ragirt,  
Kengê merema te hate sêrî,  
Hingê wê nava şayameye gur  
Bihele şîna te merdemêrî.

Dengbêjê azaya welêt hazire serê xwe jî bide oxira azaya  
gelê xwe, wê rîya pîroz. Bi axîn-keser, hizkirin ew hîvya azaya  
welatê xwe bû.

Bira xwezil Kurdistan min şen bibya,  
Miletê min aza, xwendî û zên bibya,  
Derge-dîwan bi ziman û zarê min bûya,  
Qewm û milet li her çar hewarê min bûya,  
Bira hingê ayê şevê li min çarbûya,  
Kelefekî wêran min ra ci-star bûya,  
Qerpalekî reş li stûyê min da xarbûya,  
Destê min da ne ev qelemin nivîsar bûya,  
Bira gêzik dergevana destê min bûya,  
Soqaqêke El-Cizîrê "posta" min bûya.

Fêrîkê Ûsiv ra li hev nehat hema bi mîvanî jî welatê kal-bava bivîne. Hisreta wî van xeta da dîhar dibe:

Car-carana mem, melûl, dilxor û mirûz im,  
Lawo, kerba binê lingê te radimûsim.  
Şaş nemîne berxikê min. Eh, kî zane.  
Dinê heye kaşkişka dest îsa ne,  
Dibe rokê Kurdistana xopan vebe,  
Bavkê teyî hisret dil da lê tunebe.  
Bira hinge lingê te bi hisreta min.  
Bigere nav ax-topraxa cimeta min.

Evîndarya şayîr mîna kanyê çiyayê Elegezê zelal, mîna kulîlkê wê nazik, bînxwes û delal e: mîna biharê wê bi reng û rewş e; mîna cewkê wê gur, kel û germ e. Efrandinêñ ewlin girtî heta yê dawyê şayîr huba tebyetiye helal digere, huba usa ku li ser siya qelpyê, berjewandîyan tunebe.

Lê gîhiştina huba usa vê dewrê da pir dijwar e. Mîna mêşa hingiv jî kulîlkekê difire li ser kulîlka din, nikare bêxem li rex bedewyê ra derbaz be. Evîna wî cîkî "Klêopatra qemere" cîyê din "Xasxanîma kurmancîye", cîkî "Bedewa bede", cîyê din "Dota Tilbîsêye dibûrye".

Gelek helbest dîyarî Sivêtayê, keça Tilbîsê kiryê. Bi qelema xwe bejin û bala wê, bedewî-delalya wê nitirandîye. Ji bo xatirê wê hazır e her tiştî bike:

Min jî derew kir bi dil kulî  
Pêncî salê xwe kire çili,  
Porê xwe sipî hina dayê  
Sev xatirê Sivêtayê.

Kçeşa evîna wî, Sivêta nikare jê sem bike, nikare tê derxe şîrmaya evîna paqije tebyetî, qîmetê evîndarê xwe yê helbestvan:

Sivêtayê ra ne lazim e şîer,  
Lazim e "Volga", kûrort "Borjomî",  
Şîer-poêmê te bêkêr in, bêkêr  
Ber xebereke. "dizê zakonî".

Sivêta rastîk bû ku demekê hat kete li nav jîyana helbestvan. Ew bû aşiqê wê jina bi qerefatê xwe va bedew, lê ruh va sade, vala. Jinêñ usan ra hub tune, hub-berjewandî ye. Evîna helbestvan bû keser, kesereke kûr, bîranîneke şîrin.

Ev kê kivş kirye, kîjan xemkêşî,  
Nava muhbetê aqa varvêşî?  
Varvêsyâ yaşa,  
Ya rutib-rewşa,  
Dewletê û dîn,  
Zagûnê, zemîn,  
Varvêsyâ milet,  
Varvêsyâ edet.

Herge kivş kirye, çira wede da  
Natemirîne huba nav me da,  
Sist nake qam û qedemê hubê,  
Çawa sist dike li me dest û pê.

Çîma li dinya bîc bergîra,  
Dide me dil û dînê şayîra?  
Lê çi jî hebe dinivîse:  
Ax mirov zêr undake,  
Gund û bajêr undake,  
Text-tacê şah undake,

Xezna padşa undake,  
Tek cahiltiya nûr-neder  
Unda neke, nede der  
Ü mina min bê guman  
Wek nexweşê bê derman  
Nenihêre pala çiyê  
Xas-xanima kurmanciyê.

Sala 1984-a helbesta xwe ya Helala Xwe Ra bi keser wa dinivîse:

Ü niha wextê ez wa bêsehet  
Dinalim nava telî-tengasyê  
Bîra te kirye min usa dil-ced  
Bîra xemxurya teyc kinêzyê.  
Ez geleka va halim girêdan,  
Dilê te êşand min nezan-nezan,  
Lê axir min dît ya here amin,  
Ya here bedew ew tu yî, dîsa.

Mirov vê helbestê dixwîne û ji kilama Evdalê Zeynikê ev xetana têñ bîra mirov:

Meriv ku çeka xelkê lixweke, ro û dan e,  
Meriv ku hespa xelkê sîyar be, yek meydan e,  
Meriv ku maşoqê jina xelkê be, yek ramûsan e,  
Mîna malekê, ku meriv şevekê lê bive mîvan e.

Parek helbestên Fêrikê Üsiv yê mezin dîyarî ne, ku wî diyarî dê, bav-bira, zarok. heval û pismamên xwe kirye. Ewan cfrandinê şexsiye fikirtenge sade yan jî sîyasetê va girêdayî nîn

in, çawa ku cem gelek helbestvana hene. Ji wan helbestên Fêrik her yek bi fikir û sercema xwe ya kûr va efrandineke giranbihaye nemire.

Dayîk rem û edlaya cihan ye, dayîk kana hubê û dilovanyê ye, dayîk welat e, gel e, dayîk tendûra malê ye, germ e, dora kîjanê ewlad tê, dicivin. Ewlad ji sur-seqêmên jîyanê qufîlî delê xwe li ber wê tendûrê germ dikin. "Yazix, tendûr jî rind tîmê nade, çaxê bi destê dê nayê dadan."

Çi xwes hatye gotin. Bav şîrin e, qewat e, qidûm e, guman-bawerî, hurmet û rûmeta ewleda ne. Law çav didin bavê. Bav seva ewleda mînak e.

Kêye giranbiha, kêye şîrin: bav yan dê?-helbestvan pîrsê dide û li nava çend xetê tima yê sade da digihîje bersîvîcke felsefa kûr:

Dinhêrim ez dayîka xwe.

Dinhêrim ez bavê xwe,

"Kîjan baş e, kî biha ye û delalfî?"

Ez mîl dibim ha vî alî,

Ez mîl dibim ha wî alî,

Usa teyr-tû wextê şîrê, bi firqaskî,

Ha mîl dibe ser vî baskî,

Ha mîl dibe ser wî baskî.

Heqîyc, eger, evd yekî ji wan baska zû unda dike, jîana wî tim di alîkî da dikule.

Helbestên: Birayê Min Hemo Ra, Firîca Baltûza Min Ra, Mêlsîkê Apê Memlî Ra, Mîkayêlê Reşît Ra, Helala Min Ra, Qîza Min Ra, cêrga helbestan ku dîyariyî zanyarê mezin Hecîyê Cindî kirye û gelek esrandinê wî yê vî tcherî nevsâ evdêñ helal, ciwamêr, welatparêz, rem, xebathiz, evdêñ bi rûmet û maqûl

nitirandîye. Fêrîkê Ûsiv him zavê Hecîyê Cindî bû him ji pismamtiya wan hebû.

Kê pirî hindikî haj kar û barê zanyarê mezin hebû, ew nas dikir, xeysetê wî yê xebathiz, maqûl, welatparêz, milahîm dîtibû, tê derdixe, ku helbestvan hostatîke çiqas mezin şexsyeta wî li nava çend xetên helbesta xwe da daye.

Helbesta, ku ji bo 70 salya H. Cindî nivîsiye wa dibêje. Helbest usa ne, ku nayê perçekirin, ji bo wê ji mecbûr temamya helbestê tînim:

Ew kî dibêje hevtê salî me,  
Min xitim kirye deh û du sî,  
Ew "hevtê-mevtê" kê lihev ankiye  
    Û li min kirye xewna Qazî.  
    Îdî "hobêlyar", îdî "emekdar",  
    Îdî "aqilbend", "kana ulma",  
    Îdî "nivîskar", "doktor" û "dersdar",  
    Nizanim ci û ci. na qurba, na.  
Kengê min heftê berevok çêkir,  
    heftê cildê xurt xurû çîrok,  
    Heftê serhafî-beyt jî ber lê kir,  
    Heftê cild kilam, heftê dîrok,  
    Heftê lawijok, heftê nivêjok,  
    Heftê qelîbotk, heftê qcwilîk,  
    Heftê metelok, heftê zûbêjok,  
    Heftê bend beytê "Ker û Kulik",  
    Heftê berevok kilamê şînê,  
    Heftê yê şayê, xêr û xweşyê,  
    Heftê varyantê "Memê û Zînê",  
    Heftê yê "Sîyabend û Xeca Zerîn",  
    "Ûsivê Nevyâ", "Ûsiv û Xezal",

Ya "Zembîlfiroş", "Xanê Çengzêrîn",  
 Ü heftê şaxê "Rostemî Zal".  
 Heftê kitêbê şîer û poêma,  
 Heftê ferhengok, xebernema,  
 Hestê yê dersa, heftê yê ulma,  
 Ü heftê kitêb ji yê tercima.  
 Ü Xwedê ku hat hewara heftê  
 Ü du mîleta, û me jî tev,  
 Ü min nivîsî heftê "Hewarî",  
 Heftê romanê baş û bedew,  
 Hingê heyranno, heftê salî na,  
 Hiz dîkin bêjin-sed û heftê,  
 Hingê qurbanno, ez jî tevî we  
 Çi bêjî bejna sîyarê min tê.

Dilê şayîr pir nazik bû. Gelek tişt, ku mirovên sade texmîn nedikirin wî tê derdixist, ber xwe diket, zû dixeyîdî, nerazîbûna wî jî zû dîhar dibû. Zû xwe ra nexwaz çê dikirin. Dirûtî, zimanpenî li cem tunc bû. Gazin bû ji civata bûrokrat, ji "zagon" û "qanûnên" dewleta Sovêtê yê çewt, ji miletçîfîya der dora, hevalên perehîz, civaka ji ruşet, dizî, qavî û nerindîyê lewitî.

Civaka kurde rewşenbîr jî paqîj nî bû. Şayîr ji wê civakê pir bi gazin bû û gazinê xwe jî venedişart. Helbestêن Kalê û Ezrahîl, Rûvî û Dîk, Filankes, Gernefisa Ra, Zêndî Şêrê Şayîre Mirî Ser Navê Xwc Neşir Kirye û gelekê din da derheqa wan "şayîr", "nivîskar" û "rewşenbira" da dinivîse, ku ketibûn nava wê civakê, cîyê sereke girtibûn û xêncî zîyanê tu kar nedane pêşdaçûna çanda me. Rastî jî rûyê wan da bû ku edebyeta me, ew gavê mezin, ku karibû bavêje, navît. Gelek efrandarêñ eslî bûn qurbana karêñ wanî reş.

Li nava vê xiringêlê da eger stûneke piştovanyê tune bûya

helbestvanê pir seqîr bûya. Ew stûn jî Fêrikê ÛSIV ra bi texmîna min Hecyê Cindî bû.

Fêrikê Ûsiv hevalti pir nedikir, dibûrî bû, zû nêzîkî hevalan nedibû, hevkî jî bi stirû bû. Lê dema em helbestên wî dixûnin, ku ew xeyset tek rûva ne, bin da ruhekî nazik e, dilekî remî tije mirovhitze. Mînakeke delal helbesta wî ye, ku dîyarî bîranîna helbestvanê hizkirî Mîkayêlê Reşît kirye. Emir da navbera wan, hevaltiya wan ewqas jî germ nî bû. Lê helbest diyarı Mîkayêlê Reşît da wa dibêje:

Emir da aqas jî dil û ced,  
Me şorya hevaltiyê nekir,  
Lê tim jî, lê tim jî bi hisret,  
Min mîla xeysetê te dikir.  
Min nava mitalê xwe nûr da,  
Li taxek Pampa xwe hizkirî,  
Çê dikir ji te ra zef zû da  
Tamekî tûfînî kilskirî.  
Wî gundê bedewî, bilinci  
Em diçûn sersal û eydê hev,  
Û li ser kulavê kurmancî  
Guh dida me şîer û beytê hev.

\* \* \*

Li nav nivîskarêñ Kurdêñ Sovêtê da Fêrikê Ûsiv hostê nivîsara destana bû. Salê başqe-başqe destanên wî. Ûsivê Nevya, Xewna Mîrmih, Hisret, Hubê Xwedêhiz, Heja Hêle, Dewatyê Dîlbend, Rihana Reşo, Rizayê Kurmet neşir bûnc.

Naveroka destanên Ûsivê Nevya, Xewna Mîrmih û Ilurê Xwedê Hiz ji zargotina gel hildaye.

Ji salêñ sîhî da girtî gelek nivîskarêñ Kurdêñ sovyêtê dest

avîtine zargotina gel û çîrok-destanê gelêriye wek Mem û Zîn, Ker û Kulik, Zembîlfiroş, Memê û Eyşê, Xecê û Siyabend û gelekên din wa gotî veçêkirine. Lê bi heqî, cem tu kesî, xêncî F. Ûsiv nehatye standin. Wan ra li hev nehatye li ser hîmê wan karibin efrandineke usa çêkin, ku bi hêza xwe hema nêzîkî varîyanta zargotinê be.

Fêrîkê Ûsiv ruh, reng û rewşike nû da çîrokên jorgotî. Her sê efrandin ji bi pirs û pirsgirêkên xwe alyê felsefê, bedewnîgaryê, helaqetyê navbera mirova da gelekî kûr, dijwar û pirqet in.

Destanê Dewatyê Dilbend, Rihana Reşo, Rizayê Kurmet tiragedyayêن biçûk in. Hersêk jî bûyerên rastî ne ji emrê êla Sîpka.

Sala 1920-î leşkerêne Roma reşe zulm têne digîhîjne çiyayê Elegezê, gundêne fîzdîyan. Bîranînen bi qetil-qan, xûn, kuştin û mirin ji pey xwe hîştin. Helbestvan bûyareke tiragîk ji wan qewimandinêneq nelet hildaye digîhîjye tomerîbûn û kurbûneke fikirdarî û felsefiye bilind.

Simkoyê Bavik, ku ji kuştinê xilaz be rûreşyê tîne rûyê xwe, destûrê dide, ku jina wî "Padşayê Tirk ra qulix bike hetanî sibê."

Destana din ya Rihana Reşo da leşkerê Tirk dergîstiyê Rihana keça Reşo, Rihana bedew dîl digrin dibin. Pey ra Rihanê didine lawê apê wê. Lê kurap dayka xwe va Rihanê têne xezevê, ji malê derdixin. Dilê xûşka Rihanê ser xûşkê dêşe. Ew jî zara nayne. Rikanî kurap va, bi rezadilî, radibe Rihana xûşka xwe dibc xwe ra dike hewî. Lê zûtirekê kumreşî xûşka "xûşkhîz" ji kor dike, hizkirna ku berê di dilê xûşkê da hebû, dikuje. Rihana bêbext vê carê alyê xûşkê va tê zêrandin, dawyê da Rihan xwe dixeniqîne.

Rizayê Kurmet: Dema mala bavê helbestvan sala 1917-a ji Qersê direvin, leşkerê Tirk meta wî, zilamê wê û keça wan va digrin. Zilam dikujin. Kurdekî bi navê Hesenîkê Şemeldanî metê

xwe ra dibe. Xezala met dibe "kevanîka Hesenîkê Şemeldanî".

Sal derbaz dibin, sûr û sînorê dewleta dikevin avbera xûşk û bira. Bîra nizanin çi hate serê xûşkê. Xezal malbavana bîra nake:

Ez Xezal im, êzdîya Sîpkî,  
Qîza Îvo,  
Xûşka Hesen,  
Xûşka Ûsiv,  
Kevanîka Hesenîkê Şemildanî,  
Sînorçîyo ez bextê te me  
Tuyê cawekê min ra bînî  
Hesen sax e,  
Ûsiv sax e,  
Kidê sax e  
Gelo qet wan dera nakin  
Pirsa halê xweyînga xwe?

Alyê hidûdî din ji xûşk-bira dikewgirin derheqa Xezala xwe ya undakirî da. Gelek sal paşê, ji pey mirina wan ra lawê Xezalê Riza tê welatê Sovêtê mîvanya xalana. Tê, wan dibîne, axê ji mezelê dê tîne dike li ser mezelê xalê, axa mezelê xalê jî dive ku bike li ser gora Xezala xerîb. Riza vedigere, rojekê jî cawa nebxêr malxalana ra tê:

Reş girêda xalojna pîr  
Xalana kir şîn û girî,  
Bi edetê êl û eşîr  
Cînar hatin serxweşya wan.  
Çi bi Riza hat, -ji hev pirsîn-  
Bi wî mîrê sip-silamet,  
Nexweşyê mir yan bi qezyê

Yanê kete tora nemerd?  
Kî dizane sîyasete-  
Setya mixenete mexsûs,  
Dibe mîrkê bê zîyan-zede  
Hesibandin çawa cesûs.

Destanên Fêrîkê Ûsiv gîşk jî serketî ne û dewlemendiya edebyeta gelê Kurd in.

Xebera beşa nivîskarên Kurd, ya rex yekîtiya nivîskarên Ermenistanê, û Şêwra rewşenbirên Kurd da, ku ji bo wesceta Fêrîkê Ûsiv rojnema RYA TEZE da neşir bûye wa hatye nivîsar:

"Poêmêd wî ye Ûsivê Nevyâ, Rihana Reşo, Xewna Mîrmih, Hsret û yêd mayîn ne ku tenê sertacê efrandinê wî ne, lê usa ji merî dikare wan dayne rex MEM Ú ZÎNA Ahmedê Xanî. "

\* \* \*

Eva tek gerekc kin bû, bîranîneke xweş li nav rong-ewaz, nexş-nîgarê baxçê helbestvan da. Borcekî min bû li ber bîranîna wî evdî, kîjanî ra devedevî 25-30 salî, min hevaltî û pismamtí kirye, em tev çûno-hatine.

Ez bawer im, jîyana Fêrîkê Ûsiv çawa helbestvanê gelê Kurd wê nû dest pê bive. Gelê hela nû qîmetê bide berhemên ewledê xweyî hêja.

\* \* \*

Xwedê xirav bike xerîbyê, destê mirov bira-pismam, heval-hogîra, heta erd û esmanê hizkirî jî diqete. Ji wefetbûna Fêrîkê Ûsiv çar meh şûnda, berêvarckê ew cawa dilêş gîhîste min. Wê şevê ez ranezam. Ketme paşla xem û bîranînen buhuri. Emirê

çûyi, rojêن derbazbûyî hatine bîra min: malbata Kurdêن Ermenistanê ya rewşenbiri, telayi û şîrnayî, hisret û bîranin. Rojnema RYA TEZE, RADYOYA XEBERDANÊ KURDÎ. Rasthatin, helaqetyên me: êvarya nivîskaran, lênhêrîna pirtûkên nû nivîsi, şevêن şayê, sazbendîyê, hobêlyan, eyda. Her rewşenbirekî me şexsyetek bû. "ji her kulîlkekê bînek dihat". Kê derheqa rojêن wa da difikirî? Kê bawer dikir, ku jîyan wa sersêri kerê bê welgerandin? Qedera evd destê wî da nîn e. Me ji bo peyveke "ne cîyê xwe da", seva xeteke "sist" yan fikireke "nerasi" qırka hev digirt, ji hev dixeyîdîn. Lê pey ra, roja din odêن rojnema RYA TEZE yê xebatê, yan xeberdanêن Radyoya Kurdî, para kurdzanyê yan mala nivîskarêن Ermenistanê da, yan qawexanekê da em dihatin li cem hev.

Fêrik pir nedihat xanê, gund da dişxûlî, lê ji êvarya nedima. Helbest xweş dixwendin. Helbesta wî ya hizkirî, ku timê eyda û êvarya da dixwend, helbesta MISTEFA BARZANÎ RA bû.

Xwendina helbestan min bi gelek ziinanen him ji devê helbestvana, him jî ji devê aktorên bi nav û deng bihîstiye. xwendina Fêrik ji ya wan kêmter nî bû. Dengekî xweş lê bû. Degme distira lê xweş distira. Min ra li hev hatyc sitirana wî him şaya, him jî şina da bibihêm.

Hamoyê birayê wi çûbû li ber rema Xwedê. Ez jî çûbûm hewaryê. Dema Fêrik stîra, biraو kir, îskîn kete hazırla û destmal bê hemdê xwe birin ber çavê hêşir. Qeya-zinarê çiyayê Dibûr, wekî dilê wan hebûya dijwar bikaribûna hêşirê xwe zevtken.

Ez û Fêrik hevalne pir nêzîk nî bûn, lê hev femkirin û hevgirêdaneke hest û ruhî li navbera me da hebû.

Qet ji bîra min naçe. Havîn bû. Çûbûme gundê me, Qundesazê. Ji wura jî bi kerekî çûme Pampê, mala Fêrik. Li navbera gundê me û Pampê da 4-5 km e.

Demeke dirêj bû, ji xwe ra li gund xanî çêdikir. Min ra pir

cara derheqa xanî da gili kiribû. Lê çâ gel dibêje: "Carek dîtin çêtir e ji hezar car bihîstîn". Xanîyê wî yê bi kevirê tûfa sor hema tenîsta girê li rex gund da çê bûbû. Xanî qul bi qul nişanî min da, derheqa her kevirekî, derî û pencerekî, dîwarekî da hûr-hûr gili kir. Çima pencere li ser wî dîwarî yc, li ser yê din nîn e, çima derî usa çêkirye, ciyê sobê û tendûrê. Dema şebeqê ro nû dertê û êvarê diçe ava li wur va çawe tê xanê. Tişte herî balkêş axil bû. Hema dîwarê tam va li palê axilekî mezini-merdane çêkiribû. Sûreke bi kevirê tûfa sor kişandibû dorê. Di axil da hezar pez cî dibû.

-Fêrik, ev axila seva çiye?- min ecêvmayî jî pirsî. Ewî helbesteke nû nivîsî jî min ra xwend:

Min çê kirin ev tam-taşê tûşîn,  
Li dorê kişand sûreke mitîn.  
Û çawa pez hiz, çawa kurdê çiya,  
Axilek ava kir min li sirtê çiya.  
Ser şaneşin û şenlikê min ra,  
Salê bifirin mîna sîmira  
Û wextekê jî du rêneber wê bêñ,  
Xwe bidin ber siya axlê minî şen:  
"Hey gidî, -bêjin,- Fêrikê remetî,  
Ser van tam-taşa çiqas zemet dî."

Rastî jî sal mîna teyrê sîmir fîryan û iro ez bi keser bîr tînim: "Hey gidî dinya, Fêrikê remetî, ser van helbest-destana çiqas zemet dî."

Salê dawyê timê min ra têlêfon vedikir. Lawê min radihîş têlêfonê û zû tetik dida min:

- Apê Fêrike.
- Çawa zanî, ku apê Fêrike?

- Ew timê dibêjc: "Kuro bavê te li male!"

Êdî min tê derdixist ew li Yêrêvanê ye, dixwaze em berêvarê rastî hev bêñ. Cîyê rasthatina me Sîsernakabêrd bû. Li bajarê Yêrêvanê, pêjber ew mehela mala wî lê bû girekî bi wî navî heye. Wergera wî navîyî kurmançî Kela Dûmeqeskê ye. Wî girî çîma ew nav standiye, nizanîm. Gir hela dawya salê şestî da kirine baxçê-seyrangehekî bedew. Binatarê, alyê bakûr gelyê Zengûyeyî kûre, têra çemî bi wî navî jî dikşe. Ber çêm stadyona fûtbolê ya mezin e, ew pir bedewe û bi cûrê nûjen hatye çêkirin. Alyê girî din daristan e. Lê jorê, li nav baxçen kulîlk û darêñ bedew da heykelê gênosidê ber bi esmîn bilind dibe. Heykel bawarkî ji her alyê bajêr va tê xanê. Ev heykel ji bo bîranîna wan şihîdên Ermenya hatyc çêkirin, ku ji alyê dewleta Tirk va salêñ 1914-1920-î hatin qetilkirin.

Em tim li wî baxçeyî rastî hev dihatin. Derheqa esrandinêñ nû nivîsandî da gîlî dikir, helbestêñ nû dixwend. Carna temamya naveroka axaftina me nimûneke zargotinê bû. Min tê derdixist, ku ew ser wê dixebite. Di derheqa çêkirina xanîyê xwe da diaxivî. "Karekî dijwar e, giran e. Lê hewasa min pêra tê. Ez dema ser xanî kar dikim, bi dil û ruh rehet dibim, kul-derdê jîyanê, dewranê, tişte neqenc ji bîra min diçin. Evdêñ sinetçî, xebatçî helal in, rem in, heyf in,-digot."

Tim ji dinê, jîyanê xeyîdî bû. Gazin bû ji heval pismamêñ ace qulixhiz, perehîz, cînarêñ miletçî, nivîskarêñ bêşurete "şêr diz", "qanûn û zagonêñ" dewleta Sovêtîcye nerast.

Wextekê, pir bi derheqa Sivêtayê, wê pîreka kurda ji bajare Tilbîsê da diaxivî. Ew kûr ketibû dilê helbestvan. Eger wê Sivêtayê jî hestê wî femkira, agirê evîna paqije bedew dilê wê jî bigirta dibe di jîyana şayîr da guhestinêñ bingehîn çê bûna. Tim gazin bû, ku vê dewra perehîz da kes qedirê huba esil nizanê.

Carêkê wî baxçeyî da cm li ser kursîki rûniştibûn. Li ber me

mergeke kulîrka bû. Ew bi nexşen pir hewaskar, bi kulîlkê cûrbicûr û reng-rengî hatibû li hev anîn, hûnandin. Demekê wî ker li nexş, kulîlka û renga nihêri û got:

- Esko (ji min ra usa digot) em herd jî baçevan in. Em jî bi kulîlka nexşê wa çê dikin. Kulîlkê min hevkî qewî ne, sert in, yê te pir nazik in. Mirov newêre destê xwe bidê. Nişkêva şextek hebe kulîlkê te yê zû biçilmisin.

Paşê xwe bi xwe fikira xwc tomerî kir: "Eh, bira seva kulîlkê xwe ber xwe nekeve. Şextê dayê kulîlkê qewî jî, nazik jî li ber teyax nakin. Eger welat hebe, dewlet hebe, gelê kulîlkê xwe xweyî derkeve, tunebe kes jî me bir nayne."

Vê dawyê nexweş bû. Nexweşya şekir pê ra hebû. Ji çavê xwe gazin bû, digot lingê min dêşin.

Dinya li hev ket. Destê me teva ji hev qetya. Wê şevê, tenê, li devê xem û xiyalên xerîbyê da, tevî hest û bîranmîn xwe rûniştibûm, xewa min nedihat. Dilê min dişcîvitî, ev xetên serxweşyê çê dibûn. Lê serxweşî kê ra? Evdê bêñ û herin lê Kurdistana me û gelê meyê hebin! Bira gelê me xweş be.

## SERXWEŞYA MIN

Ji bo biranîna Fêrikê Ûsiv  
Keserêñ tel hêşira da şil bûne, wex,  
Giran bûne vê êvarê ser dilê min,  
Caw anîne, cawa nebixer, cawa dilêş,  
Wefet kirye helbestvanê meyî mezin.  
  
Ew ji xwîna Cizîri bû, ji malbeta Feqîyê Teyran,  
Qewalekî Lalişê bû, pêşîmamê helbestvana,  
Dewrêsekî Zerdeşti bû, çîrokbej bû,  
Ku bang dida ji kûraya dewr-zemana.  
Pala çiyayê Elegezê êla kurdan

Em heval bûn, em hogir bûn, hev ra bira,  
Çi ferman bû li me rabû? Kê zanibû  
Wekî iro ewê wur be, ez li vira.  
Xem û xiyal, hisret-hesîn û bîranîn,  
Hev ketine mîna lêya der biharê,  
Li nav wan da rûniştme tenê, melûl,  
Hêsirin tek çavê min ra têne xarê.  
Ne kes dengê min dibihê, ne jî rê ye,  
Wekî rabim, berêx bidim Pampa wêran,  
Xwedê bira xirav bike vê xerîbyê,  
Vê rev-bezê,vê qedera meye giran.  
Wî Pampê da xwe ra koşk û sera çê kir,  
Bengî bû ser: tucar nehîst Pampa xwe dê,  
Pampê da jî ew bû heykel, ew bû kilam  
Helbestvanê gelê xweyi heta hetê.  
Ezê işev xwe bavêjim li ber bextê  
Van teyreda, bira nekin, minet,qisûr,  
Dilê minî tije hêsir baskê xwe kin,  
Bivin pala Elegezê, tepê Dibûr.  
Serxweşya min bidin koma Êzdîxanê,  
Û ramûsin destê daykê meye şîrin,  
Bira ewan kilamekê bavêjin ser  
Fêrikê me,halê Kurda, xerîbya min.  
Xem û xiyal, hisret-hesîn vê êvarê  
Hev cîvyane, giran bûne ser dilê min,  
Caw anînc, cawa nebû, cawa dilêş,  
Wefat kiryc helbestvanê meyî mezin.

10.09.1997

# TÊATROYA KURDA YA ELEGEZÊ



*Dimonêk û "Mem û Zin", Di salavê  
Memê de Bekare Mitho, di ye Ezne  
de Nâsimî Ayrazyan.*

Salên dema Sovyêtê, li nav çand û kultûra gelê Kurd, ji welêt dûr, gelek cirayên ronayîyê û pêşdaçûyînê hatine vêxistin. Ji wan yek jî têatro bû.

Sala 1937 - an, bi qirara hukumata Komara Ermenistanê, li merkeza nehya Egezê, li gundê Kurdên êzdî yê Elegezê (Camûşvana Mezin), Têatiroya Kurda ya dewletê hate demzirandin.

Dewleta Sovyêtîyê, hema di salênxwe yên ewlin da, weke gelên din yên biçûk yen li komarêni Pişkavkazê dijyan, ji gelê me ra jî mecalê pêşdaçûyînê vekir.

Dew û dozêni wan salan ku navbera Tirk, Rûs û Ermenya da hebûn halê kurdên wê navçê pir xirav kiribûn. Kurdên êzdî yên Surmelyê, Qersê, Wanê hatibûn qirê, koçber û malwêran bûbûn. Lîşkerên Tirkan û alayên Hemîdayî hatibûn derketibûn êla Elegezê jî, gund û şenêni wê heremê jî talan û wêran kiribûn, bi sedan mîrêni wan gundan kom kiribûn, kuştibûn, hêsîr biribûn, koka wan anîbûn.

Talan, xelayê, nexweşa hal di xelkê da nehiştibûn. Hatinâ desthilatdarya Sovyêtê jiyanekê nû ji wê para Kurda ra jî anî. Gel ji anarşiyê, qir û birêni zordestya olî, serekeşîr û serok rîbazên dîni xilaz bûbûn. Lî xelk nexwendî, şûndamayı bû. Jîyana koçerye û nîvkoçeryê dimeşand, pak haj ji çûyîn, hatin, bûyarêni cihanê tunebû.

Eger di nava gelê Ermenî hesavêni evdêni xwendî ji sedî digihîste bîstî, di nava kurdên wê heremê da nedigihîste yekî jî.

Raste destpêka vê sedsalê da, li sê gundêni Kurdên êzdî yên qezayêni di bin desthiletdarya Împératorya Rûsyayê da dibistanêni bi zimanê rûsi ji bo zarokêni Kurdan vebûn Qundexsaz li navça Elegezê, Zor li Surmelyê, Bacurlû li Qersê. Lî emrê wan dibistanan dirêj nekişand û bandora

wan li ser pêşdaçûyînê ewqas nehate kivşê.

Eyan bû, ku ji bo pêşdaçûyîna Kurdên Pişkavkazê pirobilêma here mezin hildana nexwendîtyê bû. Di vê pirsê da ewlede gelê dost, ermenya, alîkarîke pir mezin dane wê beşa gelê me. Gelek xwendevanê Ermenî, ku kurmancî zanibûn ketine li nav wê tevgerê, vî karê kêrhatî.

Ji bo dibistanêngundêngurdan, di sala 1921 – ê da kitêba dersê ŞEMS hate weşandin. Ev kitêb, ku bi herfêngermenî, lê bi zimanê kurdî, zaravê kurmancî hatibû nivîsin., ji Kurdêngwêheremêra bû kitêba destpêkê, ku pê hînîxwendin û nivîsandinê bûn. Alfabêya Kurdi, li ser girafika herfêngermenî hatibû çekirin. Kitêb ji alyê zimanzan û pisporê çanda kurdî, dost û pismamê gelê me, ewledê gelê Ermenî Lazo (Hakob Xazaryan) hatibû hazirkirin..

Bi vê kitêbê, di wextekî kin da mamoste hatine hazirkirin û di gundêngurdan da dibistan vebûn. Mamostayê wan yêne wulin hemî Ermenî bûn.

Me berê jî got, ku bûyarêngalêng 1918 – 1920 – i zîyane pir mezin dabûn kurdêngwêheremê. Qers û Surmelî û gelek deverêngku binelyêng hîmlî Kurd bûn ketin bin destêng Tirkan. Neyarêngurdan nakokyêng eudetya olê dane kêranîn û kutdêngmusulman - êzdî rakirin dijî hev. Qira Ezdiyêngwêheremê hat. Sêwîxanê Ermenistanê, kûçêng bajarêng Komara Gurcistanê Tilbisê, Têlavê, Batimê tije zarokêng Ezdiyan yêng sêwî û bêxweyî bûn.

Di sala 1922 – an da Lazo dije bajarê Tilbisê, bi însiatîva wî û çend rewşembirêngurdan, hukumata Gurcistanê, ya li bajarê Tilbisê ji bo zarokêngurdan dibistana jimara 103 vedke. Li vê derê zarok hînî kar dikirin û wan him dixwend û him jî radizan. Lazo li wir 60 zarokêng Ezdiyan kom dike. Ew di dibistanê da dersê

zimanê Kurdî, lê pîreka wî dersên zimanê Ermenî dide.

Bi kitêba ŞEMS çawa di wê dibistanê da usan jî gundêñ kurda yên Ermenistanê da gelek zarokêñ Kurd hînî xwendin – nivîsarê bûn. Ji wan gelek paşê bûne kadrêñ bi nav û deng. Ji wan zaneyên mezin yên wek Qanatê Kurdo, Çetkez Bakayêv, nivîskar û berpirsyarê rojnema RÎYA TEZE yê ewlin Cerdoyê Gêneo, Mêrxwesê Yekîtya Soyêtê Semend Siyabendov û gelekêñ din derketin.

Xwendevanêñ Kurdêñ Ermenistanê û Gurcistanê yên wê demê, tu bawar bikî tev jî bi wê kitêbê hatine perwerdekirin û tevan jî paşê karê Lazo, wek karekî giranbiha dihesibandin.

Lazo tevî komek rewşembirêñ Kurd. di nav karkirêñ Kurdêñ bajêrê Tilbisê da jî karekî kultûri yê hêja dikir. Wî, Ahmedê Mîrazi, û çend rewşembirêñ din, li kilûba ser navê Lûkaşin, ya bajarê Tilbisê da êvaryêñ kultûri, pêşandanêñ têatroya çê dikirin, doklad bi têmêñ cihê – cihê dixwendin.

Di nava Kurden Tilbisê da, wê demê nivîskar Ahmedê Mîrazi karekî berbiçev dikir. Nivîskarê bi şuret rola tiatroyê di pêşdabirin û perwerdekirina gel da gelek bi qîmet didît. Texmîn dikir, ku ji bo gelê nexwendî serwext bikin, divê zêndî jê ra biaxivin, zîyan û xeterêñ erf edetên kevn û bêkêr bi têatroyê nişanî wan bidin.

Ew koma têatroyê çê dike, ji bo komê şanoyan dinivîse, rêjîsoryê û akyoryê dike. Gelek bi pesin derheqa şanoya wî DEMA DERBASBÛYÎ da tê bîranîn. Tê gotin ku wê şanoyê hukumekî mezin li ser temâşevana dihişt. Naveroka şnoyê ji jîyana kurdêñ Bazidê hatibû hildan, angó li ku nivîskar ji dayka xwe bûbû, zarotî, xortanya xwe derbaz kiribû, xwendibû.

Koma şanoyê usan jî şanoyêñ Lazo yên bi navêñ

GUSTÎL û QELEN listin.

Di jîyana Kurda da, çêkirina alfabe, ya nû bûyareke mezin bû. Di sala 1928 – an da, bi biryara hukumata Erenistanê, Î. Mêrangûlov û Erebê Şemo li ser hîmî elfabêya latînî, alfabêya Kurdî çê kirin. Di sala 1930 – î beşa nivîskarên Kurd li rex Yekîtya Nivîskarên Ermenistanê tê demezirandin. Dest bi weşandina pirtûkên bi zimanê Kurdî bûn. Wê demê jî şanoyên ewlin jî hatin weşandin. Sala 1934 – an şanoya Hecîyê Cindî ya QUTIYA DÛ – DERMANAN, sala 1935 – an şanoya Ahmedê Mîrazî ZIMANÊ ÇÎYA û ya Wezîrê Nadîrî bi navê REVA JINÊ hatine weşendin.

Pêşdahatina wan şanoyan di jîyana Kurdên Pişkavkazê da pêşdaçûyîna mezin bû. Wê demê komên şanoyê yê xwe efrandinêye biçük hebûn û têkstan usa wan ra pir pêwûst bûn.

Pirofêstor Hecîyê Cindî qîmetekî bilind dida şanoya Wezîrê Nadîrî ya REVA JINÊ û bîr tîne, ku ew esrandinan, ji alyê xwendevan û dersdarên têxnîkûma dersdarhazirkirnê ya kurdîye bajarê Yêrêvanê dihate listin. Ew tim li ber temâsevanê Yêrêvanê û gundên Kurdan derdiketin. Şano ji alyê temâsevana va rind dihate qebûlbûn.

Hêjayî gotinê ye, ku di werê şanogeryê da alîkarya rewşembirên êrmenî mezin bû. Sala 1926 – an hîmdareki sincaya Ermenistanê Hamo Bêk Nazarov dest bi çêkirina filmeke bedewetyê kir. Naveroka wê ji jîyana Kurdên Ezdi hatibû hildan. Film ser hîmî kurdeçiroka Lazo ya bi navê Zerê hate kişandin. Serecema filmê jîyana koçeran, erf edetên wan, deb û tirajêdyâ keça Ezdi Zerê ye. Ew li zozanê Elegezê, warê Kurdan hatye kişandin. Dilqa da aktyorên Ermenyan, yêñ here bijare û bi nav û deng dilîstin.

Film, ewlî bêdeng bû. Vê dewyê film kirin bi deng. Bêtir 75 sal ji pey kişandina filmê ra derbaz bûye, lê saya naveroka xwe ya aktûal û listika aktyoran ya bêqisûr, hewaskarya xwe wunda nekirye û niha jî bi hizkîrin tê temaşekirin. Ew bi heqî dikeve li nav fonda sînema Ermenistanê, ya zêrîn.

Awa, li ser wî hîmî, di sala 1937 – an, li gundê kurda: Elegezê Têatiroya Kurdi ya Dewletê hate demezirandin.

Serokê têatiroyê yê ewlin, binelyê gundê Qundexsazê (niha Riya Teze ), nehya Elegezê Celatê Koto, rîjîsyor Solak Nîkoxosyan, serokê para bedewetyê aktyorê ermenî, yê bi nav û deng Mikirtîç Canan hatine kivşkirin.

Bi rast gotî têatiroya Kurdi cîyê vala hatibû demezirandin. Ne kadroyên netewî, yên zane, ne şanogerên pispor, û ne jî şanoyên pirî - hindikî baş hebûn. Hema ji rojêne demezirandina têatroyê yê ewlin da nivîskar, zana û pisporê şanogerya Ermenîstanê alîkarya mezin danc kolêktîva nû.

Listikvanê têatroyê yên ewlin, ji nava keç – xorôtê gunda, ên Kurdêne nehya Elegezê (Qundexsaz, Elegez, Mîrek; Pampa Kurda, Cercerîs, Qurubxaz, Çobangermes, Senger, Korbilax, Karvabsere, Camîslû ) hatine bijartîn.

Aktyorêne bijartî, him ji mirovên sade, yên bi xwendîna nimz û navîn bûn. Hinek jî wan qet haj şanogeryê û têatroyê tune bûn. Loma jî salêñ ewlin ji bo kolêktîvê salêñ lêgerîn, hînbûn û gîhîştina pîsporya şanogeryê bûn.

Wan salan nivîskar û şanogerên Ermenî li ser hîmê zargotin û jîyana Kurdan geleç şano ji têatroya cîwan ra hazir kirin. Hinek ji wan evin: “Keça Mîrekê”, “Ker û Kulik”, “Heso” (S. Gînosyan), “Xuliqandina Rojê” ( S. Kojoyan), “Kenerê Elegezê” (V. Şoxêryan), “Nêçîra Lalvarê”

(V. Manvêlyan) û hinekêن mayîn.

Alîkarya dewletê ji hebû. Lîstikvan û xebatçiyêن têatroyê mîna karkirêن hemû têatroyêن wclêt yên dewletê, ji dewletê maş distandin. Sanoyêن ji bo têatroyêن dihatin nivîsar alyê dewletê va dihatin kirîn, yanê diramatûrga (şanonivîsa) ji bo şanoya xwe dirav distand. Pisporêن şanpgerya Ermenyan tim dibûnc mîyanêن têatroyê, ji bo bilindkirina dereca lîstikvana /aktyora/ sêmînar çê dikirin, kûrsên hînbûnê vedikirin.

Têatro di nav jîyana wê para Kutda da bûyareke nû bû, ji alyê temâsevana va bi hewaskarî û hizkirin dihat qebûlbûn. Şedê wê demê gilî dikan, ku hewaskarya temâsevanan usan pir bû, ku dema nîsandana sipêktatla hundurê salonê da cî têra xelkê nedikir, zarokêن biçûk girtî hetâ rîspyan hildîşyanc serayê.

Dîrokñas û zanyarekî şanogerya Ermenyan H. Hovakîmyan, di pirtûka xwe ya bi navê “ Ji Dîroka Têatroyê Azeryan û Kurdan yên Ermenistanê ” da wa dinivîse: Têatroya Kurda ya Dewletê di nava pênc salêñ xwe yên ewlin da gihişte destanînên efrandaryê, yên hêja, bû merkezeke kultûrî.” Di nav wan salan da gelek ji wan lîstekvanêñ gênce sade gihiştin destanînên efrandaryê yên hêja, gihiştin bilindaya aktyorêñ pirofêsyonal. Wam êdî karibûn bi dereca bedewetyê ya bilind dilqa da bilîzin, bikevin li nav kûraya fikir û puhêñ dilqan û bala temâsevana bikşînin li ser xwe.

Rojneme û kovarêñ Ermenistanê yên wê demê, di rûpelêñ xwe da gelek miqale û gotar derheqa têatroya Kurdan da weşandine û qîmetê hêja dane lîstika aktyorêñ wê.

Di sala 1939 – an rojnema Somara Ermenistanê ya sereke “ Sovêtakan Hayastan” dinivîse: “ Şanoya KEÇA MÎREKÊ

pir hewaskar bû. Bi lîstika xwe ya hêja Zozan, Eli, Qeremanê Reşo, Hemîdê Úsiv, Egîtê Xudo, Ahmê Xudo, Cebarê Mîrzo, Edoyê Sultan û yên din berbiçev ketin..”

Sala 1940 – î têatro diçe Komara Gurecistanê bajarê Tilbîsê gastrola. Gilî dîkin ku di wan rojan da. teyê bigota ji kurdên bajêr ra eyd bû. Kurdan tu sipêktatîl bernedidan.

Rojnema “Sovêtakan Gurecistan” ê, di hejmara xwe ya 209 an da / sala 1940 - î /, waha dinivîse: “ Ger em hesab bikin, ku têatro sê salî ye û aktyorê wê hemû gênc in û di nav îskûstvanya şanogeryê da gavêن nû davêjin, dive bi xwe mukur bin, ku pêşdahatina wan destanînke mezin e. Salon, ku sipêktatîl tê da dihate nişandan bi temâsevanan dagertî bû, her peyvek û gotineke aktyoran bi hewaskarî dihatebihîstin.”

Di derheqa têatroyê da miqalên pesindayînê her usan jî rojnema “Komûnist” û gelek rojncmên mayîn nivîsin.

Têatro pêne salî bû dema Herba Cihanê ya duyemîn dest pê bû. Welatê Sovêtyê kete li nav şerekî dijwer. Kolêktîva têatroyê jî bi gorî demê û halê welêt rôpêrtûar, kar – barêن xwe guhest. Di nava pirogirama wê da şanoyêن welatparêzyê, esfatyê, mérxwesiyê cîyê xwe girtin. Ji wan şanoyan hinck ev bûn: “Heso” (Ş.Gênosyan), “Heyshildan” (Nayrî Zaryan ), “Mêrgên Elegezê” ( H.Şaybûn), “Jêlêznyakê Partîzan” ( B. Staffl ).

Salên herbê yê dijwar, serokî kolêktîva têatroyê dikir nivîskar Cerdoyê Gêncô, berpirsyarê rojnema RYA TEZE. Ev rojname wê demê haibû girtin. Wan salan wî du sanoyêن bi têma herbê ji bo têatroyê nivîsin: “ Xûşka Doxtiryê ” û “ Bira”. Ev herdu şano jî wextekî dirêj ji dika têatroyê danediketin.

Şanoya “Mem û Zîn” ku nivîskarê Ermenî Soxomon

Tarons, di ser hîmê wê destana zargotina gelêrî nivîsî bû heta niha jî ji bîra temaşevana naçe. S. Taronsî dostekî gelê me bû. Wi rind kurmançî zanibû û gelek efrandinên nivîskarêñ kurd wergerandine zimanê ermenî.

Têatroyê êdî dest avît şanoyêñ giran û dijwer. Wan salan şanoyêñ wusa giran derxistin li ser dikayê wck “Pêpo” (G.Sindûkyan), “Ruhê xirav” (A. Şîrvanzadê), “Qeya” (V. Papazyan), “Nezerê Mêrxwes” ji şanogerya Ermenya, “Sîyaneta Welat” (Midîvanî) ji şanogerya Gurca, “Sivêrîl”, “Keça Wekat” (Cefer Cabarêli) ji şanogerya Azeryan. Evan şanoyêñ wan gela yên herec cyan in û derxistina li der dikê rehet nî bû.

Çend şano jî bi zimanê ermenî hatin lîstîn û ji alyê temaşevan, zanyar û şanogeran va bilind hatin qîmetkirin. Di salêñ dewyê da êdî, gotar û miqalêñ derheqa têatroyê yên qîmetkirina xebata wan da, seva profesyonâlîzma aktyoran, têgihîştina wan û kûraya lîstikvanya şanogeryê da tê nivîsar.

Di sala 1947 an ji alyê hukumata Komara Ermenistanê da nehya Elegezê hate betalkirin. Gundêñ wê belayî li ser gundêñ cînar kirin. Derê Têatroya Kurdî ya Dewletê jî hate dadan. Ev oçaxa kultûra Kurdan dema geşbûna wê da temirandin, bi wê ra gelek kar, xewn û merem jî nîveî man.

Têatroyê di nava 10 salêñ jîyana xwe da nêzîkî 30 şano derxiste li ser dikê, ji wan çae nivîskarêñ Kurd nivîsibûn: “Lûr de lûc” Celatê Koto, “Miraz” Hecîyê Cindî û herd şanoyêñ jorgoî yên Cerdoyê Gêncê.

Wan salan serokatyâ kolêktîvê Celatê Koto, Silêman Ceferov, Mîroyê Esed, Cerdoyê Gêncê, Eliyê Hecî, Emerîkê Delo kirine. Rêjîsyor û serokên bedewetyê şanoger û

şanozanêن erménya yê bi nav û deng bûne.

Salên xebata têatroyê ketime wedekî pir dijwer. Gelên welatê Sovyêtê şerçkî pir dijwer dimeşandin dijî Almanya Hîtlêryê. Xelk halê pir dijwer da bû. Kurdên wî welatî ji şêr da pir şihîd dan. Bi hezaran mér çûn pêşenya şêrr. Dewsa pirany kaxazên reş hatin. Halê aborî xirab bû. Nenihêrî hemû astengyan û dijweryan kolêktîva têatroyê gîhîşte destanînê berbiçev, gelek aktyorê wê êdî di warê pirofêsyonalîyê da gelek pêş ketibûn.

Ger mecal bidana, ku têatro karê xwe berdewam bikc, ez bawarim, wê belgekî héja yê delal di dîroka hunermendiya kurdî da zêde bibya.

Têatroya Elegezê bû bîranînke xweş û di nav gelê wê heremê da ma. Tê bîra min, (wî çaxî êdî zû da têatro hatibû dadan) dema navê têatroyê didan. temâsevanan bi carekê ra “Mem û Zin”, “Xecê û Siyabend”, “Ker û Kulik” ji bîr tanîn. Ev şanoyan usa kûr ketibûn li nav ruhê temâsevanan, ku nedhatin ji bîr kirin.

Min gelek serok, aktyor û karkirnê têatorê dîtin, bi wan ra axivîm. Teva jî bi hiskirin û hisret têatroya xwe ji bîr tanîn û ji bo bê menî dadana wê keser dikşandin.

Solak Nîkoxosyan evdeki Ermenî bû, mirovekî zaneyî, hunermend bû. Kurmancî pak diaxivî. Dostê gelê Kurd bû. Dema ez xwendevan bûm, destpêka salên hefteyî, di radyoya Yêrêvanê beşa Kurdi da radyokompozîsa çê dikirin. Rêjîsyori wî dikir. Carekê - dudya ez jî bi dilqên sivik besdarî wan bûm. S. Nîkoxosyan wê demê êdi extyar bû. Tê bîra min jîrtî û zanebûnên wîye bilind.

Mîroyê Esed rewşembirekî Kurdi esl bû. Gelek rewşembirêن Ermenyan ji min ra salix dane ku zanebûn û rastnivîsandina zimanê êrmenî da, hindik Ermenî henc, ku

karibin weke wî derêن.. Bi bejin – bal, seke – sifetê xwe , rabûn – rûniştandina xwe da jî camêrekî bêqisûr û maqûl bû. Ji sala 1955 – an heta 1989 – an berpirsyarê rojnema RYA TEZE bû. Her wuha endemê Parlamenta Ermenistanê û u'zvê Kommerkezya partya Komûnistya Komarê bû. Karekî berbiçev di pêşdaçûyîna kultûra Kurdên wê herêmê da kir.

Mîroyê Esed akryorî, demekê jî serokatya têatroyê kiribû.. Temâşevanê wê demê gîlî dikirin, digotin, ku Mîroyê aktyor usa rind dilqa da dilist, ku hazira nikaribûn hisêن xwe zevtkirana. Carekê, wexta Mîro di dilqê Beko da dilîze (şanoya Mem û Zîn) temâşevanek kevirekî hildide û kewkî wî dîke.

Elyê Hacî mirovekî welatparêz bû. Bi salan serokatya gundê xwe: Çobangernesê dikir, wek mamostayê zimanê kurdî jî xebitibû.. Eî jî altyorî û demekê jî serokatya teatroyê kiribû. Elyê aktyor bi saya lîstika xwe ya baş, ji bîra temâşevana nedîçû. Geleka bi laqirdî jêra digotin: Artîstî me.

Her du bira Qaçax û Bekirê Miho, binelyê gundê Elegezê, aktyorêن têatroyê yêن sereke bûn. Miqalec û gotarêن wê demê, ku derheqa têatroyê da , bawerkî bi tecvan da qimetekî bilind didine hunermendîya Qaçax. Qaçaxê remetî salêن dirêj kopêrasya nchya Aparanê da karêن cawdar dikir.

Birayê wî yê biçûk, Bekir mirovekî xweyê hisêن nazik bû. Eger têatro nehata girtin wê nibya aktyorekî pir mezîn. Illostakî govend û dîlana kurdî bû. Salêن dirêj serokatî Kilûba gundê Elegezê dikir. Lîstika wî di dilqê Memê ya di şanoya „Mem û Zîn „, da, ji bîra temâşevana nedîçû.

Di dilqê Zînê da jî keçcke ermenî: Xanim Ayvazyanê lîstibû. Usan bûbû ku herdan: Bekir û Xanimê mîna Memê û zînê ji hev hiz kiribûn. Nenhêrî astengyêن olî zewicî bûn.

Heta dewya jîyana xwe jî herda bi hizkirin jîtin. Bûn xweyî keç, law, nebî, nebîçirk. Mala wan maleke êzdyâ ya qedîmî bû.

Divê em bi heyf binivîsin ku wê demê mecalên têknîkî, yên wek niha tune bûne, ku kar û barê têatroyê zêndî ji me ra bîma.

Xanim Ayvazyanê min ra got, ku pey dadana têatroyê gelek rêklam, sûretê dîdemên lîstika, dokûmînt li cem wê mabûn, ew jî nivîskar Eminê Evdal jê distîne dive. Wunda bûn, çawa bûn? Kes nizane.

Ji têatroya Elegezê ya Dewletê, rastî jî, tek bîranîn man.

## **Berhemên Dr. Eskerê Boyîk**

ŞİVERÊ, helbest, 1966.

KULÎLKÊN ÇÎYA, helbest, 1975.

KULÎLKÊN ÇÎYA, helbest, bi zimanê tirkî, kurdî, 1979.

KULÎLKÊN ÇÎYA, helbest, bi zimanê tirkî, kurdî, 1990.

SINCO KEÇA XWE DIDE MÊR, şano, 1980.

MEM Ü ZÎN, şano, 1989.

TÎRÊNC, (di berevoka BAHAR da ), helbest, 1987.

Li ÇÎYA, Kurteçîrok, 1991.

DUAYA SERÊ SIBÊ, helbest, 1997.

ODA ÇÎROKAN I, helbestên, 1997.

KULÎLKÊN BIRÎNDAR, helbest, 1998.

GOVENDA HERFAN, helbestên zarokan, 2002.





**S**ala 1927an hukumata Ermenistanê (Komîsaryata ronkayê û perwerdê) qirar kir, ku elfeba Kurdî li ser hîmê herfêن latînî bê demezirandin. Sala 1928an karê hazirkirna elfeba Kurdî bi serfinyazî hate qedandin. Xudanê wê bûn mameste Isahak Morangûlov û Erebê Şemo. Ev cara yekemîn bû di dîroka Kurda de, elfebe bi tîpen latînî hate bikaranîn. Heta sala 1932an bi wê elfebê li Ermenistanê da, bi zimanê Kurdî rojnema Rîya Teze û gelek pirtûk hatine weşandin.

Ev pirtûk jî liser van ronahîyên Elegezê ne, yên şewqa xwe dane seranserê Kurdistânê.